NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA 1991

REWŞEN

Hejmar: 6 Tebax 1992

"Herçî bire şûrî destê hîmmet
Zebtkir ji xwe re bi mêrî dewlet
Bê ceng û cidal û bê tehewwir
Qet vê şixulê mekin tesewwir"
Ehmedê Xanî

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya



- *Sergotar: Vejîn*
- *Halkın aydını, halkın savaşcısıdır: YRWK*
- *Boşlukları doldurmak: Cemşid Bender*
- *Divê em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xelas bikin: S. Rêvîng*
- *Mar û kew dibin yek: Mayî Remo*
- *Koleyê bi ziman ne tiştek e: Zülfikar Tak*

www.navkurdi.org

www.arsivakurdi.org

REWŞEN

Kovara Kurdî ya çandî, hunerî, wêjeyî û dîrokî ye.

Mehê hejmarek tê weşandin.

Li ser navê MKM Ltd. Şti. Xwedî:
Hüseyin Kaytan

Berpirsiyara Nivîsaran:
Edîbe Şahîn

Birêvebirê Giştî yê Weşanê:
M. Şefik Beyar

Berpirsiyarê Têkiliyên Bi Gel Re:
İbrahîm Genç

Berpirsiyarê Teknîkî:
Şahin Ateş

Redaksiyon û Rêzkirina Nivîsaran:
REWŞEN

Navnîşan:
Tarlabaşı Cad. No: 128
Beyoğlu / İSTANBUL
Tel: (1)254 48 65

Şertên Abonetiyê:
Nav welêt:
6 meh: 60.000 TL
1 sal: 120.000 TL

Derveyê welêt:
6 meh: 30 DM
1 sal: 60 DM

Bank:
Edibe Şahin
Hesap No: 8396-4
Yapı Kredi Bankası
Tarlabaşı Şubesi
Beyoğlu / İSTANBUL

Çapxane:
Aydınlar Matbaacılık

© **Qapax: Mahmut NAYIR**

NAVEROK

Rûpel

Sergotar: Vejîn
REWŞEN 4
Divê Em Xwe Ji Alfabetîzebûna Tirkî Xelas Bikin
S. Rêvîng 5
Birîna Dilê Min
Şervan 11
Halkın Aydını Halkın Şavaşcısıdır
YRWK 16
Cerd
Selahaddîn Mihotulî 21
Li Ser Enstîtuyê Çend Dîtin
REWŞEN 23
Demokrasî Şoreş Ewrupa û Rewşenbîrên Me
Mîrhem 25
Boşlukları Doldurmak
Çemşid Bender 28
Mar û Kew Dibin Yek
Mayî Remo 32
Rexneyên Li Ser Wêne û Hunerên Polîtîkî
Fevzi Bilge 34
Niştimana Xwe Binase: Hewlêr
Piştîwan B. 35
Ahmedê Xanî
Abdurrahman Durre 36
Zman
F. Huseyn Sağnıç 38
Koleyê Bi Ziman Ne Tiştek e
Zülfikar Tak 41
Kültür Sanat ve Edebiyatımızda Üretim Kişilikle Değerlendirilir
Medenî Ayhan 42
Bang
Xamevan 44
Methelok
Berhevkar: J. Espar 46
Zimanê Dilê Me Kilamên Me
Neviyê Kalo 48
Folklora SERÎHILDANê
REWŞEN 50
Muzîk
Berhevkar: Cemîla Celîl 51
Nameyên Xwendevanan 52
Ferhengok 54

www.arsivakurdi.org

SERGOTAR VEJÎN

Di dîroka gelan de, roj hene ku deriyê her awa nexweşî, tarîtî û nebexteweriyê digirin. Lê ev roj, bi xwe re deriyê jiyaneke nû û bextewer vedikin. Rojên weha di dîroka gelan de pirr hindik in. Wate-têgih û pîrozahiya rojên weha, ji bo van gelan gellek mezin in.

15'ê Tebaxê, ne tenê gulleya pêşîn e, lê her weha, ji nû ve çêbûn û zayîn e. 15'ê Tebaxê, destpêka afirandina jiyaneke nû û kesaniyeke nû ye. 15'ê Tebaxê, destpêka ava kirin û saz kirina çand, dîrok û civateke nû ye. 15'ê Tebaxê, afirandina mejî û giyaneke (rih) nû ye.

15'ê Tebaxê, ne tenê çarenivîsa (qeder) gelê Kurd a ne çê (xirab) berevajî kir, lê her weha li ser gelên herêmê û dinyayê jî, bandora (tesir) xwe ya mezin hişt. Ji lewre, domana ku 15'ê Tebaxê tê de derkete holê, desthilatdarî û serdestiya ewrên reş, ne tenê li Kurdistanê li Tirkiyê û li her derê dinyayê belav bûbûn. Anku bê hêvî û bedbînî, mirovahiyê dîl girtibû. 15'ê Tebaxê, ne tenê li Kurdistanê lê her weha li herêmê û li dinyayê, şûna bedbînî û bê hêvîtiyê, çakbînî û hêviyê bicih kir.

Ji ber vê yekê em dibêjin ku 15'ê Tebaxê, ji nû ve vejîn e. Ev ne tenê vejîna Kurdan, lê her weha vejîna mirovahiyê ye. 15'ê Tebaxê, hem rojeke netewî, hem jî, navnetewî ye. Di vî wateyê (mana) de 15'ê Tebaxê, bi tenê serê xwe şoreşreke mezin e. Ew pîrozî û mezinahiya xwe ji vê rastiyê digire.

15'ê Tebaxê, şoreşeke pirralî ye. Bandora (tesir) vê şoreşê, îro di civata gelê Kurdistanê de, di her war û qadên jiyanê de tê dîtin. Ev roj, ji her alî ve, destpêka ronesansa gelê Kurdistanê ye.

Çand, tore-wîje (edebiyat) û pîşeya (huner) îroyin, li ser vê bingêhê û bi vê giyanê (rihê), ji nû ve dibişkive û geş dibe. 15'ê Tebaxê, qeyd û bendên li ser ziman û çanda Kurdî şîkenand, riya pêşveçûna civakî, çandî û zimanî vekir. Ji bo vê yekê jî, gellek merc û derfetan derxiste holê. 15'ê Tebaxê û encamên wê, ne bi tenê riya pêşveçûnê vekir, lê di hem demê de ew, ji tore û pîşeya me ya nûjen (hemdem) re bûn mijar (babet, dabaş).

Lê belê divê neyê ji bîr kirin ku tovê 15'ê Tebaxê, hîna di berê de hat avêtin. Ev tov, bi xwîna şehîdan hat avdan, şîn bû û di vê rojê de weke gula sor bişkivî. Ev gul, bi xwînê şîn bû, divê bi xwînê jî, bê jiyandin.

Xwendevanên delal,

Gelê Kurdistanê, îro bi giyan (rih) û raperîna 15 ê Tebaxê li ser piya ye û li hemberî dijminê hov û har têdikoje (micadele dike). Dagirkeriya Tirk, li hemberî gerîlla, di nêv neçariyeke mezin de ye. Ji ber vê yekê êriş dibe ser gelê me yê sivîl.

Kontr-gerîllayên dewleta Tirk, li Kurdistanê her roj qetlîaman dikin. Roj tune ku welatparêzekî Kurd ê sivîl neyê kuştin. Di van çend hîvên dawî, bi taybetî jî, rojên dawî de, li Kurdistanê 6 nûçevan û rojnamevanên Kurd ên welatparêz (Halit Gungen, Cengiz Altun, Hafiz Akdemir, Çetin Abayay, Yahya Orhan, Hüseyin Deniz) şehid ketin. Burhan Karadeniz jî, bi giran hat birîndarkirin.

Çetin Abayay, niwênerê (mumesil) Kovara me yê Batmanê bû. Çetin jî, wek nûçevanên din yên ku hatin şehîd kirin, parêzgerekî leheng ê mafên mirovan bû. Ciwaniya xwe, di zindana Amedê de derbas kir. Ew her tim ji xortên tirsonek re weha digot: " çima hûn dibin koleyî tirsa xwe, mirin çi ye? Dema ku bê çi kes nikare wê bide rawastandin."

Di gel ev kuştinan, tadayî û terora dewletê ya li ser dezgeh û komeleyên demokratîk, hîna didome. Çend roj berê polîs êrîş bire ser "Ortaköy Kültür Merkezi" li vir, li ber çavan, li hunermendên demokrat işkence hat kirin. Em terora dewletê ya li Kurdistanê û Tirkiyê protesto dikin.

Xwendevanên delal,

Em dixwazin ku kovara Rewşenê tekuztir, bi navorokeke xurtîr û formeke xweşiktir amade bikin û bigîhîjine destê we. Em di nêv vê hewldanê (xeyret) de ne. Lê ji bo Rewşeneke xweşiktir, divê ku em hewldana xwe bikin yek. Em li benda rexne û nivîsarên we ne. Dema ku hûn mil nedin me, Rewşen nikare bibe kovareke tekuz. Eger hun jî, dixwazin Rewşeneke xweşiktir bibînin, divê ku hûn vê rastiyê baş bizanibin.

Me, di kovara Rewşenê, hejmara yekemîn de, li ser çend mijaran, riya gotûbêjê vekiribû. Yek ji van elfabe û qaidên rastnivîsî bû. Me di vê mijarê de gellek name girtin û di kovarê de ew belav kirin. Di vê hejmarê de me dawi da van gotebêjan.

Armanca me, ji her alî ve, çêkirina yekîtiya zimên e. Di vê hejmarê de li ser zimên em gotareke dirêj diweşînin. Ev gotara S. Rêwing, ji vir çend meh berê, di rojnameya Armancê de jî, hatibû weşandin. Em wisa bawer dikin ev gotar, dê ji bo gellek pirsan bibe bersiv.

Di vê hejmarê de gotareke Tirkî a YRWK (Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê) heye. Di vê gotarê de bi awireke gelemperî dîroka têkoşîna gelê Kurd û rewşenbîrên Kurd tê nirxandin. Em dê vê gotarê di sê beşan de biweşînin●

REWŞEN

DIVÊ EM XWE JI ALFABETÎZEBÛNA TIRKÎ XELAS BIKIN*

S. RÊVÎNG

Ji ber sê sedeman gotûbêja li ser alfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî û rastnivîsandina Kurdî, îro ji berê pêwisttir e:

a- Ji ber çi be bila bibe, hinek tîpên alfabeya Celadet Bedirxan: ku cara yekem di Gulana 1932'an de bi derketina **Hawarê** di nav Kurdan de belav bû, ji aliyê şiklên xwe ve wekî xwe neman; di destpêka salên 1960'î de bi derketina hinek kovar û pirtûkên Kurdî, wek Reşo Zîlan jî, di nivîsa xwe de (Bergeh, hej. 8/91) dibêje, tîpa "î" wek "i", "i" wek "ı", "ê" wek "e", "x" wek "ğ", "û" wek "u" û "u" wek "ü", tîpa "w" wek "v" hat nivîsandin.

Van guhartinan şopa xwe li ser Kurdên Kurdistana Bakur hişt û piştî 1980'î li Ewrûpayê bi derçûna kovar û rojnameyên Kurdî, problemê careke din serî hilda; vê carê bi piranî gotûbêj li ser şiklên "î" û "i" yên alfabeya Celadet Bedirxanî bû. Tevî ku li Ewrûpayê hejmarên pêşî yên kovar û rojnamên Kurdî pir in ji gotûbêjên li ser şiklên "î" û "i" yê, lê heta îro jî, di kovar, rojname û pirtûkên Kurdî de, yek cûre alfabe nayê bikaranîn; hinek "î" û "i" dinivîsînin, hinek "i" û "ı" dinivîsînin.

b- Hîn di dema destpêka salên 1930'î de, di nav kadroyên Hawarê de, gotûbêj li ser alfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî çêbûne; **Osman Sebrî** li ser nebûna tîpên **ç-p-k-t** yên 'hişk' di civînekê de ku Celadet Bedirxan bixwe jî amade bûye, nêrînên xwe pêşkêş kirine, *"lê"* dibêje Osman Sebrî *"...camêrên di civînê de giranî nedan gotina min û min jî got: 'Dibînim vê gotina min di serê we de cih negirt. Lê çi gava komelek zanistî li Kurdistanê pêk bê, ez dê vê kêmaniya di elifbêya Kurdî de, bidim ber çavên wê komelê...'. "...di navê de çil sal borîn, ne Kurdistan û ne jî, komela zanistî ya ku min dixwest vê kêmaniya di elifbê de raveyê bikim, çar bû."* (Hêvî, hej, 2) Osman Sebrî, *"ji ber ku şopa heyina van herfan winda nebe'*, di sala 1982'an de bi navê **Elifbêya Tekûz** alfabeyeke ji 35 tîpan pêkhatî çêdike û dide çapê. Ji bilî alfabeya wî çend alfabeyên din jî, ku ji 35 yan 37 tîpan pêk tên çap bûne. **Qanatê Kurdo,** di pirtûka xwe ya bi navê **Zimanê Kurdî-Rêziman** de, alfabeyeke ji 38 tîpan pêkhatî pêşkêş dike. Di alfabeya wî de ev tîp hene ku di ya Celadet Bedirxanî de nînin; **ç'-e'-g'-h'-k'-p'-r'.**

Dîsan Celadet Bedirxan û Qanatê Kurdo li ser xusûsiyet û hejmara *"tîpên dengdêr"* (C. B.), *"sewtên denganî"* (Q. K.), ne wekî hev difikirin. Li gor Celadet Bedirxanî *"...di zimanê me de 8 herfên dengdêr hene, ji van pênc a, o, û, ê, î dengdêrên dirêj û sisê e, i, u dengdêrên kin in...". "...di dengayiya Kurdî de, dengdêrek carinan kin û carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ku kin in, drêjên wan nîne û herçî drêj in, kinên wan peyda nabin."*(Hawar, hej. 10, r: 4) Di alfabeya Qenatê Kurdo de 38 tîp hene û ji wan *"sewtên denganî yên dirêj:* **a, ê, i, o, u, e, ı,** *û sewtên denganî yên kurt* **a, û, e, o, u, y, ê, i** *ne"*. Di du xalan de Qenatê Kurdo ne wek Celadet Bedirxanî difikire:

1: Ew tîpa **y** jî, wek tîpeke dengdêr qebûl dike.

2: Bi ya Qanatê Kurdo dengdêrek dikare hem dirêj, hem jî kin be. Ew dibêje: *"Li zmanê Kurdî da ferqıya lı nav sewtên dirêj û kurt da tune. Sewtên dengani wusan ji bılınd û nızm têna gotınê..."* (Zimanê Kurdî-Rêziman, r: 11-12).

c- Dewleta Tirkiyê mecbûr ma ku qedexeya li pêş axaftin û nivîsandina zimanê Kurdî -eger di pratîkê de dîsan jî, pêşî lê bigre- rake. Ji niha ve hinek kovar û rojnamên Kurdî dest bi weşanê kirine û dibe ku hejmara wan herku diçe, pirtir bibe. Bi vê yekê, bivê nevê problema nivîsandina du şiklên cuda ji bo dengekî wek **î û i,** yan **i û ı û** belkî jî, alfabeyên ji 31, yan 35, yan 38 tîpan pêkhatî bên bikaranîn, yan jî, gotûbêjên li ser alfabeya di nav rûpelên wan de çap bibin. Anku ev problem li ser axa welatî jî, serî hildin û bibin sedema alozî û tevliheviyê.

Jixwe di warê rastnivîsandinê de çi li Kurdistanê, çi li Ewrûpayê, Kurd girêdayî hinek qeydeyên **Hawar, Ronahî, Roja Nû,** nemane. Di vî warî de jî, tevliheviyeke mezin heye. Kesên ku kovar, rojname û pir-

tûkên piştî 1980'î ketine çapê û kovarên navbûrî bidin ber hev, wê bi hêsanî vê yekê bibînin. Bi taybetî rojnama **Kurmancî** ya **Enstîtuya Kurdî ya Parîsê** di vî warî de numûneyek e. "Kurmancîaxêv", yan nivîskarên Kurmanciyê çi cara di babeta rastnivîsandinê de, bi awayekî ciddî 'Hawar', 'Ronahî', 'Roja Nû" nedane ber çavan, ji bo pêşîlêgirtina tevlîheviyan, yan bi hev re bikaranîna hinek qeydeyên rastnivîsandinê û gotûbêjan, çi cara bi awayekî ciddî ji bona ku redaksiyonên kovar û rojnamên Kurdî, nivîskarên Kurd bicivin, nexebitiye.

Lewra sedem çi bin bila bibin, di warên alfabe û rastnivîsandinê de, cudayî û problem derketine pêşiya me. Dema rewş ev be û kes nekare hinek tîpan, yan qeydene rastnivîsandinê, bi kotekî, li hinekên din bide qebûl kirin, kes nikare tarîxa damezirandina dezgehên xwedî otorîte û biryarên zanistî bide destê Kurdan, wek Reşo Zîlan, daxwaza munaqeşe nekirina pirsan (Bergeh, hej. 8/91, r: 79) dawiya dawî dibe bincilkirina probleman. Problem şax vedidin, cihê xwe digrin. Belavbûna şaşiyan karê dezgehên xwedî biryarên zanistî jî, zehmettir dike.

Bi ya min ,berî ku ev alozî li perçê herî mezin û li nav nufûsa herî mezin ya Kurmancîaxavên Kurd belav bibin, gotûbêja li ser wan û hewldana ji bo yek cûrê alfabe û yekcûrê rastnivîsandin, tevî nebûna dezgehên otorîter, yan pisporên Kurd jî, baştir e ji bêdengiyê, çunkî Kurdan, berî peydabûna dezgeh, yan bisporan dest bi nivîsandina Kurdî ya bi tîpên Latînî kirine û wê binivîsin jî. Bê guman dema tê nivîsandin jî, wê ev problem serî hildin. Em bipên jî, problem napên.

Hîmên Alfabeya Kurdî

Alfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî ku em îro bi giştî bi kar tînin, li ser kîjan hîman şiklê xwe yê îro girtiye? Celadet Bedirxanî çima **ç'-, k'- p'- t'-** yên hişk wek dengên bingehîn û cuda nexistine alfabeya xwe? Wî çima '^' bilindek (kumik) daniye ser tîpa **î** û nqitayek daniye tîpa **i**? Çima tîpên **c-ç-ş** wek ji aliyê şikil ve wek yên alfabeya Tirkî ne? Ji bo bersiva van pirsan, eger piçek dirêj jî be, gotinên Celadet Bedirxanî li vir dinivîsînim:

"...Lê berî destpêkirina berhevdanê divêt herçî esas û bingeh hene ko ji me re bûne hîm û elfabe li ser wan hatiye danîn, bêne xuya kirin. Me ev bingehên ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

1- Ji wan niqtan pêve ko xasê denganiya zmanê Kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya Tirkan nîzing xistin û jê dûr neketin. Armanca elfabê sekinandina dengan li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan tên nîşan kirin û herf qebalewî û bihemd in. Ji lewre nîşankirina dengê (ç) bi (c) û yê (ş) bi (ç) û bi hev guhartin û cihguhastina wan wek hev û bêferq e. Lê bi vî awayî Kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabeya Tirkî dinasin, dê bikarin bê dijwarî ya Kurdî hîn bibin û komel û kitêbên ne bi hêsanîtî bixwînin.

2- Herçend dibe, ewçend dengên herfên Latînî yên adetî ko di zimanên din de nas in, di elfabeya Kurdî de hilanîn û neguhertin. Bi vî awayî Kurd dê bikaribin elfabeya biyaniyan û biyanî ya me bi hêsanîtî fêr bibin.

3- Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin. Bê şik e ko hînbûn, xwendin û nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yên hevedudanî hêsantir e.

4- Her dengî bi herfeke cihê nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfekê, an dengekî bi çend herfan, xwe dan alî. Ev awa ji fikra çêkirina elfabekê bi hindik herfan an ji qesda qenc li ser sekinandina denganiyê dikare bizê. Lê pê her du jî nakevin dest û di zmanî de bela sebeb pirsinên di şiklî de ciyok peyda dibin û di nivîsandinê de tevlîhevîke mezin berpê dibe. Jixwe di tu zmanî de denganî û nivîsandin ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zamanî be. Lewre ko kitkit û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa diviyabû elfabêya her zimanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

5- Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî. Nîşan ji helekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklen xwe ên eslî, bênîşan, û tevlîhev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re; ev jî dijwarîke din e. Ji lewre ji bona tewayiya herfên binîşan me ev (^) pejirand, û bi bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguherîne, hem bilind dike, û ji nîşanên wek (.-, - ') qenc têt veqetandin. Jixwe boşbûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

6- Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bên û bikevin hev. Ji lewre diviyabû ko em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabêyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin. Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir. Bi vî awayî û li gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu daniye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn. Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin, xuya kirine ko di zimanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ev jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tên xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guherîna cihderka dengan, lêbelê ji guherîna rengê dengan têne pê, û ji lewre di elfabê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfebe tenê dengan nîşan dike, ne rengê dengan." (Hawar, hej, 2, r: 6-7)

Destûrên ku Celadet Bedirxanî alfabeya xwe li ser daniye, pir vekirî ne. Ne pêwîstî ravekirineke cuda ne.

Ç, K, T, P yên "hişk"

Lê eger bala we kişandibe, di benda çaran û di dawiya benda şeşan de ger bi nav nekiribe jî, Celadet Bedirxanî li ser **ç-k-t-p** yên 'hişk' nêrîna xwe gotiye. Bi ya wî divê mirov xwe *"ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfekê, an dengekî bi çend herfan"* bide alî. Çunkî *"Ev awa di zimanî de bela sebeb pirsinen di şiklî de ciyok* (pirsên ku mana wan nêzî hev an wek hev in) *peyda dibin û di nivîsandinê de tevlîhevîke mezin berpê dibe. Ji xwe di tu zmanî de denganî* (tevayî û halê 'dengî', herf careke bi şiklên xwe, cereke bi denginiya xwe têne seh kirin) *û nivîsandin ne lêvên yek in û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zmanî bê. Lewra ko kitkit û rengên* (zirav, yan stûrbûn, nermî, hişkî) *denganiyê bi elfabê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa diviyabû elfabêya her zmanî ji (50-60) herfan hevedudanî be."* (Benda Çaran). Di dawiya benda şeşan de Celadet Bedirxan nêrîna xwe hîn zelaltir dike: *"Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatiye çêkirin, xuya kiriye ko di zmanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ew jî, bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tên xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guherîna cihderka* (cihê ku deng jê derdikeve, kaniya deng) *dengan, lê belê ji guherîna rengê dengan têne pê û ji lewre di elfabê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabe tenê dengan nîşan dike, ne rengê dengan."* Xuya dibe ku Celadet Bedirxan hişkbûn, yan nermbûn, zirav, yan stûrbûna **k-ç-p-t** yê wek sifeteke van herfan dibîne, û ev sîfet jî, bi serê xwe têr nakin ku ev herf wek herfên 'bingehî' bên qebûl kirin. Ev bi serê xwe ne dengek in, lê guherîna dengê **k-ç-p-t** yên adetî ne. Û ev guherîn jî, wek herfekê nakevin alfabeyê. Lê tevî vê nêrîna xwe jî, Celadet Bedirxanî carna ev guherîna he wek herfeke serbixwe -bi tenê **k** ya hişk- nivîsandiye:

"Kanî Zêwkî, Welat-Kevêr, Ebasan, Dawûdiyan, Omerkan, ka Kheran(1)
Ma kher bûne tu deng nayê ji tuwan"

(1) Me ***"kher"*** *yanî mirovê* ko nabîhîze, bi vî awayî nivîsand ko ji kerê heywan bête veqetandin. Ji xwe ev **"kh"** *ji ya din stûrtir e."*(Hawar, hej, 25, r: 3) Lê belê bi vî awayî nivîsandin bi tenê di çerçewa **kh** yê de maye û ew jî, ne pir in. Di vî warî de du nivîsarên hêja; yek ya **Zagros Haco**, yek ya **Rizgar Baran** di **Armancê** de çap bûn. (Hej, 109, 111) Encama balkêş ya lêkolîneke biçûk ya Rizgar Baran xuya dibe ku di nivîsareke ji 1700 tîpan pêkhatî de 45 **k** hene û ji wan 36 **k** yên hişk û 9 **k** yên adetî ne. Anku hejmara **k** yên hişk ya ku Celadet Bedirxanî carna bi awayê **kh** nîşan kiriye, pirtir e ji hejmara **k** yên nerm. Mixabin heta îro li ser hejmara **k, ç, p, t** yên hişk, an adetî, û li ser hejmara peyvên ku bi bikaranîna **k, p, ç, t,** yên hişk di şuna yên nerm de tevlîheviya manayê derdixin, îstatîstîkên tekûz nînin. Bê guman babetên weha bi hebûna van îstatîstîkên zelaltir dibin.

Piştî destûrên alfabeya xwe, Celadet Bedirxan yek bi yek li ser tîpên dengdêr û her weha tîpên ku xasî denganiya zimanê Kurdî ne, yan ji aliyê şikil ve wek yên alfabeya Tirkî ne, radiweste.

Tîpên C, Ç, Ş, X

Bi ya wî ji aliyê şikil ve 17 tîp *"...di elfab*êya her zmanî de, bi ferqine kiçik yek in: b d g h k l m n p r s t f v w y z" (Hawar, hej, 2, r: 7)

C, û **Ç** *"Di destê me de (c) û (ç) mane. Me ev ji bona nîşankirina dengên (ج) û (چ) hilanîbûn. Gora eslê van herfan dengê (ج) ji (ç) bêtir bi (c) dihat nîşankirin. Herwekî di latîniya kevin, di babelîska şeşan de, ko diket pêşiya (e, i, y, ce, çe) dengê (ج) a me dida, mîna dengê (z) ya elmanî, wekî niho di pirsên jêrîn de: (Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, Cesar, cetos, ceremonia). Di gel vê hindê me ev herf ji pêşiya xwe vekir, dengê wê ê kevin da alî û em di warê qabelayê de man. Ji ber ko qebale li destûra me a pêşîn çêtir dihat û ji bona feda kirina wê destûrê çi fêde, çi kotekî hebû. Di encamê de me dengê (ج) bi (c) û yê (چ) bi (ç) nîşan kirin.* (Hawar, hej. 8, r: 9)

Tîpa (ş): *"Ev herf berdêla (ش) a erebî ye. Dengê vê herfê di frensîzî bi (ch), di elmanî bi (sch), û di ingilîziyê de bi (sh) têt nîşan kirin. Ji herfên latînî ji bona nîşankirina vî dengî di destê me de tu herf nemabûn. Gora destûreke me, diviyabû em bi herfên hevedudanî emel mekin. Destûra me a pêşîn em dixistin nîzîngî elfabêya tirkan. Ji hêla din ve cihderka vî dengî gelek nîzîngî cuhderka herfa (s) ye. Miletên ko di zmanê wan de ev deng nîne, li şuna wî (s) dibêjin. Di zmanê yûnanî de (ş) nîne. Ji lewre yûnaniyên ko nû dest bi frensiziyê dikin, şuna (chambre-şambr), (sambr) dibêjin û pirsa (paşa) (pasa) dixwînin. Di encamê de me ev deng, wek tirkan bi vê herfê nîşan kir. Jixwe ev şikl di elfabêya xelkê Romanyayê de, ji mêj ve hebû."* (Hawar, hej. 6, r: 6)

Tîpa (x): Ev herfa ko di elfabêya erebî de bi herfa (خ) têt nîşan kirin, di hin zmanên arî de jî heye, wekî niho elman vî dengî bi (ch) nîşan dikin. Lê miletên din wek yûnanan, bi (x) dinimînin. Ev herfa ha di hin elfabêyan de wek ya frensizan, du dengan bi hev re dinimîne û dide xwendin, yanî dengekî wê yê dutakî heye. Her wekî: Alexandra-Aleksandra û Exemple-Egzemple.

Ji ber ko dengê wê ê dutakî ji me re ne gerek bû, me ev herfa ha wek yûnanan û hin miletên din ji bona nîşankirina dengê (خ) êxiste nav elfabêya xwe.(Hawar, hej. 6, r: 7)

Çima "i"?

Tîpên e - i - u - ê - î - û :*"Niho*

ev şeş herf hene ko di pêşberê hev de, du tofên di şiklî de nîzîngî hev dîtinin pê. Em van çarên jêrîn bigrin destê xwe û bi wan mijûl bibin: e - i - ê - î

Lê her wekî me berê jî gotibû, di denganiya Kurdî de dengdêrek carinan kin û carinan drêj nabit, yanî herçîm dengdêrên ko kin in, drêjên wan nîne û herçî drêj in, kinên wan peyda nabin. Ji ber vê yekê dengdêra (e) herçend bête drêj kirin, tucar nabit (ê) ji ber ko cihderkên wan ji hev cuda ne. Her wekî (i) jî, bi drêjkirinê nabit (î). Di destên me de tu herfên din nemabûn, û li gor destûreke me diviyabû em herfên hevedudanî emel mekin. Ji lewra ji bona nîşan kirina tofa pêşîn me ev (^) nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek. Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabêyên din de, dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî, drêj in û tucar kin nayin xwendin. Li gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêk anî û di pêşiya vê bendê de, da zanîn, diviyabû ko em bê sebebeke zor, ji elfabêya Tirkan dûr nekevin. Li hire, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr ketin. Tirk (i) ya kin bi (i) ke bê niqte nîşan dikin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) ke bê niqte û ya drêj bi (i) ke adetî nîşan bikira çêtir nedibû? No, ji ber ko (i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di pêş û paşiya hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistina wê dikeve dişwariyê. Jixwe Tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona veqetandina (i) ke bêniqte ji herfên jorîn -ko ketiye rex an nava wanser herfa ko berî (i) yê dihat işaretek berdidan. Bê şik e ko me nikaribû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hatibû nîşan kirin. Ji pêve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyên van du zimanan cihê ne, isûlê dengdêrên Kurdî bivê nevê ji isûlê Tirkan dûr ketiye." (Hawar, hej. 10, rûp. 4, hej. 11)

Wek tê dîtin, Celadet Bedirxan windabûna **ı** yê, yan **i** ya bêniqte di nav, yan pêş û paşiyên tîpên **m, n, u** de wek sedema serekî ji xwe re dibîne û ji ber ku **ı** winda nebe, xwendin zehmettir nebe, (.) niqteyekê datîne ser û dibêje ji bona ku ev herf tevlî herfên din nebe, Tirkan di elfabeya xwe de îşaret danîne ser herfa ku berî **ı** yê dihat. Eger di salên 1930'î de ev îşaretek hebûye jî, xwendevanên ku niha dikarin bi tirkî bixwînin û binivîsin, dizanin ku niha Tirk tu îşareta dananin ser herfa ku berî **ı** yê tê, û hebûna herfa **ı**, yan **i** ya bêniqte dixwendin, yan nivîsandinê de tu tevlîheviyan dernaxe. Dimîne niqta duyem ku ew cihêbûna dengayiyên her du zimanan e ku *"isûlê dengdêrên Kurdî bivê nevê ji isûlê dengdêrên Tirkî"* bi dûr xistiye. Bê guman mirov dikare vê xusûsiyetê bide ber çav û bi danîna niqteyekê li ser **ı** yê ji alfebeya Tirkan bi dûr bikeve. Lê eger Celadet Bedirxanî niqteyek nedaniba ser **i** yê û wek **ı** bihişta, wê Kurdan ev herf wek **ı** ya alfabeya Tirkî bixwendana? Na. Ji ber ku em qala du zimanên cuda, û du alfabeyên ku li gor dengên wan zimanan hatine çêkirin, dikin. Dirêjtir, yan kintirbûna **i** ya Kurdî ji **ı** ya Tirkî di vî warî de hîç rolekê nalîze. Çunkî yên ku deng dide îşaretan em in. Neku ji bo her dengekî dengdar, yan bêdeng îşaretek standard heye û her milet wan bi kar tînin. Eger zarokekî Kurd ku ji sinifa yekem, heta unîwersîteyê bi Kurdî xwendibe û di alfabeya ku ew fêr bûyî de **i** hebe wê yekser herfê nas bike û bizane dengê wê çi ye, eger **ı** hebe, wê dîsa wê herfê nas bike û deng bidiyê. Dema em qala alfabeya Kurdî dikin, bê guman em qala yek alfabeyê dikin, û niyeta kesî ji me jî, tuneye ku di ber alfabeya Kurdî re, ya Tirkî jî, wek alfabeya zimanê esasî ferî zarokên me bike, heta ku tevlîhevî peyda bibin. Di mesela bilindek (^), kumikan de jî, nêrîna **Reşo Zîlan** ji rastiyê dûr e. Ew dibêje:

"Jixwe di zimanê Kurdî de sê dengdar hene, ku ew jî dengdarên 'ê', 'î' û 'û'yê ne, dirêj in. Eger em vê nîşana girîng ji ser yekê ji wan rakin, gelo maneya li ser yên din hîştine çî ye? Ew nîşana kumkî ya ku hatiye ser vê grafemê, ango bilindek -nişana sîrkumfleksê- dide xuya kirin ku divê ev dengdar bête dirêj kirin, dirêj bête bi lêv kirin. Hinek zimanên din, ji bo dirêjkirina dengdarên dirêj yên zimanê xwe riyine din dane ber xwe. Wan yan bi riya cotnekirina tîpên bêdeng yên bi dû re tên, yan bi riya bikaranîna du gramefan, yan jî bi riya çend nîşanên bi hev re ev pirsgirek çareser kirine. Heçî Mîr Celadet e ew xwe (ji awayê nîşankirina çend dengan bi herfekê, an dengekî bi çend herfan), yan jî, ji bikaranîna çend nîşanan bi hev re dide alî, ku helwêsteke pir rast û di cih de ye. Ji lewre ew vê nîşana bilindekê çêtir dibîne û diêxe ser her sê dengdarên me yên dirêj. Mîna hin zimanên din, di zimanê Kurdî de jî taybetmendiya serekî ya vê nîşanê dirêjkirina dengdaran e." (Bergeh, hej. 10, rûp. 4)

Carê di zimanê Kurdî de ne sê dengdarên dirêj, lê pênc dengdarên dirêj hene û ew jî **a-o-ê-î-û** ne. Wek tê dîtin jî bilindek li ser **a** û **o** yê tuneye. Mana wê ew e ku **a** û **o** dengdarên kin in? Bê guman na. Ya duyem ji nivîsa Reşo Zîlan ku me li jor dabû, xuya dibe ku ew dixwaze gotinên Celadet Bedirxan di vî warî de ji xwe re bike pişt. Lê di gotinên Celadet Bedirxanî de ku wî xistiye nav kevanan, peyvek bi tenê jî, li ser xusûsiyeta (^) bilindekê tuneye.

Çima "î" ya bi kumik?

Di eslê xwe de Celadet Bedirxan ne tagirê bikaranîna nîşandekan e. Bi ya wî nîşandek *"nivîsarê*

kirêt dikin, bi jibîrkirina wan herf car din vedigerin ser eslê xwe yê berê û di manayan de tevlîhevî peyda dibe." Sedemên ku Celadet Bedirxan mecbûrî bikaranîna (^) bilindekê dikin, ne dirêjbûna **î, ê, û** yê ye. Lê du sedemên din in.

1- Celadet Bedirxanî nexwestiye herfên du, yan sê alfabeyên cuda têxe nav alfabeya xwe. Wî herfên alfabeya xwe di çerçewa alfabeya bi herfên latînî de hiştiye û nexwestiye ji alfabeyên din herfan bigre, ji ber ku herfên alfabeya wî li hev bên. Lewra jî, ji destpêkê heta şiklê dawî yê alfabeyê, du, sê caran alfabeya xwe guhertiye, dawiya dawî li ser alfabeya bi herfên latînî sekiniye. Her weha di bendeke destûra alfabeya xwe de ew dibêje ku divê em herfên hevedudanî bi kar neynin.

2- Dema ku ew herfên alfabeya latînî li ser dengên zimanê Kurdî belav dike, ji bo ê-î yê di destên wî de tu herfên alfabeya latînî namînin, ew jî, naxwaze herfên hevedudanî bi kar bîne û paşê bi bilindekê **ê û î** yê ji **e û i** yê vediqetîne: *"e, i - ê, î. Di destên me de tu herfên din nemabûn, û gora destûreke me diviyabû em herfên hevedudanî emel mekin. Ji lewre ji bina tofa paşîn (ê, î) me ev (^)* nîşana ha pejirand û navê kir bilindek. Ev nîşana ha di hin alfabêyên din de jî, heye. Lê bi ferqa ko di alfabêyên din de dengê dengdêran wekî xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tinê bilind dide xwendin. Di alfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî, dirêj in û tucar kin nayin xwendin." Hawar, hej. 10, rûp. 4)

Diyar e. Ji ber ku tu herfên din di destê wî de nemane û nexwestiye herfên hevedudanî bi kar bîne, bi riya danîna (^) bilindekê li ser **e** yê û bi rakirina niqteya li ser **i** yê û şûna wê danîna bilindekê du herfên serbixwe çêkirine. Bi vî awayî hem di nav çerçewa alfabeya bi tipên latînî de maye, hem jî, tîpên hevedudanî bi kar neanîne. Xusûsiyet, yan taybetmendiya serekî ya (^) bilindekê jî, di zimanê Kurdî de wekî ku Reşo Zîlan dibêje ne *"dirêjkirina dengdaran"* e. Lê ev nîşan herfekê dike herfeke din, cihderka herfan diguherîne, dengê **e** diguherîne, dikê ê, dengê **i** diguherîne, dike **î**. Ev xusûsiyeta serekî ya vê nîşanê ye, û dirêjkirina deng dibe xusûsiyeta duyem û ne serekî. Ne serekî, çunkî wek me got, **a û o** jî, dengdarên dirêj in, lê li ser wan ev nîşan tuneye. Eger armanca Celadet Bedirxanî bi danîna şiklê **î** ji bo dengê **î** veqetandina **î** ya Kurdî ji **i** ya Tirkî bûya, wê ev nîşan danîba ser **a** ya Kurdî jî, çunkî **a** ya Kurdî dirêjtir e ji ya Tirkî, lê wek şikil her du jî eynî ne û ev nayê wê manê ku dema em **a** ya Kurdî dixwînin, yan dibêjin, ji ber ku bilindek li ser tuneye, em wê qasî **a** ya Tirkan kin dixwînin.

Ji aliyê din, kesên ku bi tenê tîpên **î-i** yên Celadet Bedirxanî diguherin û bi awayên **i-ı** dinivîsînin jî, ji vî karê xwe re bi ya min sedemeke yekcar bêbingeh didin pêş: *"Hêsantir e."* Çima? *"Çunkî nêzî alfabeya Tirkî ye û piraniya Kurdan li Kurdistana Tirkiyê dijîn."* Di destên me de îstatîstîkên xwendewariya Kurdên li Kurdistana Tirkiyê tunene. Lê em dizanin ku eger 12 milyon Kurd lê hebin, her 12 milyon tevde ne xwenda ne û alfabeya Tirkî nizanin, hetta bi Tirkî peyivînê jî, nizanin. Anku peyva 'piranî' ne sedemeke di cih de ye. Ya din gava cara pêşî alfabeya Celadet hat guhertin, (salên 1960) tîpên ê - û - x - w jî, hatin guhertin û awayên ê - ü - ğ - v hatin nivîsandin. Dibe ku hîn alfabeya Celadet nehatibû dîtin, yên dîtibin jî, hem ji ber nebûna makîne û çapxaneyên ku îşareta (^) yê binivîsînin, hem jî, ji ber ku bi Tirkî alfabetîze bûbûn û nêzî alfabeya Tirkî nivîsandin ji wan re hêsantir dihat, bêyî ku li ser karê xwe bifikirin, veha nivîsandin. Lê piştî salên 1980'yî Kurdên ku alfabeya Celadet dîtine, li Ewrûpayê bûne xwedî îmkanên makîne, weşanxane, çapxane, lê dîsa jî, bi israrî **i-ı** dinivîsînin, sedemeke bêbingehtir ji yên berî xwe didin pêş. Çunkî eger hêsantir e ji bo Kurdên Kurdistana Tirkiyê, nexwe divê em **x** jî, wek **ğ** ya Tirkî, **û** wek **u** ya Tirkî, **u** wek **ü** ya Tirkî, **ê** jî wek (ê) ya ku berê dihat nivîsandin, binivîsin. Bi tenê dûvika **î, i**'yê girtin, înadeke bêbingeh e. Ya din jî, berdewamiya tevlîhevî û dûrbûna ji yekcûre alfabe nivîsandin e. Îro hejmara kes, weşanxane, pirtûkên ku **î, i** dinivîsînin, pirrtir e ji yên ku **i, ı** dinivîsînin, lê di xwendin û nivîsandina **î, i** yê de problemeke ewqas mezin ku pêwîstî guherandinê be, derneketiye pêşiya me. Dema Tirk ji alfabeya bi tîpên Erebî derbasî ya bi tîpên latînî bûn, bi carekê derbas bûn û vê derbasbûnê demekî dirêj ajot; li seranserî welat ji bo hînbûna tîpên nû bû seferberî, rojname û kovar demekî bi her du tîpan hatin nivîsandin, di vî warî de problemên giran hatin çareser kirin, tevî ku wekî îro teknîk bi pêş de neçûbû, rojname, kovar, xwendewarî, tv, radyo bi vî awayî nebûbûn malê xelkê. Bi tenê **î û i** yê problem kirin, zehmet dîtin, -qala guhertina **x, û, u,** ê yê nekirin-, bi ya min xwe ji alfabetîzebûna Tirkî xilas nekirin e. Bi taybetî Kurdên Kurdistana Tirkiyê gava li alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî dinêrin, ji ber ku alfabetîzebûna bi Tirkî di mejî de cih girtiye, wek alfabeyeke serbixwe, wek alfabeya zimanekî din li ya Kurdî nanêrin; yek ser alfabeya Tirkî tê bîra wan û her cudayiyek ji wê wek promlemekê serî hil dide. Her weha ew vê ferqiya ji alfabeya Tirkî pir mezin dikin. Heçku ev ferqîtî wê bibe sedem ku Kurd bi salan nekarin hînî **î û i** yê bibin û lewra jî, nexwenda bimînin. Di vî warî de **Amed Tîgrîs** di nivîseke xwe de (Berbang, hej. 74) 'sedemeke' nû tîne, ew dibêje, li Swêdê zarokên ku hînî alfabeya Swêdî bûne, dema **i** ya Kurdî dibînin, wek **i** ya Swêdî (wek **i** ya Kurdî)dixwînin û ji ber ku di piraniya alfabeyên zimanên Ewrûpî de **î** ya me di şiklê **i** de ye, û çavên zarokan hînî wê îşaretê bûye, peyvên Kurdî wek; **min, dil, kirin** bi awayê **mîn, dîl, kîrîn** dixwî-

nin, lewra jî, divê em bi Kurdî bi awayên **i û ı** binivîsînin. Amed Tîgrîs li Swêdê mamostatiya zimanê Kurdî dike û divê bizanibe ku di piraniya alfabeyên zimanên Ewrûpî de **c** ya me yan **k** ye, yan **s** ye, **x** ya me yan **îks**, yan **eks e, q** ya me eynî deng nîne, bo nimûne di Swêdî de dema tîpa **k** berî tîpên **j, i, y ä** de têt, dibê **ş**. Ew qet qala van tiştan nake. Ya din ma alfabeya me ji bo zarokên Kurd yên li Swêdê, yan li welatekî Ewrûpayê ku berê hînî alfabeya wê zimanî dibin û paşê jî, heftiyê du caran bi Kurdî dixwînin, hatiye çêkirin?

Alfabeya Celadet Bedirxanî hem ji aliyê dengên Kurdî, hem ji aliyê şiklên tîpan ve ji bo nivîsandinê bersiva xusûsiyetên zimanê me dide. Pêwîstiya guhertina wê alfabeya niha tuneye. Danerê wê çawa danîbe divê em jî, îro weke wî bidomînin. Lê ev nayê wê manayê jî, ku em li ser babetên ku pêwîstî munaqeşê ne nepeyivin. Belê li ser peyivîn divê wî mafî nede ku her kes rabe, bi serê xwe tîpina biguhere, yan lê zêde bike. Divê em mesûlîyeta xwe bizanibin û bi guhertinên keyfî nebin sedemên tevlîheviyan. Riya rast ew e ku li gor rewşa îro dezgeh (bi taybetî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), kovar, rojname û nivîskarên Kurd bi hev re, bi ser û ber, bi mesûliyet serperiştiya vê yekê bikin. Û divê êdî em ji wê çerçewa teng a î û i yê derkevin. Çunkî problemên ku bi rastî jî, problem in û divê ji îro li ser bên peyivîn, li benda me ne;

1- Kurd bi sê alfabeyan dinivîsin. Kîjan alfabe ji bo zimanê Kurdî ya herî baş e, heta îro zêde li ser nehatiye peyivîn. Ma heta kengê em ê kovar, rojname yan pirtûkên bi du alfabeyan biweşînin?

2- Bi teknolojiya pêşketî girêdan û têkiliyên nav welat û gelan êdî bi riya makîneyên modern wek kompitur, teleks, telefaksên ku ji tîpên standart pêkhatine, tên avakirin. Di vî warî de kêmasiya alfabeya me heye yan na? ●

*** Ev nivîs, ji Armancê hatiye girtin.**

DESTANA KURDAN

Adnan PEYMAN

Here lo mamê min
Guh bide dengê min.

Birçî bûn gede
Nan xwest ji aşvan
Neda nan aşvan.
Di cihê nan de, da arvan
Got bipêje ardê xwe
Têrke zikê xwe

Ronî kir bin kevir
Çêkir ji bo xwe hevîr.
Dest avêt meşka xwe
Mêze kir li jina xwe
Got tevşe danêk
Têrkim zikê xwe

Birçîbûn ne zik e
Bo çi dibe zik têrke
Welat çavê belek e
Ardê min bo xelk e

Bipêjim ardê xwe
Çêkim keleşa xwe
Bidim mizgîna xwe
Bisekinim dora xwe.

Here lo pismamo!
Mam ez êcêp û şaş
Qalbike ji minre baş.
Min famkir tu ne bêkês î
Bêje ji min re tu çi kês î

Nebêje ji min re tu bêkes î
Nas dikim ez her kesî.

Li pêşiya Îsa
Nava Mezrabotan
İlim xwendim li Herran
Hişyar bûme bi ziman.

Ez Med û Hurî me
Karde û Gutî me
Bi nav û dengî me
Netawa Kurdî me.

Bi kûştin û bi zanîn
Bo xelasî ev raperin

Ne ji bo Palasar û Dayikê
Bo Meda xwe dan mizgîn

Ereb û Romî
Hatin welatê Kurdî
Em kirin bêkes û sêwî
Benda me ji we hêvî

Me we kir himbêza xwe
Pay kir nanû pîvaza xwe
Bi qelleşî bi xwîn
Kirin me bin destê xwe.

Qadî rabû ser piyan
Xeber şiyand dewletan
Bibin bira û pismam
Bo me cî heye li wan ezman

Piştî herba didowan
Hatin dewlet li Tehran
Li nav xwe kirin Peyman
Mehabata min bû xopan

Seîd û Seyît Rizo
Lê xistin serê dizo
Berzencî û Simko
Ji dil heskir dayiko

Hero lo mam min
Te got, da dengê min
Min ne got ji te re xeberoşk
Kusiya min a nav berberoşk

Ganî bûn çûçik
Hay jê nîne bûn kûçîk
Mabûn pelî xîçik.

Jê kirin lêv û zimanî.
Gotin tu çuçikekî
Çuçikêke neyarî
Neyarên me, zordestên Romî,
Fars û Ereban î.

Here lo pismamo!
Kêmasiya min nenêre
Lê dî famkir bar giran e
Ez jî diherim serê çiyan
Xelasiya min ne dûr e.

www.kurdistan-akurdi.org

2 BIRÎNA DILÊ MIN

ŞERVAN

Dema min wisa got, Zero keniya û got, "metirse, dayika te nikare wisa bike, wê heval çavê wê derxînin, Ma qey em bêxwedî ne?"

Min pirs kir bê(ka) heval çi tişt in. Dema min ev pirs kir, Zero weha şaş ma û got, "qey heval nayên gundê we?"

Min got, "ez nizanim. Ji gundiyan pê ve ez tu kesî nabînim û car caran jî, leşkerên Tirk tên gund, ez wana dibînim. Ku hevalên te ew bin, ez bi te ra nabim heval. Ji ber ku her cara tên gund li gundiyan dixin û em hemu ji wana ditirsin".

Dema min wisa got, Zero bi dengekî bilind bi min keniya û wek ku henekê xwe bi min bike got, "tu pirr li paş mayî", û piştre dev ji kena xwe berda û weke zilameke heftê salî rûyê xwe hişk kir û qure-qure axavt, te digot qey dibistan hemu xwendine, ez şaş mam bê ewqas tişt ji kîderê hîn bibû. Zero got, "rast e, hevalên min leşker in, lê netirse, ne leşkerê Tirka ne, ne ew leşkerên hatine gundê we ne. Hevalên min leşkerên Kurda ne!"

Min got, "min zaniba hevalên te leşker in, ez li cem te nedirûniştim. Di nava wana dè jî, leşker hene bi Kurdî, weke me diaxivin, lê bawerke, ew ji yên ku Tirkî diaxivin zalimtir in".

Min kir ku ez rabim û ji cem biçim. Zero wisa li ber çavê min reş bibû ku ji min bihata, minê destê xwe têxista qirika wî û bixeniqanda. Lê bi destê min girt û got, "te ez fêhm nekirim. Ez ne behsa leşkerên Tirka dikim. Ez behsa leşkerên Kurda dikim. Vana leşkerên me ne, hevalên me ne. Ew jî, cilên weke me li xwe dikin û li hember leşkerên Tirka şer dikin".

Baweriya min bi gotinên Zero nehatin û min destê xwe ji destê wî kişand û bi hêrs min got, "xwelî li serê min be ku min baweriya xwe bi te anî û min her tiştê xwe ji te re got. Careke din li min heram be ku ez te bibînim".

Min dewarên xwe dan pêşiya xwe û ez du wan ketim. Min berê xwe da malê. Weha kelek girî ketibû qirika min û dilê min pir şikestibû. Min ji xwe re digot xwezî min bi ya gotina dayika xwe kiriba û ez bi zarokên nenas re neaxiviyama.

Wê şevê dîsa ez bê xew mam. Ji hêlekê ve ez bi Zero re dixeyidîm û ji hêlekê ve dilê min digot, dibe ku gotinên wî rast bin. Dibe ku leşkerê me jî, hebin. Lê dîsa dilê min digot, "keçê, ma tu dîn î, ku leşkerê me hebana, leşkerên Tirka li vira çi dikirin. Ma rojekê wê leşkerên me jî, nehatana gund?"

Ez weha dil bi kul û keder ketim xew. Sibehê zû dayika min deng li



min kir. Ez rabûm, min tûrikê xwe yê xwarinê avit milê xwe û dewarên xwe ji axo derxistin û ez çûm çêreya gund. Min got êdî ez ji vir dûr nakevim.

Heta ku buhar xelas bû û giya li erdê hişk bûn, ez ji çêreyê dûr neketim û min careke din Zero nedît. Piştî ku çêre hişk bû, dayika min got, "qîza min, tu divê car caran ji çêreyê bidûr keve, ji bo ku dewar biçêrin, an wê ji naza bimrin".

Li ser vê gotinê pêwist bûm ku ez berê xwe bidim Newalê. Lê min nedixwest ku ez Zero bibînim. Pêşî ez bi tirs çûm newalê. Lê min dît ku Zero ne li wan dera ye. Ji aliyekî min meraq kir û ji aliyekî ve jî, kêfa min hat. Min ji xwe re digot kesê ku hevalên wî leşker bin ji min re nabe yar û ew jî, dijminê min e. Ji ber ku leşkeran gelek zilm li ber çavên me li gundiyan dikir û wek bavê min digot lingê wî jî, bi mayinên leşkera wisa bibû. Ji ber vê yekê leşker li ber çavê min reş bibûn û min digot ku ez mezin bibim an fersend têkeve destê min, ezê leşkerekî bikujim û heyfa lingê bavê xwe hilînim.

Dema ku buhara rengîn û bêhnxweş derbas bû, dar û devî têr pelçîm bûn, germa deştê jî, dijwartir bû. Ji ber vê yekê pêwist bû ez xwe hîn jî, ber bi newalê de berdim.Rojekê min dîsa xwe berejêr berdabû û ez ketibûm nava xeyalan, min hew dît bê çawa li min bû êvar. Dîtina min dît ku sî ketiye ser newalê. Ez bi lez rabûm û min herdu golik û çêleka xwe da ber xwe û bi lez min berê xwe da pêtiyê newalê. Lê gava min berê xwe da jor, min dît ku sê zilamên bi çek, ber bi min ve tên. Ez pirr tirsiyam û min got ev leşkerên Tirka nin, wê xerabiyê bi min bikin û min dewarê xwe hiştin û baz da.

Dema ku min baz da, yekî ji wan leşkeran bang kir û got, "metirse xwîşka min, em ne xerîb in. Mereve em heval in.

Dema got, "em heval in", gotina Zero hate bîra min û min ji xwe re got, welle cilên vana û çekên vana jî, nedişibayan (nedimaniya) yên leşkerên Tirka. Ji min re bû meraq ku ez bizanibim bê heval çi tişt in û min got welle min bikujin jî, ezê bisekinim û wana bibînim.

Ez li cihê xwe sekinîm û li wana vegeriyam. Dema li min nêzikayî kirin, min dît ku por û riha wana jî, dirêj e û qet naşibin leşkerên Tirkan. Dema hatin cem min, wana jî, weke Zero destên xwe ber bi min ve dirêj kirin ku ez bigrim û bihejînim û ji min re gotin, " metirse xwîşka min, em heval in. Ma qey te heval nedîtine?" Û piştre pirs kirin bê ez ji kîjan gundî me. Ez hîn jî, nizanim bê çi bi min hatibû, çi dipirsiyan, ji ber xwe ve min bersiva wana dida. Bi pirsên xwe fêhm kirin ku ez wana nas nakim û min tu caran ew nedîtine. Hebekî ji min dûr ketin û bi hev re axavtin. Piştre yek ji wana hat cem min û got, "heval li te bû dereng. Heta vê seetê qîz bi tenê serê xwe li çolê bimînin ne baş e, emê bi te re bên heta mala we."

Ez pirr tirsiyam û min got ku dayika min, we bi min re bibîne, dê min bi şîşên sor bikewîne.

Lê wana guh nedan min û yekî ji wana gavantiya dewarên min kir û yên din jî, dan pêşiya min û me berê xwe da gund. Ji aliyekî ve ez ji wana ditirsiyam, lê ji aliyekî din ve jî, min li axavtin û nêzîkbûna wana dinêrî û dilrehet dibûm. Êdî min fêhm kiribû ku vana ne leşkerên Tirka ne. Ji ber vê yekê ez kêfxweş bûm, lê ev kêfxweşiya min gelekî dom nekir, ji ber ku ez pirr li ber xwe ketim ku min Zero ji xwe dûr xistibû. Ku min zaniba hevalên wî ev kes in, ma min wisa li serê wî dikir? Zero dîsa li ber çavê min şêrîn bibû û min digot xwezî min weha zû dev jê neqeriya. Min fersend nedayê ku hevalên xwe ji min re bide naskirin.

Bona azadiyê gelê Kurdan tu caran serhey da kom nebûn û bi awa eşîran ji hev bela man. Dijmin ev rewş zanibû û dixwest ku wisa bibe. Mîrê her eşîrekî, bi serê xwe diçû, xwe ji eşîrên din dûr digirt. Ev yeka kêrî dijminên Kurdan dihat. Dijmin zanibû ku Kurd li serhev bicivin, pişta xwe bidin hev, ew nikar li ser welatê wan zêde bimîne, nikare tiştek ji wan bistîne. Bona ku eşîr her hebin û Kurd nebin gel, dijmin hemû mecalên xwe dixebitand. Qomsiyên xwe di nav gelê Kurd de digerînin. Pere û çek li eşîran belav dikin. Pirtukan ser hîmê eşîrtiyê didin nivîsandin. Neyar ber bi vê awayê eşîrên Kurdan berdide hev, bi hev re dike dijmin. Lê Kurd ku kitkitî dibin, dijmin hêsanî pêka wan tî-

ne. Lê dîsa jî, dijmin nedikarî ku bi hêsanî êrîşê bibe ser zoman. Mêr û xortan çek girtibûn, li ser çiya dipan. Gava ku dijmin dixwest cerdê bavêje ser zoman, ewan pêşî lê dibirîn, dijmin ji hev tûrteweşe dibû, û paşve vedikişiyan. Lê gava ku dijmin pêk lê dianî, bi ser ewan tu însaf nedianîn bîra xwe, jin û zaro, kal û pîr giş didan ber gulebaranan û hemû jîndaran diqelandin.

Di dema aşîtiyê de, gelê Kurd, li ser axa xwe bi şahî dijiya, rojên xweş derbas dikir. Qey çi dibiwa ku dijmin dev bi zordariyê berda, rojên azadiyê kulîlk vekirina, xwîn nerêtana. Lê neyarên xwînxwar nahêle ku dostiya gelan saz bike.

Rojek ji wan rojên zozanên me yê sayî bû. Li zomê şahî hebû. Lê ew nikaribûn tu caran pişta xwe bi dijmin ve girê bida. Wan zanibû ku dijmin fersend bibîne, dê cerda xwe bavêje ser zoma wan. Bona vê yekê hemû xort û mêrên zomê, çek hilgirtibûn û hilkişiyabûn çiyan. Qerewiliya zozanên xwe yên bi gul û sosinî dikirin. Ewan ji zomê dûr ketibûn. Li yalîkî xelet rêya dijmin biribûn.

Danê nîvro bû. Mî û çêlek bona dana, vegerîbûn bêriyê. Nijkê ve bû qîr çîniya gulle û narûncokan. Xwelî û mij li hev quloz bûn. Zêrîna hêywan û mirovan tevlihev bûn. Ziwîniya mirovan, kalîniya miyan, orîniya çêlekan, şêwîniya mehînan li hev hatin çûn. Cerda dijmin avîtibû ser zomê.

Zabitekî dijmin pêncî cerdevanên xwe ve zomê gulebaran dikirin. Çavên wan di xwînê de mabûn, tu tiştek nedidîtin. Hewanên zomê ji hev belawela dibûn. Jin, zaro, kal û pîrejin dihatin gulebaran kirin. Binha xwînê, dû û bardê li her derê beiav bû. Ji bilî şeş cindiyan li zomê êdî tu mirov nedixuyan. Mêş û moz ser cinazên mirovan û cendekên hewanan digerîn. Cerdevan li ser cendekan digeriyan. Wan dengê zarokî bîhîstin. Van şeş xwînxaran careka din li xwe fetilîn. Di nav berata zomê û cinazan da çavên xwe gerandin. Wana dîtin ku hela di kolîkekî de hinek sax mane. Ewana bi hev re rikêyî hundir kirin. Li kolîkê kal û zarokekî dîtin. Ew gulebaran kirin, kuştin. Gava ku dor hate zarokê, cindî tiving ser da zivirand wî jî, bikuje. Lê zabit bi milê cindî girt ew şulida vekişand. Got: "Hûn wî ji min re bi êşînin." Zaro du salî bû. Lê zabitê xwînxwar ew ji xwe re dijminkî mezin dihesiband. Zendê zarokê girt û di erdê re keşkir. Ziwîniya zarokê diçû li zinara çiket û ji wir vedigeriya. Ava berê li golavan li cihên çal bibûn delav. Zabit bi qepilê zarowî girt, ew bilind kir, li dora xwe zivirand, zivirand û ew avêt nêv delavê. Zaro, binav bû, serav bû, dîsa ji avê derket qiraxê. Ew sêviyê belengaz, çawa zanibû ku tu kes di hewariya wî nayê, çalepiyan çû ber kendêl xwe kir qilinc. Ji serman diricifî. Dev û diranên wî dizingînîn û li hev diketin. Lê dijminên wî ji jor ve ew temaşe dikirin û pê dikeniyan. Zabit dît ku zaro di avê de nexeniqî, ji kendêl banzda jêr, milê zarowî girt ew qiloz kir. Qîrîniya zarowî gihîşte erd û ezmanan. Çavên wî notla (weka) du stêrkan berq vedan û şemal dan. Ji çavên wî, bê gumanî, hewarî û neçarî dihat xwendin. Zabit nedixwest vana bibîne. Ewh xên ji kuştin û xwînê tu tiştekî nedidît. Ew careke din bi milê zarokê girt ew avêt nav delavê. Lê zarokê nedixwest bimre, ew careke din çalepiyan ji avê derket kêlekê. Wê gavê çavên zabit yekcar zivirîn. Xwînê ji çavan avêt li ser poz. Lêv lê reş bûn, dest û pê lê ricifîn. Çima ev zarok evqasî li ber xwe dide û namire? Ewî bendek ji bêrika xwe derxist û avêt situyê zarok, bi serê bendê ve jî, kevirekî mezin girêda. Vê carê her duyan bi hev re bilind kirin û avêt nav delavê. Zaro serê xwe bilind kir, lê nikaribû xwe serast bike. Pêlava wî li ser avê ajnê dikir. Her du şimikên wî li ber kendalê mabûn.

Zome bibû cihê cinazan, xwîn li vî cihê weka lehiyê diherikî, bîhna dû, bîso, kizornek û barûtê dihat pozê mirov. Ji vê wehşetê kûçikek ji zomê ber bi çiyan ve direviya. Şewîniya hespan ji terazinan dihat bihîstin. Xulşîniya çemên li dev geliyan dihat guhê mirov, melûlî û zelûlî dida zomê, te digot qey şîn digirtin. Şeş cindî notla mêrxasan ketin rê û dest pê kirin kilam gotin:

Serê çiyan ha mijin,
Kî notla me dikujin?
Cem dikişin gelî da,
Em mêrxas in, berê da.

Min ev serpêhatî, ji mirovekî ku tevlî şerê Agirî, Geliyê Zîlan bûye û di qetlîama zomê da cih girtiye bihîst ●

REWŞEN

Ceger POLA

Evîna min rewşenê
Kovara Kurd nûjenê
Dinya alem azad bû
Ez û tû mane tenê

Gelek xêr û xweş hatî
Bi aheng û meş hatî
Beşaş û rû geş hatî
Bi gul û laleş hatî

Rewşa qada welat î
Li nava roj hilat î
Li ser rêça Felat î
Dîyarî û xelat î

Ji ser kanyên zelal î
Rewşekî şîr helal î
Rewşena me ne nalî
Pirr ezîz û delalî

Tû ahên hezar salayî
Tû dengê bav û kalî
Tû bazin û xirxalî
Li gerdena welatî

Ceger Pola li bendê
Li ya çand û navendê
Li ya welat û rewşen
Li nava vê govendê

Li Ser Enstîtuyê Çend Dîtin

*Di van çend meh*ên borî de, li Sitenbol, rina enstîtuyê, me dîtinên çend rewşenbîvanên me ji van ronakbîrên han ên hêdinasin. Ronak-Reşîd, ji Kurdisyê başur e (Kuryê). Ev çend sal manya dijî. M. Reşîd nê Kurdî dixebite.



Enstîtuya Kurdî hat saz kirin. Li ser avakirên Kurd girt. Em bawer dikin ku xwendeja Îbrahîb Gürbüz û Abdurrahman Durre bîrê hêja M. tana rojavadistana Surin li Ewrûpa - Eli ser tore û zima-

Abdurrahman Durre:

Hedefa me berî her tiştî, mirovatî û azadî ye. Ev jî, bi pênûs (qelem) û çekê çêdibe. Dengê şûrê me îro, xweş tê guhê me. Enstîtu jî, wê bibe pênûsa me. Ji ber vê yekê, rewşenbîrên Kurd, divê di bin siya Enstîtuyê de bibin yek û pênûsên xwe ji bo azadiya gelê Kurd bixebitînin. Rewşenbîrê Kurd ger vê yekê neke, nikare bibe rewşenbîr. Lê mixabin caran em dibihîzin ku gelek mirov ji xwe re dibêjin em rewşenbîrên Kurd in,lê bi dijminatî rexne li têkoşîna îroyîn digrin. Heta gelek caran ji dîtinên neyaran hîn bêhtir li têkoşînê dinêrin. Ew bi xwe tu tiştî nakin, li yên ku dibin jî, biçûk dinêrin û ji bona ku têkoşîna gelê Kurd pêşnekeve, çi ji destê wan tê dikin. Tu di bêjî qey bi navika xwe ve bi hin deran ve girêdayî ne û ji bona yekîtiyê kambax bikin, çi ji destê wan tê dikin. Mîna minafiqan ku dema Hz. Muhammed çi bikira wan jî, dixwest ku kambax bikirana û dikirin. Hz. Muhammed camiyek avakir, munafiqan çûn li hemberî camiya wî, camiyek avakir. Lê Hz.Muhammed ji wan re got:" wê dîrok we nelet bike". Ez mirovekî miftî me, wek ku hûn jî dizanin, di dîrokê de, me dît ku bi rastî jî, minafiq hatin nelet kirin.



Em vegerin ser rewşenbîrên xwe, ger rewşenbîrên Kurd nexwazin ku bibin wek minafiqên dema Hz. Muhammed, bîla werin milê xwe bidin gelê Kurd û qelemên xwe ji bo gelê xwe bikarbînin. Yena (nexwe) ji neletê û ji xezeba gelê Kurd nikarin xwe xilas bikin.

Têkoşîna îro weke lehîyekê ye. Wê şaxwên wê yên biçuk jî hebin. Ger van şaxina tevlî lehiyê nebin, zû-dereng wê ziwa bibin. Divê şaxên azadiyê tev wek lehiyê tevlî behra azadiyê bibin. Tu hêz, nikare wê lehiyê bide sekinandin. Rewşenbîrên Kurd ku vê rastiyê nebînin, ez dikarim du tiştan ji wan re bibêjim; ya ker in, yan jî, xayin in, yan tênagihîjin ku têkoşînê fêm bikin, yan jî, menfeeta wan ji dagîrkeriyê heye.

Ez, bi xwe ji Enstîtuyê pirr bi hêvî me. Çi tiştên me yên bi nirx he-



bin, gerek em wan berhev bikin. Ji bo vêna jî em karibin bikin, du tişt divê hebin, yek jê xebat, yek jê jî, aborî (ekonomik) ye. Em ji xebatê re amade ne, lê aboriya me... Dewleta me tune ku alîkariyê bi me re bike. Hêvî û ûmîda me gelê me ye.

Ez bi hedîseke Şerîf gotina xwe diqedînim. Hz.Muhammed weha dibêje; "Kî ji bona mafê xwe bê kuştin ew şehîd e." Îro çanda me, zimanê me, diroka me, namûsa me bi kurtasî her tiştên me, ji me girtine. Kîjan Kurdê ku ji bona van mafê xwe yê ku ji dest Çûye bigre, bê kuştin şehid e.

Rewşenbîr çav û guhê gelê xwe ye. Gava ne alîgirê gelê xwe be, ew çav kor û guh kerr e. Guhê ker û çavê kor jî, îro bikêrî gelê Kurd nayê. Pîvana rewşenbîriyê îro, di şerrekî heqdar de, alîkariya heqdaran e.

Mustefa REŞÎD:

Avakirina Enstîtuyê gaveke dirokî ye. Ji bona pêşvebirina çand, dîrok û hwd. divêt ku tiştek li himber dewleta Tirkan çêbibûya. Ji lewra Hikûmetê digot çanda Kurd serbest e.

Lê mixabin, di roja vekirina Enstîtuyê de, me dît ku gişt vir û derew in. Tehamulî tabelayekê nekirin!

Ev rastî jî, şanî me dide ku em bixwazin nexwazin têkoşîna çandî û têkoşîna gelêrî tevlihev bûne. Gelê ku ne azad be, tu tiştên wî gelî, ne bi serê xwe ye, gişt bi hev girêdayî ne. Ji bo me Kurda, ev rastî, hîn bêhtir li ber çava ye. Gava konevaniya me pêş dikeve, em dinêrin wê demê çanda me jî, pêş dikeve, xurt dibe, geş dibe. Wê gavê em dikarin bi hêsanî vêna bêjin, çanda Kurdî deyndarê konevaniya Kurdî ye û divê deynê xwe bide, xizmetê ji konevaniyê re bike.

Çand ne şert e ku bi partiyeke ve girêdayî be,lê belê, bê baweriya konevanî jî, nikare tiştên ku bixwaze bike, bikî. Baweriya bi konevantiyê, ji bo me rewşenbîran hin bêhtir girîng û rast e.

İbrahim GÜRBÜZ:

Gelê Kurd dixwest ku bibe xwediyê Enstîtuyeke ku bikaribe bibêje ev enstîtu ya min e. Têkoşîna gelê Kurd, gelek tişt guhest. Di mêjiyê mirovê Kurd de, di jiyana mirovê Kurd de guhestinên pirr mezin çêbûn. Di têkoşînê de, riya xwe dît. Xwest ku di eniya çandê de jî, xwe bibîne.

Me bi avakirina NÇM ê gavek avêt, lê em hatin demeke wilo ku diviyabû em gaveke dinjî bavêjin. Ev gav jî, avakirina Enstîtuyê bû. Yanê avakirina Enstîtuyê, weke peywireke li ber me bû.

Li holê şerrek heye. Ev şerr di navbera gelê Kurd û dewleta dagîrker de ye. Di vî şerî de, wekî her mirovî divê rewşenbîr û kesên pêşverû jî, cihê xwe xwîyanî bike. Ya milê xwe bide milê gel, yan jî, bide dewleta dagîrker. Îro, bê alîtî tune ye, bê alîtî jî, alîgirtin e. Alîgirtina dewletê ye ●



DEMOKRASÎ ŞOREŞ EWRUPA Û REWŞENBÎRÊN ME

MÎRHEM

Di nav hedefên însên de, civat û sazûmaneke demokratîk, cihê serekî digire. Xebat û hewl ên ji bo vê hedefê pirr kevin e û pişta xwe dide tecrûbeyeke dewlemend. Tecrûbeya şoreşa Firansa, şoreşa sala 1789'an, tecrûbeya Şoreşa Rûsya, ya Çînê, Vietnam û Kûba her yekê bi serê xwe xezîne û ders in.

Mirovayetiya îro gellek tiştan qerzdarê (deyndarê) demokrat û şoreşgerên Firansî, Rûsî, Çınî, Kûbî û Vîetnamî ye.

Navên Robespiyer, Jan Just, Marat û Danton, Lenîn, Mao, Ho Şî Mînh û Gêvara, dê bi hêsanî ji bîr nebin û bi vekirî yan jî, nexwiyayî, bi formên berê an jî, bi yên nuhtir, dê tesîrê li mêjiyê însên, helwest û siyaseta mirovayetiyê bikin.

Berî bi salan, gelê Firansa, dusedsaliya şoreş û demokrasiya xwe piroz kir.Dusedsaliya şoreşê bû ya dusedsaliya demokrasiyê, Temenê demokrasiyê û yê şroeşê bûne yek.

Li vir, şoreş bûye dayika demokrasiyê.

Di ser Şoreşa Firansayê 203 sal û di ser ya Rûsya re jî, 75 sal derbas dibin.Di navbera van herdû şoreşan de û piştî wan jî, hemjimarek şoreşên din çêbûn. Her şoreş hewlek e, li ser riya demokrasiyê û civateke bi rûmettir derdixe holê, di hemdemê de jî, ceribandinek e. Tiştên em ji van şoreşan bigrin, hîn bibin û tiştên bi rastiya welatê me re li hev bikin û nekin hene.

Di beyanameya Mafên însanan de, ku nivskarên wê, şoreşgerên Firansî ne û piştre ev beyaname, di deklerasyonên cîhanî de hatine kolandin, madeya yekemîn behsa "azadiya însên" dike û dibêje: "însan, ji diya xwe azad çêdibin"

Niha, di ser Şoreşa Firansayê re zêdeyî du qirnan û di ser a Rûsyayê re jî, sêçarîk sedsal derbas dibin, ev çend pirsên jêrîn têne bîra mirov:

Mirovayetiya îro; jin û tebeqên civakî, çiqasî azad in, sîlogan û diruşmên şoreşgerên Firansî û Rûsî çendî û çiqas hatine cîh?

Cîhana me, mohra demokrasiyê di bêrîka xwe de hiltîne û xwe ji xwe pêve, li himber tu kesî berpirsiyar nabîne û her tiştî li gora berjewendên xwe dipîve û ditefsilîne. Bi gotineke din, Ewrûpayî çiqasî demokrat in?

Xwestek û hewcedariyên demokrasiyê çi ne li Kurdistanê, "demokratên" me çi dikin û ji bo demokrasiyê xizmeta wan çi ye?

Me çi xêr ji demokrasiya Bush, Miterrand û Kohl dîtiye?

Em bi hev re, hinekî li ser van pirsan rawestin.

Di van çend salên dawî de, li derveyê welat, demokrasî, bûye merkeza minaqeşe û maberzînan. Xwe mîna "demokrat" nasandin û navandin, bûye mode. Gellek mirovên "demokrat" bi vê modê û bi neyartiya şerê çekdarî û sosyalîzmê, ji xwe çûne.Tirajediyên Helebçe û paş Helepçê, bêhêvîtiya van tirajediyan bi xwe re anî û bayekî paşverû li wan xist.

Gellek " rewşenbîr" bi ber vî bayî ketin û bûn berdevkên (sözcü)demokrasiyeke seqet, ne zelal û ne diyar.

Tirajedî û felaketên Başûrê Kurdistanê û guhertinên, Bloka Sovyetî, tije ders û jêder in. Tesîra Başûrê Kurdistanê û ketina biloka sovyetî, otonomîxwaz û reformîstên me pasîvtir û perîşantir kir.

Em serxwebûnxawazên Kurd, li guhertinên cîhanê û yên Kurdistanê bi çavekî din dinêrin ku em ders û îbretên ne pasifîst, belê radîkal derdixin. Şikestina xetên otonomîstî û îflasa wan, jihevketina " sosyalîzma reel" û xwirtbûna emperyalîzma Emerîkî, her yekê bi serê xwe rastiyeke roja me ne. Ev rastî, ne sebeb in, ji bo ku em li welatê xwe bi çavên Ewrûpiyan binêrin û bibin alahilgirê (bayraktar) "demokrasiyeke" bê naverok û beradayî...

Welatê me, bi darê zorê û bi devê tifingê hatiye parçe kirin, dagîr kirin û bindest kirin.

Li welatê me demokrasî xiliqiye û xeniqiye.Riyên diçine demokrasî û serbestiyê, giş hatine birrîn. Giş mafên demokratîk; mafê axaftinê, propagandê, xwepêşandan û xweorganîzekirinê hatine kuştin û perçiqandin. Em mîna mirovên Kurd, bi zanav û kesaniya xwe, mîna neteweyek xwedî xislet û taybetiyên xwe nikarin bêne pêş.Her gaveke me, bi ya ber bi pêş, ber bi mirovayetî û demokrasiyê ve, bi barbarîyeke xedar tê himber hev.

Raperîn û serhildanên gelê me, doh û îro, li başûr û li bakur li ber çavên giş cîhana "demokratîk" û "medenî" hatin û têne binpê kirin.

Di vê dema ku ev peyva demokrasiyê bûye mode, benîşt û pizika ser zimanan de otonomîparêz û perçeparêzên me bûne sîmsarên "demokrasiyê" hovîtî û teroreke xwînrêj seranserê Kurdistan girtiye û daye ber xwe

Xwîna van çend salên dawî, ku ji tirajediya Halebçe û virde, li Kurdustanê hatiye rijandin, zilm û zordariya ku li ser gelê Kurd heye, ne berî zayinê, ne piştî zayînê, ne di zemanê roman de, ne di zemanê Şerê Solîbî û xaçparêzan de û ne jî, di wextê fermana Ermaniyan de hatiye serê kesî. Barbarîzmeke Neronî, xezebeke Hîtlerî û qirkirinên nebihîstî heye li Kurdistan û li Rojhilata Navîn.

Çekên ku di dema şerê İran û İraqê de, İsraîl û Ereban de, İraq û Emerîka de û di dema jenosîd û qetlîama Helebçe de, hatine xebitandin, kapasîte û teknîka çekê van şeran, tu heyamên din nasnakin.

Li cîhana îro, ne demokrasî, belê xezeb, heqxwirî, çewsandin û zordarî bandêr û raser e.

Di kitêbeke xwe de, mamoste Beşîkçî li ser terora dewletan, terora dewletên dagîrker û emperyalîst disekine û ispat dike ku serdema em tê de ne, Dewletên mezin, dewletên xwirt û emperyalstî dinyayê kontirol dikin. Bi kêfa xwe û li gora berjewendên (menfaetên) xwe ditefsilînin, îrade û daxwazên gelên bindest û biçûk nagrin ber çav. Li ser bingehê ekonomiyeke xwirt, eskeriyeke xwirt û teknîkeke pirr pêşketî demokrasî xesip kirine, dest danîne ser û mohra demokrasiyê xistine bêrîka xwe.

Dewletên Emerîka yên Yekbûyî û yên Rojava jî, ji dewletên Sedam û Demîrel ne demokratir in. Me di dema kirîza Xelîca Farîsî de û roja koçberbûna Kurdan, demokrasiya wan dît û me naskir bê demokrasiya wan çi texlît demokrasî ye. Me dît bê ka demokrasiya wan çend derece ye, kengî û li ku diqede.

Ferqa Ewrûpa îro, ji ya çarsed-pêncsed sal berî pirr tune. Çavbirçîtî, istîsmar û perçiqandina Ewrûpî, kêmtir nebûye. Kolonyalîstên İspanyolî, Portekîzî û İngilîz û Firansî berê çawa bûn, desthilatdarên Emerîka û Ewrûpa Rojava jî, îro wiha ne. Rewşenbîr û siyasiyên me yên li derveyî welat, an kesên ku xwe mîna mirovên "demokrat" dinasin, nabe rastî û realita welatê xwe, zordariya rejîmên dagîrker, helwest û siyaseta dewletên Rojava ji bîra dikin û dibin şûrkêşê lîberalîzmeke bê hawe.

Ewrûpa li gora awira berjewendên xwe, heq û hîqûqê diwezinîne û di mesela demokrasiyê de, pîvanên ne wek hev bi kar tîne.

Ewrûpa ne demokrat e.

Payîza sala 1991 ê, piraniya televizyonên welatên Ewrûpî, filmekî BBC weşandin. Filim, li ser şerê İraq û Emerîka û helwesta dewletên Rojava li hember pirsa gelê Kurd bû. Li her welatî ev filim, di televizyonan de, ji aliyê pispor û şarezayên Rojhilata Navîn hate minaqaşe kirin. Dîtina giştî ew bû ku ketina Seddam, li gor berjewendên Emerîka û Rojava ne bû. Ketina Seddam dikarîbû bibûya sebeba ji dayikbûna dewleteke kurdî re. Dewleteke kurdî jî, kes (Tirkîye, Emerîka û dewletên Ewrûpî) naxwaze, dewleteke Kurdî, wê bêistiqariyê çêke û belans û wezna herêmê xira bike. Îro jî, Ewrûpa, Rojava û Emerîka xwediyê vê dîtinê û vî helwestê xwe yê berê ne. Bala xwe bidinê çend serokên Ewrûpa yên hatine Tirkiyê, tev tiştekî dibêjin: "Em li dijê dewleteke kurdî ne". Ev gotinên Bush, Miterrand, Kohl û Hurt in.

Ev tê çi manê?

Mana wê ev e: Demokrasî û mafê avakirina dewleteke serbixwe, jiyaneke bi rûmet û bi şexsiyet, ne mafê kurdan e. Mana wê ev e, Kurd ne mirov in, netewa Kurd, neteweyekî di dereca duyemîn de ye. Dewlet çêkirin mafê her neteweyî ye, belê Kurd, ji vî mafî bê par in.

Lê belê xwediyên vî helwestî li pirsa welatên Baltik, Yugoslavya û giş gelên di bin îdereya Sovyet de bi çavekî din dinêrîn...

Demokrasî îmkan e. İmkana xebitandin û diyarkirina qedera xwe bi destên xwe ye. Mafê fikirkirina azad, xweorganîzekirin û avakirina dewleteke neteweyî û azad e.Demokrasî mafê jinan, mafê çînayetî û mafê kar û xebata azad, di nav şertên azad de ye.

Mafên neteweyî, mafê jinan û giş mafên civakî û çînayetî bi tenê li ser axa welatekî azad û serbixwe dikarin têkevin jiyanê û bibin rastî...

Kurdistan welatekî bindest û kolonî ye. Gelê Kurd, gelekî bê maf û perîşan e. Bi sedan pirs û pirsgirêkên civakî, çînayetî û kulturî ketine ser hev. Ev pirs, midaxalê dixwazin. Dijminên demokrasiyê li weletê me ne yek, belê çendek in. Çar dewlet in û li pey wan jî, dewletên

mezin hene, menfaetên navnetewayetî hene. Demokrasî li Kurdistanê hatiye xeniqandin, bûye cenaze li ber sikratan e. Midaxeleke radîkal û şoreşgerî dixwaze. Dermanê nexweşiyê, ne neyartiya şerê çekdarî û sosyalîzmê, belê şoreşeke heralî ye. Reçete û projeyên otonomîstî û emperyalîstî ne çare ne.

Rewşa cebha Kurdistanî û serokayetiyên malbatparêz, li ber çavan e. Reçêta Bush jî, me dit. Gel xapand û çend caran ji erda wî qetand. Bahweriya me bi Emerîka nayê û em tim ji xefk û dolabeke malkambaxtir ditirsin. Em êdi nikarin bi dewla Emerîka herin avê û bi şorîta (şîret) dewletên Rojava dakevin birê. Herwiha em dê ji îro û pêde, ne bi çavên Ewrûpî û Emerîkiyan, belê bi çavên xwe li pirsên demokrasiyê û pirsa çareserkirina Kurdistanê binêrin.

Qonaxa em tê de ne, cihê ye. Em dê li gora rewşa xwe ya objektîf û tarîxî meseleyên demokrasiyê bigrin dest û bi awira berjewendên 30 milyon Kurd rahêjin pirsên bingehîn.

Welatên Ewrûpayî, ji zû de şoreşên neteweyî û demokratîkî li pey xwe hiştine. Ewrûpa ev demeke direj ketiye qonaxeke din. Pirs û pirsgirêkên civatên Ewrûpayî demokrasîanîna wan û metodên wan yên demokratkirin û guherendina civatê cihê ne.

Demokrasî anîna me, metodên çareserkirina pirsên civata kurdî, dibe ku li hesabê Rojava û Emerîka neyên, heta pirr caran jî, bi berjewendên wan yên dewletî û dîplomatîkî re ne guncin. Ev nayê wê manê ku tiştê li hesabê Emerîka û Ewrûpiyan neyê û ew nepesinînin, ne demokratîk û şaş e.

Enteresan û balkêş e Ku serokdewletên Ewrûpa, êrîşê dibin ser Partiya Karkerên Kurdistanê û ji bo perçiqandina gelê Kurd, alîkariya dewletên dagîrker dikin. Kes hene, hêj hoyên vê dijayetiyê nenasîne û dijayetiya hîn welatên mîna Almanya û Siwêdê baş ji hev dernaxin. Lewra ji wan weye ku sebebê dijayetiyê çend bûyerin ku li van welatan qewimîne.

Sebep ne ewçend bûyer in ku qewimîne. Sebebên dijayetî û dijminayetiya Ewrûpa Kûrtir in. Sebeba esasî, serbixweyiya Partiya Karkerên Kurdistanê û xebata partîya ji bo Kurdistaneke azad û serbixwe ye. Serxwebûna Kurdistanê, çêkirina dewleteke kurdî li hesabê Elman, Îngilîz, Fransî û Swêdiyan naye. Ev e sebebe neyartî û dijayetiya wan.

Ewrûpa û Emerîka bindestiya kurdan û statuya kurdan ya îro tercihê dewleteke kurd dikin. Ewrûpa heşkere û vekirî li dijê Kurdistaneke azad û yeker e. Ewrûpa, hevalbendê Kurdistaneke perçekirî ye lê dixwaze li her perçî Kurd, xwedî hin mafên kulturî bin. Kin bê gotin Emerîka û dewletên Rojava, ji me zêdetir nêzîkê dewletên Tirkiyê, İran, Iraq û Sûriyê ne. Ew li dijê mafên me yên netewî ne. Ewrûpa li Kurdistanê, ne hevalê azadîxwaz û demokrasîxwazan, belê hevalê dewletên dagîrker e.

Heta Ewrûpa ev Ewrûpa be, felsefa li dijê Kurdan siyaseta dewletên Rojavayî be jî em bindest û kole bin, Ewrûpa û Emerîka dê alîkariya dewletên li dijê me bikin û mafê me nasnekin. Em tu sebebeke ilmî nabînin, em bahweriyê bi demokrasiya wan bînin û ji bo welatên mîna Swêd yan jî, Firansa re bibin şabaşvan.

Demokrasî ne malekî ku mirov li bazarê bikire û bifroşe. Demokrasî ne ew tişt e ku em ji Emerîka û mirovên mîna Bush, Kohl, Miterrand û Mayer pars bikin. Ji roja derketina xwe heta îro, demokrasiyê, şer û ceng xwestiye. Piştgirêdana ne bi xwe, belê bi derve û Ewrûpa ve, em tim li paş hiştine û hinekî din, koletiya li ser me girantir kiriye. Demokrasî, li Kurdistanê dê bi şoreşê bê. Demokrasî, şoreşê, şoreş jî, organîzasyoneke xwirt dixwaze. Demokrasî, Kurdistaneke yeker û serbixwe ye. Hêzên ku ji bo Kurdistaneke yekgirtî û azad naxebitin, ne demokrat in. Otonomîxwaz û herêmparêz, ne demokrat in. Parçeparêz û bavikperest, nikarin demokrat bin. Demokrasî, raqebet û kêbirkêya nav rêxistinan û xetên siyasî ye. Kî ji bo Kurdistaneke serbixwe şer dike, girêkên Kurdistanê kî vedike, kî sînorên nav peran hildiweşîne, kî yekîtiya gelê Kurd ava dike, kî ji bo derxistina dagîrker û neyar xabata herî mezin dike, kî şexsiyeta xwe û gelê xwe mîna çavên xwe diparêze û di şertên dijwar û nexweş de, ji destên xwe bernade ew şoreşger û demokrat e.

Bê hêz, bê şoreş û bê rêxistineke Kurdistanî, demokrasî nayê qefê û nabe perçek ji jiyanê.

Mirovê demokrat mirovekî pirensîpnas e, xwedî xet û xwedî dîtin e, xwedî şexsiyet û rûmet e. Pirs û pirsgirêkên civata xwe dinase, qonax û xwestekên demê dizane, xwedî program û proje ye. Bahweriya wî bi organîzasyoneke xwirt heye, xwe bi rê dixe, diçe ser pirsan û dijwariyên siyasî û civakî, hayîdarê dîrok û derbasbûna şoreşên cîhanê ye, Jan Jak Russo, Marat û Danton dinase. Dizane ku demokrasî xwedî netîcên xwe hene. Heta mirin û zîndan jî, li ser riya wî ne.

Gava mirov rewşa "rewşenbîrên" me yên li Ewrûpa bigre ber çav û rewşa wan, li mêzêna demokrasiyê bixe, dê bibîne ku ne demokrat in û ji bo demokrasiyê tu fedakariya wan tune ye. Gelek ji wan, demokrasiyê, ji bo, venegerin welatê xwe, ji bo ku alîkariya şoreşa welatê xwe nekin û ji bo ku nermaya cihê xwe biparezin, demokrasiyê ji xwe re kirine mertalek û xwe pê vedişêrin. Ji bîra dikin ku demokrasî, ne rev û bazdana ji talûkê û xebatê ye. Li welatekî mîna Tirkiyê cihê demokratan zîndan e. Demokrat jî, ne şoreşger be, nikare bibe demokrat. Demokratbûn û şoreşgertî, bûne du aliyên rastiyê. Rewşa Beşîkçî li ber çavan e. Tiştên ku "demokratên" me yên li derveyî welêt, ji Beşîkçî hîn bibin gelek in ●

www.ararat.org

BOŞLUKLARI DOLDURMAK

Bu öykü Norveç'te yaşamış tahta oymacısı değerli bir ustanın yaşamını anlatmaktadır.

Cemşid BENDER

Ol kasabası, bizim yöreden 25 kilometre kuzeyde. Bir yabancı gözüyle ya da özel anıları olmayan kişiler için Ol'ü bizim yaşamakta olduğumuz Gol ilçesinden ayırmak, ayrı düşünmek olanak dışı. Dağı, ormanı, karı, soğuğu, kooperatif bakkalı, kafeteryası, otelleri ve sokakta ayak üstü dedikodu eden kadınlarıyla bu iki kent, ikiz kardeş gibidir. Arabanızı Ol'ün sokaklarına vurduğunuz da "Biz hiç yol yapmadıkta gerisin geri kendi yöremize mi döndük?" demekten kendinizi alamasınız. Bu benzerlik, sizi şaşkına çevirir.

Yapacak bir işimiz olmadığında, ya da can sıkıntılarımız tepemize oturduğunda, Ol'ün yolunu tutardık. Norveç'in ünlü marangozlarından Breydök Usta, bu kasabada yaşıyordu. Doksan Üç yaşındaydı. Yaşlı Ustaya, bir çamaşır sandığı ısmarlamıştık. Breydök Usta yalnız yaşardı. Evi, tepenin başındaydı. Oldukça geniş bir alana yayılan bahçesinin bir köşesine, atölyesini oturtmuştu. Usta sağırdı. Kapıyı vurmadan içeri dalardık.

Her gittiğimizde O'nu, evin mutfak bölümünde, eski bir koltuk üzerinde oturmuş bulurduk. Eski bir tabak içinde, patates parçaları dururdu. Çaydanlığı ateşin üstünde fokurdardı. Bu ısınan suyun ne işte kullanılacağı belli değildi. Her defasında ısınmış suyu, lavaboya boşaltıp yenisini doldurup, ocağa koyduğunu sanıyorum. Böylece odasında yalnızlıktan kurtuluyor, bir şeyler yapmış olma alışkanlığı sürtüyordu. Bizi görür görmez ilkin korkuya kapılıp rahatsız edildiğini kırgın bakışlarıyla belirtmeye çalışırdı. Burada yaşlı insanlar, günlük yaşantılarını, alıştıkları yalnızlık içinde sürükler dururlar. Oysa biz tersini düşünüyoruz. Kendilerini arıyan, soran insanlardan hoşlanacaklarını sanıyoruz. Hiç de öyle değil.

Şimdiye kadar, en az yirmi kez geldiğimiz halde, bizi hiç anımsamazdı. Kim olduğumuzu, niçin geldiğimizi meraklı bakışlarıyla anlamaya ve çözmeye çalışırdı. Kulağına eğilir, bağıra bağıra sandığı bitirdiyse almaya geldiğimizi söylerdik. "Ya öyle mi?" der, yavaşça doğrulurdu. Sonra koluna girer, merdivenlerden inerdik. Atölyeye kadar yürüyüşümüz on dakika sürerdi. Kapıya yaklaşınca anahtarı unuttuğunu anımsardı. Bu kez aynı titizlikle sürükler odasına geri getirirdik. Anahtarı bulmasını beklerdik. Bu bekleme anında mutfaktaki eski koltuğuna yeniden çöker ve ne için geldiğimizi ve ne istediğimizi sorardı, bize.

"Baba, çamaşır sandığı için geldik. Kaç aydır, bekliyoruz".

"Ben neden senin baban oluyormuşum" diye çıkışır, dururdu. Yaşlı Usta her şeyi çarçabuk unutuyordu. Yeniden O'nu atölyesinin kapısına taşıdığımızda, titreyen eleriyle kendi evini gösterir "Nereden nereye geldik" derdi. "Geldik ama ne yapmak için? Bu saatten sonra çalışmam ben." Sonra bu sözlerini de unutur, büyük duvar saatleri için hazırladığı oyma dolapları gösterirdi. Atölye, tahta işçiliğiyle ilgili çok değerli parçalarla doluydu. Bunlar, kaç yılda yapılmıştı kim bilir? Belki de sipariş verenler, gelip gitmekten bıkmış, bir daha ardını aramamışlardı.

Bizim çamaşır sandığı orta yerde dururdu. Bir yüz titizlikle oyulmuş, Norveç'in kendine özgü halk motiflerini içermekteydi. Ne var ki, altı aydan beri yanlara takılan kulplardan başka, sandık üzerinde bir değişiklik göze çarpmıyordu. Her gelişimizde sandığın aynı durumunu ısrarla korumakta olduğunu görür, anlardık. Yaşlı Usta, atölyeye girince bizi hemen unutur, alışkanlık sonucu orayı burayı karıştırırdı.

Bazen eline bir araç alır, sanki biz orada yokmuşuz gibi, bir dolap ayağındaki budak izini törpülemeye çalışırdı. Ama beceremezdi. Titreyen elleriyle, demir eğeyi budağın üstüne tutturamazdı. Geçen gelişimizde O,yine bir budakla uğraşırken bizim çamaşır sandığını kapağını kaldırıp baktım. Kocaman bir çivi, sandığının köşesinden boşluğa

doğru uzanıp gitmişti. Bu sevindirici bir değişiklikti ama çiviyi yerli yerine oturtmamıştı. Ben çivinin uzunluğuna bakıp dururken, yanıma geldi. "Bu bir siparişitir" dedi. "Yakında gelip alacaklar. Bitirmedim henüz." Elimi iterken kapağı kapadı. "Size ait olmayan şeylere lütfen elinizi sürmeyiniz" dedi. Breydök, sandığın bizimle olan ilgisini unutmuştu. Sonra bu kuşkumuzu doğrularcasına bana döndü ve "Peki siz niçin geldiniz? Ne istiyorsunuz?" diye sordu. Ben de O'nu sinirlendirerek içerisine düştüğü dalgınlıktan çekip almak için, "Bu çamaşır sandığı bizim. Anladı mı şimdi" diye bağırdım. Ama O, yine duymamazlıktan geldi.



O kadar Ol'e gittik, geldik de tek bir kez olsun Breydök'ü atölyesinde çalışırken görmemiştim. Her gelişimizde O'nu patates tabağının karşısında oturmuş bulurduk. Solgun bakışlarını belli bir noktaya diker, düşünür dururdu. Odasında kitap, gazete gibi şeyler de yoktu. Gündelik eşyaları da, elli yıl önceki Norveç'e aitti. Hiç bir şey değişmemişti, sanki. Atölyesine nasıl ve ne zaman gidebildiği, çalışmalarını hangi zaman aralığında sürdürdüğü en güzel örneklerini belirleyen 2 metre uzunluktaki tahta saat kılıfını bana gösterdiğinde "Gelip alacaklar, sanırım ki bitmediğini söyleyemezler" diyordu. "Almak, götürmek isteyecekler, ama vermek niyetinde değilim. Alıp ta ne yapacaklar? Bir saat dolabı işte. Niçin yaptım bunu? Değer mi sanki? Diğer eşyalar içinde yitip gidecek. Bunu düşünmeden alıp götürecekler yine de. Çünkü hep böyle yaptılar. Parayla her şeyi satın alacaklarını sanıyorlar. Para dediğin ne ki? İnsan emeğini satıyor, karnını doyurmak için. Bu çalar saat dolabı, yalnız emek ürünü mü? Emeği aşan yanları yok mu? Eskiden, çok eskiden daha iyilerini yapardım. Ne güzel şeylerdi bunlar. Kim bilir ne oldular? Yapıp sattıklarımdan hiç birisini tekrar görmedim. Çünkü onlar, benden çıktı. Başkalarının oldu. Oyma çizgilerle süslediğim koltuklar, divanlar, yemek ve yazı masaları, oturaklar, tahta et çekme aletleri, tahta presler, o arslan kafalı konsol ayakları, süslemeli dolaplar hepsi uçup gitti.

Gider ya...Nasıl yaşadık bu günlere kadar? Zaman denen şeyi, neyle doldurduk? Kaç yıl olmuş, hiç oturup hesapladın mı? Bütün bu çalışmalar, benim ömrümü elimden aldı. Evlenmeye çoluk, çocuk sahibi olmaya bile zaman bulamadım. Doğru dürüst bir dost, arkadaş çevresi bile bulamadım... Tanıdıklarım, salt alıcılarımdı. Onlardan da bir yakınlık görmedim. Anlayışları, yakınlıkları kendi çıkarlarıyla sınırlıydı. Tümü de biraz ucuz alabilmek için hep bir kusur aradılar ve buldular. Bir defasında, İsa'nın başını işlemiştim ağaca. Üstelik alıcım, bir papazdı. Baktı sonra "Gözleri İsa'ya benzemiyor" dedi. Be Papaz, hangimiz gerçek İsa'yı gördük...Utanmadan, sıkılmadan yalan söylüyorsun. Her sanatçı, kendi kafasından bir şeyler bulur çıkarır... Kiminin yaptığı sakalsız İsa... Kimi tepesinin üstüne bir daire yerleştirir. Kimi de iki melek koyar. Ben bu meleklerin kanatlarını gök kuşağı renkleriyle boyarım, bir başkası gül pembesini, çağla yeşilini seçer.

Yaşlı Usta, ilk kez bana içini döküyordu. Belleğinde kalan kırık dökük anılar, onun ustalığıyla bütünleşiyor, geçmiş yılların faturasını böylece önümüze koymuş oluyordu. Sonra derin bir nefes aldı, konuşmalarını sürdürdü:

" Yine bir başka müşteri geliyor. Kulağıma bağıra bağıra anlatıyor isteğini. Filistin askısında can çekişen bir öğretmenin dramını işle, diyor tahtaya...Çıplak bir kadın. Karşısında ayakta duruyor. Karısı olmalı. Aşağılanmanın, bayağılığın vurgununu yontacakmışım. Her sanatçı, insanlık onuruna sahip çıkmalıymış.

Bu konuyu işlememi istiyor. Hem de bir çamaşır sandığına. İyimserlik işte. Ben bu temayı nasıl işlerim ağaca? Ya da konsollu aynaya? Kolay mı bunu canlandırmak? Müşteri dediğin ustanın işine karışmamalı. Beni, bana bıraksalar daha iyilerini yapardım. Ben, arslan başını ağaca öyle bir yontarım ki dişlerini, diş olarak seçebilirsin. Ama ağız boşluğunu yapamayız, biz. Ağaç işçiliğinde, boşluk olmaz. Açılmış ağızda boşluk olmayacak ha... Düşün bakalım işin güçlüğünü. Bu açılmış ağız, açmazından kurtulmak için uğraşır durursun. Bir şeyler yaparsın ama yine de oldu diyemezsin. Ta ki alıcı kendi gelip "Usta, kendini yorup durma. Bizim işimiz bitmiş. Sağ ol." desin. Bekle. Daha doğrusu Sen ondan duy, çalışmanın sona erdiğini. Tamam dediler mi bir kere, yangından mal kurtarır gibi atarlar arabalarına, yaptıklarımı. Hem de öyle bir giderler ki, ben atölyemin önünde kala kalırım. Unuturlar beni. Bin bir güçlükle dönerim, evime. Koltuğuma oturur gülerim. İçimdeki sancıyı başka turlu söndüremem. Bir şeyler kabarır durur kafamda. "Eksik oldu " der bir ses "Daha tamamlanmadı". Peki nesi eksikti? Arslanın gözleri gülüyordu. Oysa daha yırtıcı yapmalıydım. Acaba her arslanın "gözleri güler mi, avına atlarken". Ben bir Nazi askeri gördüm. Şu tepenin üstünde. Ateş ederken acımasız gülüyordu. Onun etkisinde kaldım. Hayvanlarda bu olabilir. Öyle değil mi? Siz ne fikirdesiniz?

Yaşlı Usta evine dönüpte koltuğunun içinde hareketsiz ve sessiz oturup durduğu zaman haşlanmış patateslere yönelen bakışlarıyla yağlı boya tablonun kenar yörelerinde yer alabilmiş insanlardan birisine benzerdi. Zamanı olan bir izleyici için göze çarpmayacak, bir başka tabloya doğru yürümeye başladığınızda bir görüp, hiç görmemiş olacaktınız. Ama, o, seçilmese de, gökyüzünden inip gelen yağlı kendire son bir kez bakan idam mahkumunun ta gerisinde tablonun dengesini sağlıyordu. O, olmasa her şey anlamını yitirecekti sanki.

Benim düşüncemi mi sordunuz Bay Breydök? Bana göre yaşlılık ve yalnızlık birbiriyle zor bağdaşan şeyler. İnsanlar yalnız yaşamaya başlayınca, Sizin gibi, ilkin eski anılarını düşünüp dururlar. Bazı olaylar, insan belleğinde, bir pınar coşkunluğuyla yenilenir. Anlaşılmamak ya da uğradığınız haksızlıklar, taze bir güçle her gün sizi yenilgiye uğratır. Bu yaşamın içinde olan bir bunalımdır. Diğer bir deyişle, yaşamın bir parçasıdır, bunalım... Bu açmazdan kurtulmak, göstereceğiniz dirence bağlı. Yalnızlığın ilk kertesinde, önem taşıyan olaylarla, taşımayanları birbirinden ayırt edemezsiniz. Ama, zaman ilerledikçe, bu kargaşalık durulur, sessizleşir. Denizin ölü dalgaları gibi...Bir fırtınanın bitimini müjdeler, yalnızlık... Ve artık yüreğinize yerleşen yalnızlık, size der ki "Sel kütüklerine, elbette ki bir kürdan gözüyle bakamazsınız" ama bir kürdanı da, bir sel kütüğü gibi görmenize de gerek yok.

Breydök Usta, ilerlemiş yaşıyla Ol'ün kendine özgü yaşantısının dışında kalmıştı. Kasabayı çeviren ve civcive yatmış bir tavuğu andıran dağa, yıllardır hiç çıkmamıştı. Patates ve elma karışımı bir güzelliği simgeleyen ve insan belleğinde daima canlı bir iz bırakan kasaba dilberlerinin dişiliklerini görebilecek güçte değildi. Tiyatro sahnelerinde gördüğümü« ve karton kentleri ansıtan Ol'ün komiserlik binasını, Buskerud Bankasını ve dolu olduğu olduğu halde hiç birisi yerinden devinmeyen arabalarla dolu trafik parkını, gidip gezememişti.

Bir sopanın ucuna yerleştirilmiş şapkayı, havada sekerek tekmeleyip düşüren Hallingdal'lı folklor oyuncusunu, Ol'ün hemen yanı başından geçen 10. boylamı ve de yaz-kış naylon kaplar içinde üçü bir arada satılan domatesleri, Trondheim yolunda çarpışıp devrilen tren kazasında 23 kişinin öldüğünü ve kaza kurbanlarından birisinin de konsere giden ünlü bir saksafoncu olduğunu, futbol maçında Norveçlilerin hem de kendi alanlarında Yugoslavlara 3-1 yenildiklerini bilmiyordu. İnsanlar, çevreleri daraldı mı, devinme yetenekleri de azaldı mı işte bu duruma düşerler. İşin bu yönüyle insan, iyi bir usta da olsa doksan üç yaşında dünyadan uzaklaşmış bir yaratık demektir. Ama yaşam savaşı yine sürer gider. Dört beş parça patatesle de olsa... Yıkılıp gitmeden önce insanlar, kızmasını da bilirler... Çıkarlarını korumak için de kendilerini savunmaya çalışırlar. Ama ne kurtarılır, bu yaştan sonra. Kurtarılan, artık onlara ne yarar sağlar? Kim, hangimiz düşünürüz bunu.

* * *

Breydök son gelişimizde kapısının önüne oturmuştu, güneşleniyordu. Bu değişikliğe sevindim doğrusu. Her defasında yığılıp kaldığı koltuğunda değildi. Koşarak yanına geldim. Daha ben kulağına haykırmadan eliyle kolumu tuttu. "İyi ki geldiniz" dedi. Beni tanıdığını sanarak, neşesini belli etmek isteyen Norveçliler gibi "Ya-sooo" diye bağırdım.

İşler yolunda gidiyordu, demek. Ne var ki bu sevincim uzun sürmedi. "Burada tıkanıp kaldım, evime gidemedim."dedi. "Bana lütfen yardım eder misiniz?" O'nu koltuğuna sürükledim. Yerine oturur oturmaz, rahat bir nefes aldı. Yeniden canlandı. "Bana yardım ettiniz, teşekkür ederim. Benim için rahatsız oldunuz. Çok sağ olun. Başkaca bir dileğim yok, Sizden" dedi. Breydök kibarca "Hadi işiniz bitti. Ne bekleyip duruyorsunuz. Çekip gidiniz" demek istiyordu.

Benim yerimden devinmediğimi görünce koltuğuna büzüldü. Tüm varlığıyla yitip gitmiş gibi bir tavır aldı.

"Breydök, sandık bitti mi?" diye bağırdım. "Onu almaya geldim!"

"Gerçekten bitti mi? Alıp götürecek misiniz?" dedi. Biraz önce söy-

lediklerini unutmuştu. Koltuğundan ayağa kalktı. Gözlerinin içinde büyük bir sevinç ışıltısı vardı, şimdi... "Ne iyi. Ne iyi. Hadi alın götürün öyleyse. "Koltuğuna girdim. "Kapının anahtarını unutma" diye seslendim. "Hayır hayır, anahtar cebimde. Gelip alacaklarını biliyordum. Hazırlamıştım her şeyi. Hadi gidelim." dedi. Atölyeye kadar yürüdük. Kapının önünde ceplerini aradı, anahtar yoktu. Ben eve dönmek için Breydök'ü geri çevireceğim anda elini kapının mandalına attı. Kolu çevirdi. Kapı açıldı. "Bu kapı hep açık durur zaten" dedi. "Alıcılarım malı götüreceklerinde bu gerçeği öğrenirler. Bazı şeylerin böyle olması iyidir. Beni götürüp getirmekle, onlar da benim gibi yorulmuş olurlar. Bu yorgunluk alıcılarımı satın aldıkları daha çok bağlar. Gördüğü malı beğenip parayı sayıp hemen malı alıp götürmek nasıl bir hüner değilse; parayı aşan durumları yaratmayan usta da usta değildir."

Atölyenin içine girdiğimizde Breydök'ün cansız gözleri yeniden parladı."Sandık gittikten sonra, onun bıraktığı bir boşluk var ya, benim gibi ustaları dinlendiren, huzura götüren o boşluktur işte" dedi.

Oysa siz ve sizin gibiler, evinizde sizi sıkıntılara boğan boşlukları doldurmakla uğraşır durursunuz. Evinizin bir köşesine bir eşya koyduğunuz zamanda rahatlarsınız. Ne anlaşılmaz bir tutkudur bu."

Sandığı çıkarmak için hazırlık yaparken Eşim, "Dur bakalım, bu bitmemiş sandığı götürüpte ne yapacağız?" dedi. "Bunu evin hiç bir yerine koyamam ben" diye çıkıştı. Haklıydı da. Çünkü Norveç'te kusurlu mallar, beş kuruş etmez. Böyle eşyalar santas (en uzun gün) şöleninde kasaba alanlarında toplanır, yakılır. "Sen ne dersen de, ben bu sandığı alıp götüreceğim. Ünlü bir ustanın belki de yaptığı son eser bu. Dünyada nice yarım kalmış romanlar, bitmemiş senfoniler, tamamlanmamış yontular yok mu? Bu da onların birisi işte .." dedim. Sandığa sarıldım. Breydök, kapının önünde bize bakıyordu. Sandığı çıkaramadım. Sandık kapıdan büyüktü. Çıkması olanaksızdı. Yaşlı usta gülüyordu, benim çabalarımı gördükçe. "pencereden çıkar, o başka yerden çıkmaz diye bağırdı."

Bir çocuk gibi sıçrıyor, zevkten dört köşe oluyordu. "hep bu hatayı işlerler, bilmezler diyordu. "Bu kapı, yalnız insanlar için yapıldı. Eşyalar için değil.



Ustanın tezgahını, araçlarını, yarım kalmış eserlerini uzun çabalarla atölyenin ortasına topladım. Bu iş, çok zaman aldı. Sandığın pencereden dışarı çıkarılması için büyük emek harcadım. Kan ter içinde kalmıştım. Sonra atölyeyi eski durumuna soktum. Breydök, taburenin üstüne oturmuş, düşünüp duruyordu. Benim yaptıklarımla ilgilenmiyordu artık. İş bitince "atölyemi iyi bir durma koydunuz. Her şey güzel oldu. Teşekkür ederim" dedi. Bu işi Herness yapardı, arada bir. Ama çoktandır gelmiyor. Balığa gittiğini sanıyorum. Hoftun gölünde balık tutmasını çok sever. Hınzır adamın birisidir, O...

Son gelişinden bu yana iki yıldan çok bir zaman geçti. Zaman dediğin de ne ki? İki yıl, sanki dün gibi... Borcunu ödemediği için gelmiyor. Bunu biliyorum. Kendisi gelmez ama birisini gönderir. İşte sizi gönderdiği gibi. O'na selamlarımı iletin ve deyin ki, para için dost olmak ne kadar saçmaysa, düşman olmakta o kadar gereksizdir. Bunu söyleyin olmaz mı?

***

Breydök'ü tanıdıktan sonra, Ol kasabasının bir özelliği oldu benim için. Yaşadığım kentle bu yöreyi birbiriyle karıştırmadım artık ●

www.arsivkurdi.org

MAR Û KEW DIBIN YEK

Mayi REMO

Hat çiyayê Bêzûrê marek reş yê bê ûjdan
Kedxwar û xwînxwar û zor dikir nêçira kewan

Dehla tev darê mazî bi kankol û antûve
Kewa biçûka bêçar wê bi ku da bireve

Marê reş yê diran tuj çiya li kew kirbûn duj
Mefer nedan wî her li peybûn ew bi şev û roj

Kewê di dil xwe de got ezê ji vir derkevim
Ji derdê vî marê reş divê ji vir birevim

Biryar da ku sibê zû ji mala xwe derkeve
Berya sibê ronî be gavekî zû bireve

Şeveq da kew hate der ji wê mala xwe ya teng
Dît ku çiya melûl e qet jê nayê his û deng

Xwest ku rê keve here, eva hat bira wî
Axa bav û bapîran çawan bikime terka wî

Alîkî tirsa marî yê dijî axa welat
Li vira ma benda wan, ji xwe mabûn gêj û mat

Da ber hişê xwe ka kîja jê re bi xêr û bêr
Taw kir, li hemberê mar bisekine wekî mêr

Bizvandina xwe anî çû nêçirê weke şêr
Li nav çiya geriya heta zikê xwe kir têr

Hêdî hêdî hate mal pir bi kêf û dil bi geş
Nedianîn bîra xwe ewî tirsa marê reş

Ji wê rojê û pê ve nedikir paxav ji marî
Dît ku rojek mêranî hêja ye ew hezarî

Rojek derkete der xwe da ber siya zinarek
Wer xelmaşê xewê ma hate hinda wî kalek

Kalê gotê keça min çawa tu hatî vira
Tu bi tenê digerî bê bav û ap û bira

Ka bibêje kalê xwe, ev tebaya bi dizî
Kalim aqil min nîne, berê hişê maye, rizî

Weka ku ez dizanim, ev çiyayê pir bi dar
Kes qinyatê lê nake, ji tirsa xwînmijê mar

Mixabin way dibînim, tu bi tenê li virî
De ka zûka bibêje vî tebayî vî sirrî

Kewê gote kalo bes, tirsonekê belengaz
Bê kezebê bê zirav,te xwe daye pal û gaz

Mêrî xwedan simbêl î, wekî mêran xeberde
Ev hatina min a vir,çima ji bo te derd e

Eger dikî pirsa marî, ji bo te ew mar e
Ew ji bo min ne tişt e, ne piştî ye ne bar e

Ha ew mar û ha kermêş tev rawerê van çiya
Li ba min ne teba ne ez natirsim qet ji wan

Kalo binêr li min baş ew marê tu dibêjî
Ew bi xêra tirsa te li vî çiya yî dijî

Eger tu jê netirsay, te pêr bikra ceng û şer
Niha zû da ew çûbûn derketibûn wekî ker

Kalo bersiva wê da got biçûka min a jar
Xwedê kir ku te nedî a ku min di sala par

Ew marê xayin ê pîs par li pêy min geriya
Ez mam di nîv mala xwe heta berf hate çiya

Sond xwaribûn gotibûn eger ez wî bibînim
Gere guhê wî jêkim her du çavî derînim

Ezê pîr ê extiyar belengazê bê huner
Bi vî telê xwey biçûk çawan pêre bikme şer

Çek û sîlahim nîne bi dest ez pê nikarim
Ji ber vê ye ev çend sal bi dehlê ve qe naçim

Rojekî ez li mal bûm min dît hate ber derî
Di naliyan digotin ax li minê bê serî

Dengekî bang kir û got çima nayê hinda min
Em birayê hevdu ne çiye xerabiya min

Min bersiva wî da got ey zalimê bê ûjdan
Te kuşt bav û bapîran tevlî xwişkan û biran

Îca qey dora min e ey fenkêr ê xapînok
Bê ûjdanê bê insaf ma ji te re qey heye kok

Here ji ber der ê min doza te li min çi ye?
Tu ji bona çi hatî qey zikê te birçî ye?

Tu sed salan li vir bî baş zanibe nayêm der
Here ji ber derê min xayinê ehmeqê ker

Dît ez nayêm xapandim wî sond xwarî bi "Tanrî"
Roja ku ez te bigrim dê te bikim çend kêrî

Bawer kir ku naçim cem bê gav ma û çû ji wir
Teba ji dest min nehat hew man min lê kir nifir

Ji par û heta vêga ez neçûme bi wir da
Serê ku qet ne êşe çima dê bixme derda

Kewê dîsa jê re got kalê pîrê bê mecal
Ji tirsa wî marî reş tê bitirsî gelek sal

Mar ji bo me dijmin e were em tev bibin yek
Ji bo xwe re peyda kin sîleh û rext û fîşek

Li hemberê marê reş bisekinin her wekî şêr
Pêra bikin ceng û şer wek egîtan û wek mêr

www.arsivakurd.org

Kalo te kermêş dîne çiqas biçûk û bê hêz
Te dî gava dibin yek li pey hev ew dibin rêz

Marê reşê bi jarî ji tirsa wan nayê der
Li hundir ew dimîne wê gavî ew weke ker

Heta kalê weka te bê kezeb û bizdonek
Li vî çiyayî hebin em dê hêsîr bin gelek

Kole û bende û jar, bê umîd û ustu xwar
Di nav dest û piyan de, bê xebat û îş û kar

Yezdan ji wer nahêle, bi vî hişê wey biçûk
Evî dehlê wek bihişt ji marê re we kir sûk

Eger hûn mêr û jîr bana bi we re hebiwa heş
Evî dehlê xweş û şîn nedket destê marê reş

Wek pepûk û evdala, li ber zinarê vala
Nayê ji we hes û deng, wekî gêjan û lala

Ma tu dikî umîdê ji vî marê bê îman
Bi sed salan birçî bî, ji ter dide gezek nan

Hela nan bihêle li wir, waye te nahewîne
Wî sonda te xwariye, nade te heqê jînê

Kalo ma ew çi hale, tu naynî ber hişê xwe?
Tu dê kengê bi zorê,bistînî vî heqê xwe

Heta bi vêga tucar heq nehatiye ber derî
Ji bo heq û stendinê, jê bûne gelekî serî

Ger dixwazî bijî tu, li vî gundê dilgeş
Bê gaviya te ev e, derxe ji vir marê reş

Mal xirabê bê mejî, biger li hinda kewan
Civateke xwe çêke, bêje ji bo giştan

Divê em tev bibin yek, yekî ji xwe'r bikin mîr
Ji nav xwe yek bibjêrin, ewê pir zana û jîr

Dema hûn çûn ba hevdu, we bijartî mîrê xwe
Yeko yeko bêjin wî hemî derd û kulên xwe

Ew mîrê ku bû serok, riyan baştir dizane
Gotin û peyvê bikin ji xwe re bikin rêzane

Kalo da ber hişê xwe, van gotinê qenc û baş
Pêşkêş kir jê ra gelek sipasî û tev şabaş

Kalo rabû wek mêran kete qulê zinaran
Cî bi cî ew geriya, heta zozan û waran

Kon û warê eşîran, tev axa û emîran
Yek bi yek ra xeberda, tevlê ciwan û pîran

Hemu hatin gihan hev, wan civatek xwe danî
Yekî pir jîr û zana mezinatiya xwe danî

Ewan tevan bi carek, reya xwe dan ewê jîr
Gotin tawa me ev e, ji bo me ra bibe mîr

Mîr got sipasî ji we'r, bi wan keyfa xwe anî
Rih sipîkî di nav wan, taca serê wî hanî

Bi dil xweş û bi şadî, tacê danîn serê wî
Ji wê pê ve serokî bilind kirin, destê wî

Serok gote civatê hêzê xwe bînin vira
Da hevûdu binasin, tev bibin yek wek bira.

Roja dinê sibê zû hêzên wan hatin ba hev
Serok rabû ji wan re derd û kulan anî dev

Serok ewana anî, kir çend kom û qol û par
Çek da destê yê zana, ewê din jî, man bi dar

Çendekî wer xebitîn heta hîn bûn ceng û şer
Ji bo herin şerê mar, heta ewî bikne der

Serok dît ku ewana, tev hînbûne lêdanê
Gote wana sibê zû werin evê meydanê

Serok ew şev raneza heta sibê fikirî
Riya ceng û lêdanê serê xwe de rêkirî

Leşker sibê zû hatin, li meydanê bûne sef
Lê vî marê bê insaf, xwarin gelek gur û gef

Sond xwarin wan bi yezdan, heta ewî marê reş
Li nav rastê bi lêdanê, ewî nekin weka leş

Heta ji me yek hebe, em dê pêra bikine şer
Hema çi tê bira bê, gere ji vir here der

Bi qîrîn û bi fîgan hêriş birin ser marî
Ewî dehla pir mezin mij hate ser bû tarî

Ji xew rabû marê reş, hate serî aql û hiş
Dihatin dengê kewan sond dixwarin bi laleş

Heyfa me ye li ser mar, divê em jê bistînin
Wî kafirê bê îman, li ser axê hilînin

Mar dît ku hal xirab e, şer bi wan re qet nabe
Bi dizîka bi rê ket, got bo min rev sewab e

Kewan dîtin ku diçe, dixwaze ku bireve
Dengê xwe qet nekirin, da ji dehlê derkeve

Mar ji dehlê derket der, kewan hêrîş dane ser
Piş û paşî jê stendin, ma li rastî mîna ker

Serok gazi kir marî, got xayinê bê îman
Te yekbûna me rokê, nedikir hêvî û guman

Lê eva baş bizane, ewî zora te kirî
Me tevan anî ba hev, yekîtiyê çê kirî

Ahd û peymana me ye, divê tu sax nemînî
Heyfa wanê te kûştin, gere ji te hilînî

Serok emrê leşger da, lê hatin hev wekî mêr
Ewi dane ber derban, kûştin bi xincer û kêr

Tewan kir kêyf û şahî, li vî dehlê xweş û şîn
Dilgêş û şad û azad, xelas bû şîn û girîn

Yê bindest û belengaz, heta nebin wek kewan
Yê ked xwar û xwîn xwar, wê bimêjin her bi wan ●

www.arsivakurdi.org

REXNEYÊN LI SER WÊNE Û HUNERÊN POLÎTÎKÎ

Fevzi BİLGE

Di pêvajoya dîroke de, hêzên emperyalîst û kolonyalîst di mêtingehên xwe de çand û hunerên gelan, bi riya talan kirinê û lê xwedî derketinê xwestine tune bikin; hunermendên li himberî sazûmana wan derketine jî, hatine perçiqandin.

Weke tê zanîn, berhemên hunermendî dema, tenê ji bona pera bê çêkirin, him ji hunermend him jî, ji têkoşînê re zirarek pirr mezin tîne holê û hunermend jî, ji hunermendiyê derdikeve.

Piştî sala 1970' an û ta îro çend bûyerên girîng, ango êrîşên faşîstan û têkoşîna li himberî wan tê zanîn. Nemaze li Kurdistanê qirkirinên pirr mezin pêk anîne û hîn jî, dom dike.

Hunermendên Tirk, van bûyeran hêsan dîtine (weke cûnta 12'ê îlonê û 12'ê adarê) nexebitandine. Hîn bêhtir tirs û xof xebitandine! Mirov dikare çend hunermendan ji nav vana biqetîne, lê belê vana jî, pirsên xwe yên bingehîn nedîtine û nexwstine ku bibînin jî. Dema li Kurdistanê têkoşîn gur bû, hunermendên ku li eslê xwe û li Kurdbûna xwe xwedî dernediketin, hêdî hêdî li xwe vegeriyan li gelê xwe û li eslê xwe pirsiyan. Ev jî, gaveke pirr hêja ye.

Em karin bêjin, wênevanên Tirk, piştî sala 1970'an û ta niha bûyerên civakî ne zivirandine berhemên hunermendî.

Yên ku hêzên serdest ew stendine nava çerxên xwe ew jî, xem û xeyalên xwe yên metafîzîkî dirûvandine. Hinek hunermendên Tirk, di mejiyên xwe de teslîmbûnê nehezimandine û wek bêjin ku vaye em teslîm nebûne, hunermendî kirine. Di wêneyên xwe de, kevokên di qefesan de, yên bask şikestî û pinpinîkên (kelebek) birîndar dirûvandine. Li gorî min ev jî, cureyek teslîmiyetê ye. Teslîmiyeta ser girtî û hîn bêtir bi xeter e.

Li Tirkiyê wêne, hinekî bi nedîtbarî (soyut) hatiye dirûvandin, kesekî tu tişt jê fêm nekiriye. Tu di bêjî qey ji bo ku tişt jê neyê fêm kirin wêne çêkirine. Wêneyên ku hatine fêm kirin jî, bûye armanca rexneyan. Bi rastî ev rexne ji berê ve li ser berhemên hunermendî, yên şoreşgerî ango berhemên polîtîk dom kirine. Berhemên hunermendî li gorî wan mekanîk, dogmatîk û sloganî ne. Divê rexneyên li ser hunerên sloganî-polîtîkî baş bên zanîn. Ger baş neyên zanîn, nikare peyvendiya huner û polîtîkayê şîrove bike. Hunerên bêalî tune ye, ya di xizmeta hêzên serdestan de, yan jî, di xizmeta bindestan de ye. Xwendevan di karin bêjin ma sêva di sênîkê de, ango naturmortek, çi girêdana wê bi polîtîkayê ve heye? Heye. Lewra wênevanekî pêşverû van sêvan wê bi çavekî din bidirûvîne. Qet tune be, wê di rewşa ku sêv têde be, bê xuyanîkirin ka ev sêv a dewlemenda ye, an jî, ya belengaza ye, ya di sênîka zîv de ye, an jî, di sênîkek dar de ye.

Di bingeha xwe de sêv, sêv e, lê rewşa sêvê, nerîna wênevan dide destê mirov. Bi kurtî slogan, li gorî min, wê her dem hebe. Weke me li jor jî, got, hunera polîtîk dewlemend e. Mînak: Îro em dibêjin azadî, serxwebûn, berxwedan û hwd. Sibê emê dîsa slogana bavêjin, lê ev sloganên me, wê bên gûhertin. Belkî piştî xelasiyê, em sloganên Kurdistaneke hêşîn bavêjin. Herdû jî, slogan in. Lê yek germ e yek ne germ e.Yek ji bo îro ye, yek jî, ji bo sibê ye.

Dema Engels gotiye "lênerînên hunermend çiqas veşartî be, hîn baştir e" ne gotiye xewn û xeyalên fetsan çêkin. Divê di berhemên hunerî de mesaj, jiyan be. Wêneyên nedîtbarî (soyut), bê têgih, ji estetîkê dûr dixe, berhemên hunermendî hêsan dike û ji hunerê ve bi dûr dixe.

Di devera derbasbûnê de, ango dema şerê germ de berhemên hunerî, divê hîn bêtir polîtîk be. Mînak: Neteweyek ku têkoşîna rizgariyê dide, divê hunermendên wî welatî, ta demekê rastiyan bi riya sloganî bînin zimên. Di stran, şangelî û wêneyan de slogan bê xebitandin. Lewra ev divêtiyek jiyanê ye. Divê em jî, rastiyên jiyanê bidirûvînin. Belkî sibê em hewceyî avetina sloganên germ nebin!


Di nivîsara xwe de min tiştên ku ji bo rewşa hunermendên Tirk gotibû, ji bo hunermendên Kurd nayê gotin. Weke bûyera Helepçê, berxwedanên gel û yên di girtîgehan de, bi kurtasî têkoşîn ji alî hunermendên Kurd ve hatiye xebitandin.

Li her alî Kurdistanê têkoşîna ku li himberî tunebûnê tê kirin,li gorî ku wêneyên nûjenî pirr nuh e jî, wênevanên Kurd ev têkoşîna ku îro dom dike bi berhemên hunermendî ne tam be jî, daring dikin. Xweziya di dîroka Kurdistanê ya kevnare de, wêne pêş ketiba û serîhildanên weke Dêrsim, Zîlan, Koçgirî, Şêx Seîd û hwd. hatibana dirûvandin. Lê em çi bikin, ev bûyer ne hatin dirûvandin. Ev bûyer dîsa ji wênevanên îro re peywir mane. Ez bawerim ji îro û pê ve çi bûyerên li Kurdistanê pêk bê, wê ji aliyên xwediyên çanda berxwedanî ve bê dirûvandin û daring kirin ●

NIŞTIMANA XWE BINASE

HEWLÊR

Piştîwan B.



Şarî Hewlêr dikewetê daştî başurî Kurdistan. Mêjûyî binyatnanî Hewlêr digerêtewe ber le heşt hezar sal. Yekêke le kowntirîn şarekanî cîhan. Berî piştewey şarî Hewlêr, şaxeberzekanî rohelat û çiyay Sefîn û hawîna hawargekanî Mesîf û Şeqlawe w tavgekanî gelî Elî Beg û bêxal e. Barî pêşewey şarî Hêwler deştî pan û porî başûr e. Daniştûwanî şarî Herlêr nêzîkey yek milyon kes debêt. Deway ewey rijêmî Baasî faşist destî kird be guhastinewey xelkî awayû gund û nahiye w qezay rojhelat bo şarî Hewlêr, be gorey planî bîstem (Xitt El-Işrîn). Hewlêr be dirêjayî mêjû dûçarî dagîrkirdin hatûwe le ber hêrişekanî Aleksanderî Gewreyî grekî w dagîrkerî Ereb. Hewlêr nawe nawe twanîtî henaseyek bidat kolkemîr û paşay xelkî xoyî fermanrewayî şar bigirine dest, bo nimûne paşay Kore.

Hewlêr her le mêjewe çaqî olî (dînî) buye. Le serwextî deshelatî Xaçekan pitir le yanzdeh dêr le şarî Hewlêr da hebûye. Êsta le serwextî desthelatî îslam da, tenya yek yan dû dêr mayitewe w le birrî ewe da pitir le bîst mizgewt heye êsta. Wek yek gdû fêrgayî dînî (medrese) bala her le konewe ewane îdarey mizgewt û fêrgedîniyekan degêrin û le jêrdestiyana brîtin le bûrjûway komprador dewlemendekanî şar. Bazirgan (tucar) yaxut xanewadey serokxêl û hoz le wana: Neqşebendî w Berzincî w Sucadî w... hetit. Yarmetiy daring le layan mîrî be dest dihênin. Rastewxo debestrênewe be dem û dezgay dewrêkî koneperestaneyan bînîwe. Le birrî ewe da, serokxanewadey ew xêl û tîrehozana ke destelatî dîniyan le dest ew cêgayî berzî mîriyan pê dedirêt û cêgay mitmaney fermanreway Iraqî ne. Herçende ew bizûtnewedîniyane le katî xoy da, le formekî netewayî da serî helda, le katî bizûtnewey olî xêlî neqşebendiyeken be mezhebî heqqeyî, tesewwûfî le nawçey şarî Silêmanî da destîpêkird. Katêk serokekeyan be nawî Mewlana Xalidî Eskerî gîraw dûrîxirayewe bo Erebiztan. Ewsa mirîdekanî Heqe bo xo pişandin le dijî paşa le dewrûberî salanî 30-40'ekan xopişandan sazkird û jin û piyaw le bergî cunya da berew deştî şarî Kerkûk û Hewlêr hatin. Duway serûbinbûnî salî 1958'î temmûzî Iraqî w nemanî destelatî padşayetî ew xanewade xêlekiyane, beşekî zoryan le şarî Hewlêr û Kerkûk niştecê bûn. Ramyariyî rijêmî Iraqî, komarî helsta be misogerkirdinî pare w mulk û destelatî berêwebirdin bo yan û le şar da niştecê kirdinyan. Axa û derebeg û serok tîrewhozî gundekan, êsta le şar da dewrî konteraçî w bazirgab û zengînî le şar da. Beşekyan serokcaş û xofiroşî rasteqîne. Xelkî hêjar û zehmetkêş, sextirîn û naxoştirîn barî jiyanî rojane debene ser, zorbayan le dewr û berî şar herêmwkî niştecê bûn. Lê barêkî zor seretayî da dejîn bê elektrîk, bê aw, le teneke w berd û amêrî herzan xanû kalokey narêk le palî yek dirûst kirdiwa. Zor car duçarî ewe debin ke be siwarî ker û esip aw bigêzinewe yaxut elektrîk le hêlî şeqamî serekî be şêw çetal ken û bidizin, bo tozêk rûnakî şewan. Hezaran xelkî aware w koçker le şar da, be em şêweye niştecê bûyine. Gerekî milliyanwe. Her roja çendîn caran, le layan dezgayî şarawanî ruswa bibûne xelûzî şorişî aşbetalî w way aşbetal le layan serkirdakanîn toqî w encam; ne gund ma w ne şorişî!

Êsta jiyanekî qonaxseretayî w dûr le hîwa w gund û xêr û bêrî seretayî w biçûk, ke beşî nîwey mafûr û kargey kaşî (mermer), kargey şîremenî (elban). Hewlêr nawnabg e be mêywe w genim û danewêle. Le hemû nawçekanî Hewlêr û deştî Hewlêr, deştekî be pît e bo danewêle. We nawçeşaxewiyekanî Hewlêr be naw bang e be hawîna hawar û awî sazgar. Zengîn e le mer û malat û ajel da. Xelkî ladeyekanî dewr û piştî Hewlêr zorbeyan jiyaniyan bendebe mer û malat, bexêwkirdin û cotyarî.

Şarî Hewlêr, wek hemû şarekanî Kurdistan, le layan rijêmî Iraqî her le dewr û berî salanî 1960 da, gemaroyî aborî le ser û bizûtnewey aborî w komaleyatî le ew perî sistî da ye. Xelkî zehmetkêş bêkar in û çaweruwanî hiwayekî tazen●



AHMEDÊ XANÎ

(1650 - 1707)

Abdurrahman DURRE

Ehmedê Xanî, Pîrê şaîrên (biwêjên) netewî yê Kurda ye. Di nava hemû gelê Kurdistanê de naskirî ye, pirr bi rûmet û qedirbilind e. Li hin cihen Kurdistanê, jê re tê gotin pîrê Xanî, li hinek cihan jî, jê re tê gotin Şêx Ehmedê Xanî, li hinek deran jî, Hezretî Xanî, yan jî, Ehmed efendiyê Xanî, Kurdên ku di bajaran de dijîn û di binê tesîra zimanê Tirkî de mane û pişivîne (asîmîle bûne) jê re gotine Xanî hezretlerî, Xanî baba. Di nav wêjevanan de jî, pîrê wejevanan e ku bi rastî jî, ew nav û nîşan, jê re babet e. Heta ku mirov jê re pîrê pîran, serokê wêjevanan jî, bêje ev hemû li bejna wî ya çeleng û siwarê meydana wêjevaniyê tên.

Bi rastî, Pîrê Xanî, bi helbestên xwe û destana Mem û Zîn a nemir, di nava wêjevanên nemir yê cihanê de, cihekî pirr bilind û jor girtiye.Li qora pêşînê, di meydana wêjeyî de, ew destana wî ya nemir Mem û Zîn hemtayê Romeo-Julieta Sheakspir û Leyla û Mecnun Fizûlî ye. Heta, di pirr babetan de, ji wan bi rûmettir e.

Ehmedê Xanî, di sala 1650 mîladî de, li herêma Hekariyê li gundê xanê ji dayika xwe bûye. Di medresyên Kurdistanê de xwendiye û di demeke kurt de nav û deng daye. Di çarde saliya xwe de dest bi nivîsandinê kiriye û ala wêjeya netewî ya Kurdî hildaye. Ji wêjeya Kurdî re pirr xizmetên mezin û girîng û giranbûha kiriye.

Hozanê mezin, ji bil Memû û Zînê, gelek helbestên hêja û qedirbilind jî, nivîsiye ku di medresên Kurdistanê de heta îro jî, di destê feqî, mela û seydayên Kurdan de, destnivîsên wan yê cûre cûr hene. Di sala 1684'an de bi nave Nûbihara biçûkan, bi şeweyekî riste (menzum) ferhengokeke Kurdî û Erebî nivîsiye. Ev aferîneka (eser) hêja ji çend bend û pîşan (beş) pêktê. Bi awayê qeydên rêzaniya (arûz) helbestan nivîsiye, di serê her bend û beşê de pend û şîretek gotiye. Wek:

Ger tu dixwazî ku bivî namîwer û muteber,
Kizb û xilafê mebêj, ger te bikin kerbiker

Yanê: eger tu dixwazî ku bi rûmet û namîdar bî, divê ku tu caran tu derewan nekî, nerastiyê nebêjî.

Di cihek din de jî, weha dibêje:

Muellîm, bila dil wekî ber bitin,
Divêtin ku şagirtê dîlber bitin

Yanê, dilê seyda (mamosta) çiqas ku wekî kevir hişk be jî, dîsa jî, dixwaze ku şagirt û suxte yên wî, bi kêrhatî, zîrek û xweşik bin. Her weha, di serê her beşan de, di derheqê (derbarê) xwendin, xebat,rastî, zanîn û karên civakî de pend, û nesîhat û şîretên pirr giranbiha gotiye.

Ji bil Nûbiharê jî, bi navê eqîda îmanê (hîmên baweriyê) dîsa bi nezim, aferînek din jî, nivîsiye ku ew herdu jî, di medreseyên Kurdistanê yên destpêkê (ilkokul) de, tên dersdan û xwendin. Berê di medresan de Nûbar û Eqîda îmanê pirtûkên dersên zarokan bûn.

Hezretî Xanî, hem şair hem jî, feylesof û zaniyarekî pirr mezin bûye. Ji aliyek ve pirr rexneyên giran li serok, serdar, mîr, xan, beg û axayên kûrdan kiriye ku çira,bi hevdu re yekbûn û îtîfaqê nekirine û bûne leyîstokê dujmin (Îran û Osmaniyan). Xanî di derbarê mîr û begên Kurdan de weha dibêje: Bi wan di xapn û ji bo wan ceng û şer dikin, Kurdistanê ji bin zulm, kuştin, cerd û talênên wan rizgar nakin. Çara xilasbûnê yekbûn û îtîfaq e.

Ji alîyek din ve jî, pesnê mêrxasî û camêriya wan û gelê kurd kiriye.

Camêrî û hîmmet û sexawet,
Mêranî û xeyret û celadet.

Ev xetme ji bo qebîlê Ekrad.
Wan dane bi şûr û hîmetê dad.

Yanê camêrî, merdîtî, mêrxasî, xîret û jîrîtî, tev ji bo serok û qebilê Kurdan hene. Bi şûr û himmeta xwe, edalet çêkirine.

Ev xîret û ev ulûwwê himmet
bû maniyê hemlê barê minnet

Yanê: Ev xîret û bilindaya himmetê, nehiştiye ku barê minetê hilgirin, wek şêran ji hev bê tirs û bê perva bûne. Kes, ji kesî re serî dananiye.

www.arsivakurdi.org

Lew pêk ve hemîşe bê tifaq in
Daîm bi temerrud û şiqaq in

Yanê serokên Kurdan wek şêran in, daîma bê ittifaq bûne, li pey hev neçûne berbirê (berberî) hev hatine û hev negirtine.

Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêkra bikira me înqiyadek

Tekmîlê dikir me dîn û dewlet
Tehsîlê dikir me ilm û hikmet

Yanê: Eger ku ittifaqa me hebûya, me ji hevdû re serî daniya, dîn û dewleta me dê tev dirist bûna. Emê bibûna xwediyê dewlet û zanînê û em dê şareza bûna.

Xanî, pirr gazin û lomanan, ji bêkesitî û bê xwedîtiyê jî, dike û dibêje:

Ger dê hebûya me jî, xwedanek
Sahib huner û we nuktedanek

Min dê elema kelamê Mewzûn
E'la bikira li banê gerdûn

Yanê: Eger ku xwediyekî me yê zana û hunermend hebûya, min dê ala rist û helbestan (ala wêjeya Kurdî) hilda ser serê çerxa felekê û bilind jî, bikira (çawan ku kiriye jî, canê wî yê pîroz pirr û pirr şa be).

Xanî, di ciheke din de jî, weha dibêje û heyret dike:

Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmancê di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bil cumle, ji bo çi
bûne mehkûm

Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezmê
Rostem

Yanê: Ez di vî hikmeta xwedê de mame, gelo ka, ji bo çi ye? Ku Kurmanc di dinê de, bê dewlet mane. Mehrûm, bindest, jar û bêpar mane. Hal hal e ku (Halbuki) her mîr û xanekî wan, di camêrtiyê de, wekî Hatemê Taî bûne, her mêr û mêrxasekî wan jî, di quwwet û jîrîtiyê de, weke Rostemê Zal in (ku ew jî, Kurd e).

Xanî, çawan ku me li jor jî, got, sebebê (sedemê) bindestiyê di ne îttifaqî û ne hevdu girtina gelê Kurd û serokên Kurdan de dibîne. Çareyê jî, dizane û di şûr de dibîne, yanê di rêzanî û şorişwaniyê de dibîne û weha dibêje:

Her kî bire şûrê destê himmet
Zebtkir ji xwe re bi mêrî dewlet

Yanê: Kî destê xwe biriye şûr, dest avêtiye şer û şoreşê, ewî bi mêraniya xwe, ji xwe re dewlet çêkiriye û payidar bûye. Bi vî awayî em dikarin bêjin: Pîrî Xanî, çawan ku pîrê wêjevanan e, wilo jî, pîrê şoreşvana ye. Çawan ku zaniyar û filozof bû, wisan jî, rêzan, rehber û şoreşger jî, bû.

Di çêkirina destana Mem û Zîn a xwe de, hem pîşeyên wêjeyî (sanat edebiyat) hem jî, fikr û rûhê neteweyî pêkaniye. Çîroka Memê Alan, ji çîroktî û ji efsanetiyê paqij kiriye û helandiye, di qalibê rastî û berçavîtiyê de ro kiriye. Bi wî awayî, ew çîrok, bûye dîrok, ew maden bûye zêr û zîv û durr û gewher, ketiye xezîna wêjeya Kurdî ya netewî. Mirov bi hêsanî dikare bêje, Zîn, Kurdistan e,Memo jî, gelê Kurd şoreşgerê Kurdistanê yê. Beko, dijminê Kurd û Kurdistanê azadiyê, serxwebûn û serfiraziyê ye. Hîle, lep û dolabên ku Beko, li Mem û Zînê hûnane, wekî dek û dolabên ku dijminê Ereb, Ecem, Selçûqî û Osmaniyan li Kurdistanê, bi navê dîn û xîlafet û biratiya dîn hûnane, eynî tişt in. Eynî plan û dafik in. Evîndariya Memo ji Zînê re, evîndariya welatparêzî û şoreşa Kurdistanê ye.

Bi rastî, pîrê Xanî, di vî barê de, neqş û nemûşek pirr bi rûmet û giranbiha ji bo wêje û doza Kurd û Kurdistanê raçandiye û hûnaye.

Gelê Kurd hemu, ji Xanî re dê îlelebed, minnetdar û pesindar bimînin. Eger zana û wêjevanên Kurd, li ser Xanî û aferînekên wî bi cildan pirtûk (kitêb) binivîsin jî, qedr, qîmet, rûmet, nirx û bihayên wî pêk naynin û ji bin barê minnet û xizmeta wî dernayên. (canê wî yê ezîz şabe, timî li ser wî rehma xwedê hebe)

Divê ku Mem û Zîna Xanî, piştî Awesta Zerdeşt pêxember (166 583 bz) pirtûka Kurda ya pîroz be. Her rewşenbîrê Kurd, dive ji gelê Kurd re, durr û gewherên wî pêşkêş bikin.

Tê bîra min ku, di zivistanan de li meclis û civatên Kurda yên şevînî Mem û Zîn dihate xwendin. Civatê, bi dil û can guhên xwe didanê. Belê, sed mixabin, piştê ku medreseyên Kurdistanê rabûn, xwendina Mem û Zînê jî, ji Kurdistanê hêdî hêdî rabû û radibe. Birastî hê jî, dengbêjên Kurda, çîroka Memê Alan û Mem û Zînê dibêjin, belê, gurr û geşîtiya berê nemaye.

Ehmedê Xanî, li medresa Bazîdê (Doğubeyazit) seydatî kiriye. Di sala (1707 m) de li wê wefat kiriye û tirba wî, ziyaretgeha Kurdan e. Gotin dirûst be em dikarin bêjin ku rûgeha Kurdan e, qibla dil û can e.

Seyda mele Seîdê meşhûr (Seîdê Kurdî Bedîuzzeman) jî, ji ruhê Xanî pirr istifade kiriye. Bi mehan li ser gora (tirba) wî bi şev û rojan maye. Di mizgefta (camiya) wî de maye.

Lê sed mixabin, ku Kemalîstên nijadperest hem medresa wî, hem mizgefta wî, hem jî, gora wî xirabe û wêran kirine. Belgeyên dîrokî, kevirên gorê, mizgeft û medresa wî û kela Bazidê, bi hovîtî û barbartî vejandine. Min ji gelek xelkê Bazidê bihîstiye ku kevirê gorê, medresê û mizgefta Xanî yên belgeyî û dîrokî û nivîsarî, kirine ferşê tewla hespên leşkerî (askeri).

Belê serokê şarewaniya(Belediye) Bazidê niha dest pê kiriye ji nû ve çê dikin û taze dikin. Em pirr spas dikin ji wî serokê hêja re ku li kalê me, pîrê me, rehberê me û rêzanê me xwedî derdikeve. Ew karê hanê pirr bi şeref, girîng, mezin û bi rûmet e●

www.arsivakurd.org

ZMAN

F. Huseyn SAĞNIÇ

Sedemkê dewlemendiya zaravayê Kurmanci ji medresêbûn. Dı medresên herêma Kurmancanda sey (Ders) bı zaravayê Kurmanci dıhate dan (dayin). Ani pırtûkên Erebi, bı Erebi dıhate xwendın û bı Kurmanci dıhate wergerandın (Tercume kırın). Heya serwextbûna suxtan, seyda şrovekırın dıdomand. Ev qayde çawan jı bo pırtûkên şeriet, hedis û tefsirê dıhate bıkaranin, wsan jı bo rêzımên, mentıq û istiare ji bıkartanin. Feqiyan bı hevra û bı seydayên xwera bı Kurmanci dıpeyvina (xeber dıdan). Gava feqina metın jı ber dıkırın, bı zaravayê Kurmanci şrovedıkırın û dı serê xweda bı ci dıkırın. Gava feqiyan ji hev an ji jı seydayên xwe pırsekê bıkırına, bı zaravayê Kurmanci dıkırın û bersıv ji bı Kurmanci dıhate dan. Gava feqiyan "not" hıltanin, an ji, jı hevra name dışandın, disa graniya van tevgeran (muamelan) bı zaravayê Kurmancibûn. Hinbûn û hin krın, danıstan gişk bı zaravayê Kurmancibûn. Gundiyan bı seyda û feqiyanra, seyda û feqiyan bı gundiyan û gelra gişk bı zaravayê Kurmanci dıpeyıvina (xeber dıdan). Bı Kurmanci dıponıjin, bı Kurmanci dıhızırin, bı Kurmanci hevok (cümle) çêdıkırın û bı Kurmanci dınıvisina. Bı Kurtasi dı wan medresanda, zmanê resmi bı zaravayê Kurmancibû. Ew medresên bırêzên emekdar, heker hındık ji, mabın û peywıra (wezifa) medresên kevın nebının ji, hê ji dı hnek deveranda mane û bı ewayek nemır neji jina xwe dıdominın. Hêvidarım ku ew medresên diroki, çevkaniyên zaninê, pêşveberê zmanê Kurdi, bjijkên cvata kurdan û emekdarê kevnare jı nûve bêne vejandın û gorê dema me bêne tekûs krın. Bı drûvek welê bêne tekûs krın ku jı beri çetır berhem jı wan bêne standın. An ji ciyên wan yên diroki bêne parastın û dı ciyên wanda hnek sazımanên dın bêne damezırandın û bıkevine bın xızmeta cvatan. Heker ev kar neyên bıkaranin, wê rewşa cvata me bı herıfe.

Hemine ku jı wan medresên piroz, hnek mrovên neqencên xwın mıj ji derketıne. Malê gel xwarıne, emeka gel mêtine, zeviyên wan bı xapandın jı wan standıne. Bı kurtasi jı bo weca (fayda) xwe çı jı destên wan hatıye krıne û hê ji dıkın. Hêvidarım ku jı iro paş gel jı şerê wan nemerdan bêne rızgar krın û carek dın ji yên wlo dernekevın.

Dıvê neyê jı bir krın ku dı her mezrakên (müesesen) cvakida yên qenc ji û yên negenc ji derdıkevın. Hemine ku dı dbıstanên netewida ji gelek mrovên bextreşên wecperest (menfietperest), dıgel mrovên qenc derketıne û hê wê derdkevın ji. Em vê mjarê bıhêlin hêviya demên paşerojve û fetıline lı ser dabaşa xwe.

Hozanên mezın (jı bıl Baba Tahırê lori) pêşi jı zaravayê Kurmancı derketıne û her yek jı wan gorê demên xwe û çarên wan gavan gelek xızmetên mezın ji krıne. Xızmetên wan xweşmêran, ronahi dane wêjeya (edebiyata) me. Ew ji rewşek welê ku hê ji em lı ber wê ronahiyê dımeşin û wê hê gelek ji bımeşin. Ev hozanên mezın yên diroki gişk dı medresanda rabûne û dımedresanda xwendıne û seydati krıne. Eliyê Heriri, Melayê Cziri, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xani û Melayê Bateyi yek jı wan wêjevan (edip) û hozanının ku her yek jı wan gelek afırinek jı mera hıştıne û bûne ser kaniya wêje û hılbestên me. İro em bı wan iftıxar dıkın. Lewma ewan wêjeya Kurdi bı me û bı cihanê dane nasin.

Hılbestevanê hemdem yê sedsala bistan û hozanê netewi û gelêri yê netewe û gelê Kurd Şêxmus Cigerxwinê mezinê pır hêja, ma jı kû derketıye û bı kij zaravayê hılbeste (şiir) û rıste (menzome) sazandıne û nvisandıne? Jı vê yekêra pêgeranek gran naxwaze. Lewra kıfşe. Hemine ku jı medresê derketıye. Cigerxwin lı gelek ciyan geraye, dı gelek medresên Kurdıstanêde xwe bı ci krıye û xwendıye. Paşi çûye Sûryê lı Amodê, dı medresa seydayê mele Ibeydılah û brayê wi seydaê mele Fethılahê Kûlatida xwendına xwe qedandıye. Dema qedana xwendınê, Seydayê mezın mele Ibeydılah wefat krıbû. Jı ber vê yekê Cigerxwin destûrnama xwe, bı teni jı Seydayê mele Fethılah standıye. Cigerxwin, her dem jı van her du zatanra "Seyda" dıgot û jı wanra hurmet dıkır. Heya Cigerxwin dı wesiyeta xweda "Heker ci hebe, gora mın lı bal gora seydayê mın çêkın, heker ci tunebe, dı hewşa xaniyê mında çêkın" gotıbû.

Cigerxwinê pêşverûyê neteweperwer, Hılbeste û rısteyên xwe gişk bızaravayê kurmanci sazandıne. Jı afırinekên Cigerxwin, heya nha heşt diwan hatıne weşandın û jı rısteyan ji du pırtûkên çirokan hatıne çapandn. çigerxwin ne bı teni afırinek bı hılbeste û rıste nvisine. Gelek pırtûk bı metnê rastemend ji pêkanine. Jı ali Cigerxwinve pırtûkek gotınê pêşiya, awa û destûra zmanê Kurdi, du cıld ferheng, du cıld tarixa Kurdıstanê û folklora Kurdi ji hatıye nvisandın û weşandın. Her yek jı van afırinekan bı serê xwe hêjanekê netewine.

Jı bıl hozanan, gelek rastemendnıvis ji Jı Kurmancan rabûne, û bı zaravayê Kurmanci Afırinek nvisandıne. Ew nviskar ji jı medresê derketıne û bı zaravayê Kurmanci pırtûkên hêja nvisine. Hê ji jı wan afırinekna wec têne dıtın û dı Kurdıstanêda xweyi rûmetın ji. Bı zaravayê

Kurmanci û rastemend (nesir) nvisandi "Tesrif a rêzimanê Erebi ya mele Eliyê Teremaxi, Disa rêzımanê Erebi, bı navên "Tesrif, Zırof û Terkib" sê pırtûk yên Mele Yunısê Helqatini, jı wan afırinekanın. Dı zanyariya bjijkida ji,bı zaravayê Kurmanci, afırinek hatıne nvisandın. Dı vê neqebêda "Tıb" a mele Mehemedê Qutıb û "Tıp" a Carinosê hekim têne jmartın. Yên mina van gelek pırtûk û belge bı zaravayê Kurmanci nvisandi hene.

Medrese: Dı herêmên Kurmancanda medresan gelek kar û xebatên qenc krıne û gelê Kurd gelek wec (fayde) jı wan ditıne. Heker medresan, Kurdıstan tam venejandıbe, lê ne hıştıye tam bıpışıve û bımıre ji. Ango jı mrına ebedi flıtandıye û heya nha lı ser pêyan rawestandıye. Hêwidarım ku jı iro paş wê êdi baştır bıbe.

Gava ez ghijtımê, jı dewletê veşarti û bınerd lê lı ser kelbenga xwe rawestayi gelek medrese hebûn û jı cvata mera gelek kar û xızmetên qenc dıkırın. Ez ji medresek jı wanda derketıme. Heker iro dıkarım çar peyvan bınım lı bal hev û bınıvisım, bı saya wan medresane. Bı taybeti jı çar sal xwendına xwe, mın du salên wê, lı navça Tatwanê, gundê Oranısê dı medresa seydayê xwe yê mezınê dlovanê mıhrivanda xwend. Xwezka mın zêdetır lı wır xwendıbûya. Navê wi zatê mezın Osmanbû û jêra seydayê haci mele Osmanê Xorosi dıhate gotın. Mroveki hemêt (takwa), zana, serfıraz, alicenap û neteweperwerbû. Dı serhıldana Şêx Seida ci gırtıbû. Peywıra (wezifa) wi lı navça Blanıxê, bı Xalıdbegê Hesenirabû. Serhıldanê gelek wec jê ditıbû. Carna dabaşa bûyerên serhıldanê jı mınra dıkır û sedemên serneketınê ji şrovedıkır. Wi zatê mezın, bı ewayeki taybeti ez dıgıhandım. Ev mjarên (mewzuên) netewi û gelêri, ez jı wi zati hinbûm û wi zatê mezın kesitiya mın bı mın da nasin. Bı kurtasi, ez xwe deyndarê wi alicenabê dızanım û welêye ji. Jı vê yekêye ku jı malbata wi xweşmêrira, bı taybeti jı seydayê xwe yê duwemin mele Abdussemedra ev qas bırêzkarım û geleke welê ji bıt. Mxabın wi zatê mezınê zana ji mina gelek seyda û melayên me jı bıl hnek ewlad û feqiyên xwe zêdetır tu afırinek lı dû xwe û lı rûberê dne ne hıştıne. Hêvidarım ku kurê wi namıdari "Seydayê mele Abdussemed" bê afırinekên hêja jı dınyayê koç nekıt. Bı vi ewayi hım vê kêmasiyê dêdagırıt û hım ji dê heval û hogirên xwe dılxweş û bextiyar bıke. Vê yekê bıhêlım hêviya dlvoniya seydave û bıfetılım lı ser mjare xwe.

Miriti: Dı zarava û wêjeya Kurmancida bandor (tesir) a miritiyê ji dıxwıyê. Graniya miritiya Kurdıstanê lı herêmên Kurmancan hatıne damezırandın. Nemaze (bılxase) dı dewra Ebasi û Osmaniyanda gelek pêşve çûne. Her çqas dı miritriyanda tevgerên (muamelên) resmi bı zmanê Erebibûn, lê zmanê peyıvin, hevpeyıvin, gotingo (mûzakere), wêjeya (edebiyata) devki û nvisandi û êd, hemi bızaravayê Kurmancibûn. Bı taybeti dı diwanên miranda, her dem dengbêj, çirokbêj, pesqelyar (nûktedan), hozan û êd. dıpeyıdin (peyda dıbûn) û her yek jı wan pişekaran, pişên xwe bı zaravayê Kurmanci bıkartanin. Pişekarên miran bı hevdura û bı pişekarên mirekên dınra dıketın berberi û qoçman. Ewên kar bıkırına û ser bıketana, gorê mercan (şertan) dıhatıne perû krın. Bı vi ewayi zaravayê Kurmanci dewlemend dıbû, xwe nû dıkır û pêşve dıçû. Pışti belavbûna miritiyan ew ciyên çanda Kurdi mane vala. Hêvidarım ku dı ciyên wan mezrakên (muesesen) kevnareda, mezrakên hevdem bêne damezırandın û çawan beşek jı wan, mina "Navenda Çanda Mezopotamya jorin û Enstituya Kurdi" hatıne danin, heker ne tekûs ji bıt, ketıne bın xızmeta gelê Kurd, gelek karê qenc ji dıkın. Dıvê hejmara van pûngalên zaninê bêne pır krın û yên dniti ji bêne tekûs krın ku berhemên tekûs û qenc jı wan bêne standın. Jı pêkanina vê yekêra, destê hevdu gırtın û bı hevra bzıvin dıxwaze.

Zaravayê Kurmanci, bı van sedemên lı jorin hati şrovekırın û hındek sedemên dın ji bı ewayek dewlemend jina xwe heya roja me ajotıye û jı iro paş ji dê jina xwe êdi dewlementır bıdomine. Lewra cwanên Kurd êdi xwe ghandınê. Hêvidarım ku dı demek kurta dbıstanê Kurmanci, seyxane (dersxane), êzgeyê radyoyê, êzgeyê televizyonê û êd dê bêne vekırın û bıkevine bın xızmeta vi gelê dlovanê cefakêş. Heker van nıhmetan ji ez bıbınım mıtlıq jı dınayê çavekıri koç nakım. Ango mın gelek serkevtınên xweşık dı jina xweda ditın. Vanên lı jorin dabaş kri ji bıbinim û yên dın ji bla jı cwanên emekdara bımının.

Zaravayê Kurmanci, bê kêmasi xwedi qaydên (kuralên) rêzımaniye. Ango dı hêmana zaravayê Kurmancida, bê kêmasi teknıka zmên heye û tekûse ji. Ew qaydên jı ali mınve dı "Hêmana Rêzımanê Kurdi" da hati nvisandın, mın hemi jı bınyata zmên derxıstıye. Ew ji mın an jı pırtûkên wan cwanmêrên ku beri hatıbûn nvisandın derxıstıne, an ji bı pêgeranê mın dı bınyata zmênda ditıne û gava rasti qaydek jı wan qaydên drıstên tekûs dıhatım, gelek şah û kêfxweş dıbûm. Her yek jı wan qaydên rêzımên ku mın dıdıtın, mina ditına gencinekê (definekê) zêran ez bextiyar dıkırım. Pzo gencineger derenca vê bextiyariyê dızanın û ew dı temenê xweda an carek rast tên an ji hêç nayên. Lê ezdı her pêgeranên xwe da rast dıhatım.

Devokên zaravayê Kurmanci: Ev zaravayê dewlemendê qaydedar, dı hundırê xweda dıbe sê devok:

1- Devoka Buhti (Boti)
2- Devoka Slivi ango Glivi
3- Devoka Mehmedi

Hındek zana jı "Dvoka Slivi" ra, devoka Glivi dıbêjın. Lê guhertın têda nine (tune). Lewra dı demên kevında, jı eşira Slivanra eşira Glivan

dlhate gotın. Dema "h" ya Buhti bıkeve "u" dıbe "o" û Buhti dıbe Boti. Jı ber vê yekê lı ser vê dabaşa han rawestan naxwaze û ne gringe ji. Çawan hındek mrov dıhızırın, ew qas guhertınên gring lı navber van devokanda ninın. Ez gelek pêgeram. Mın guhertınek gring dı devokên zaravayê Kurmancida ne dit. Heker hınde guhertınên pçûk hebın ji, ne xeme. Lewra dı hemi zmanên dınêda, dı navber du gundanda ji ew qas guhertın dipeyıdın (peyda dıbın). Jı xwe zanayên me ji dı vê ditınêdanın. Bınêrın Ehmedê Xani çı dıbêje:

Buhti û Mehmedi û sılivi
Hın lel û hınek jı zêr û zivi

Çawan her yek jı van gewheran xwedi hêjaneke, welê, devokên zaravayê Kurmanci ji dı ditına "Seydayê mezın Ehmedê xani" da xwedi hêjanek taybetiye û welêye ji.

Nexwe jı devoka Boti zêdetir dıvê em dabaşa herêma Botan bıkın.Herêma Botan çiyaye, asêye û rê, pê bı hêsani vênakeve. Hozan û wêjevanên mezın gelek jê rabûne. Demek drêj ji navendiya Kurdistanê krıye. Gelek mir û xundıkarên leheng (gernas) ji jı herêma Botan rabûne. Jı ber van yekan, peyıvina wê herêmê jı yên dın xwerûtır û qenctır maye. Dma dabaşa devoka Boti dıkım, mebesta (meqseda) mın peyıvina herêma Botane.

Belê dıbêjım ku jı bo yekiti û xwerû krına zaravayê Kurmanci dıvê devoka Boti esas bête pejırandın (qebûl krın). Lê devokên dın ji dıvê neyên jı bir krın û pçûk krın. Hemine ku kêjan peyv, lı kijan herêm û gundi û jı ali kij mrovive hatıbe bıkaranin, dıvê gorê kêşan û pivana zaravayê Kurmanci bête hejandın û lı esasan bêt grê dan. Pzo bı vi ewayi yekiti û tekûsiya zmên tê holê (hmatê). Dı van deravanda zman hewecê alikariya her kesiye. Hêviya pêkanina van karên gring, serkevtına gelê Kurd, rêxıstına mrovani û ditına rojên hê xweştır bıbinın xweş●

REHMEQULÎ

Jêder: Süleyman YILDIRIM
Berhevkar: Turan ÇABUK

Wextekî xortek hebûye, destek kincên nuh lı xwe dike û diçe mala dergistiya xwe. Mala dergistiya wî jî, lı ciheke dûr bûye. Dikeve rê diçe û tê hevrazekî, wê di kaşekî re derbas be. Riya wî kaşê jî, şelandvanan (rêbiran) girtine. Tê ku di wî kaşî re derbas be, şelandvan tê pêşiyê.Dibêje:

-Xwe bişelîne! Kincê xwe ji xwe bike û bide min.

Xort jê re dibêje:

-Heval navê te çi ye?

Rêbir:

-Navê min Mihemmed e.

Xort:

-Tu bide xatirê Mihemmed, tu wê min berdî.

Rêbir lê dinhêre dibêje:

-Evî min bi navê Mihemmed da sondê. Hima bira lêxe here. Wî berdide û xort dikeve riya xwe diçe. Hêj çend gava naçe, rêbir dibêje:

-Îro ew bi navê Mihemmed ez xapandim.

Welleh ez carek din êdî wî bernadim. Carek din lı pey xort dikeve û gazî dike û dibêje:

-Îro xwe bişelîne!

Xort bê çare hêj xwe neşelandiye dibêje:

-Bavo navê bavê te çi ye?

Rêbir:

-Navê bavê min Mistefa ye.

Xort dibêje:

-Tu bidî xatirê navê Mistefa, tu yê min berdî.

Ew cara dinê bi navê Mistefa ez dam sondê, min ew berda. Îcar jî, bi navê Mistefa. Hema ezê berdim, bila here.

Xort wek cara dinê dikeve rê, hê gavek naçe, dîsa ew lı pey wî dike qêrîn:

-Xort dîsa paşve tê, rêbir dibêje :

-Xwe bişelîne!

Xort careke din dibêje:

-Navê kalikê te çi ye?

-Rêbir dibêje:

Rehmequlî ye.

Xort xwe dişelîne...cilê xwe ji xwe dike. Lê mêrik meraq dike dibêje:

Îro te navê tevan ji min pirsî û min da sondê, te kincê xwe ji xwe nekir. Te çima vê carê ji xwe kir? Dibêje:

Qebehet tev ji Rehmequlî bû lewma.



KOLEYÊ BI ZIMAN NE TIŞTEK E

Zülfikar TAK

Roja 25'ê meha Kanûna paşîn, di polîtîkaya TC'ê de, hinek tişt hatin guhertin. Ev guhertin, ji bo çi û çawa çêbûn, divê mirov baş bizanibe. Divê ku mirov ev tiştina baş bibîne: Serbesthiştina zimanê Kurdî, ne bi kêfî ye; ne îşareta avakirina demokrasiyê û ne gavavêtin e ji bo mafên mirovan û ne jî, pirr hezkirina Kurmancî ye.

Îro, ji bo ku mirov vê bûyerê baş bibîne, divê ku şerê azadiya gel û dîroka şerê wê, baş bizanibe.

Di avakirina TC'ê de, polîtîka herî mezin, înkarkirina Kurd û Kurmancî bû. Ji ber vê yekê, ji bo ku dewlet bigihêje armanca xwe, çi hewce bû kirin. Dîroka TC'ê, vana pirr baş nîşan dide: Bi dibistanên xwe, bi dadgehên xwe, bi weşanên xwe û bi radyo û televizyonên xwe, êrîşê şexsiyeta Kurda kirin. Ji bo domandina hebûna xwe û ji bo çêkirina "Yekîtiya Netewî" li ser erdê Kurda, welatê me, di bin sonda mîllî de, ji xwe re kirine ciyê belavbûna netewî. Bi zora çekdarî û bi polîtîka partiyên xwe û bi alîkariya Kurdên xayîn, van armancên xwe gav bi gav pêşve birin.

Di destpêka avakirina TC'ê de, hinek serhildanên êlî çêbûn. Ev serhildanên han, di bin hêzên arteşa TC'ê de zû hatin pelçiqandin.

Piştî serhildana Seyîd Riza, ji bo mafên netewî hin serhildan çêbûn. Piştî van serhildanan, hin kom û komik derketin holê. Digotin zimanê me serbest bihêlin, bila hebûna me ya maddî û manevî ji we re be. Ev kesên han hîna xwe ji siyaset û ramana TC'ê xilas nekiribûn. Wek bêjin, em bi koletiyê razî ne. Azadî ne hewce ye. Zimanê me bidin me, bila welat ji we re be.

Di salên 70'an de, hinek tov hatin reşabdin li ser axa welatê me. Niha ev tov, gelek baş şîn bûye. Gelê me li doza xwe xwedî derdikeve. Îro, hem dijmin û hem jî, dostên gelê me, gava ku polîtîkaya xwe çêdikin, hewce ye ku, şerê gelê me yê azadiyê bihesibînin.

TC bi polîtîka rejîma 12 Îlonê, dixwest ku şerê gelê me yê azadiyê, ji holê rake. Ji bo vê armancê, rejîma faşîst, li welatê me, tiştên ku bi gelê me kirine, dîroka mirovatiyê heya îro nedîtiye. Mexsed û mirazê wan ev tovê ku di welatê me de şax daye, bipelçiqîne. Kurdî, Kurmancî û ruhê welatparêziyê di ramana Kurdan de tune bike. Berê 12ê Îlonê, şerê şoreşgerî û ronahiya welatparêzî weke pêla behrê, weke tîrêjên roja havînê, gelê me diqewirand. Êdî gelê me, ne tenê doza mafên xwe yên mirovahî, mafê bikaranîna zimanê xwe û pêşvebirina çanda xwe dikir. Di bin serokatiya şerê azadî de, doza xwe dajot. Doz, doza azadiyê bû.

Ji sala 1984'an û vir de, pêşveçûna şerê azadiyê, armanca TC'ê di zikê TC'ê de hişt.

Ji ber vê yekê TC, ji bo ku bikaribe şerê serxwebûn û azadiyê bifetisîne, siyaseteke nû daniye ber xwe. Ji bo girtiyên siyasî, qanûna xayintiyê û poşmaniyê derxist, dezgeha cerdevanî ava kirin û milisên cahş derxistin pêşiya şerê azadiyê. Bi sedan gund û çend bajar bi zora çekdarî vala kirin. Di polîtîka van a nû de, serbesthiştina zimanê Kurmancî jî, hebû. Berî serhildana Newrozê ya di bin serokatiya Botanê de, li Kurdistanê geriyan, TC'ê dixwest ku bi nermî derba xwe ya mezin li newqa gelê me bixe. Lê belê serhildana gelê me, hesabên TC'ê xira kir. Ji bo ku statukoya Rojhilata Navîn wek xwe bimîne, dewletên emperyalîst li ser TC'ê sekinîn. Ku di Newrozê de, li Botanê serhildan çêbûn; TC'ê jî, got, em serbesthiştina zimanê Kurdî, hinkî bi derengî bixînin. Di dewsa qanûnê de "kararname" derxistin. Li ser weşanan sansor, zêde kirin, gund û bajaran vala kirin, koçbirkirin, îşkence û bi komî girtin, hin kurtir kirin. Ji bo ku derba wan a mezin bi cih be, newqa gelê me nerm kirin. Lê belê, şerê azadiyê, li hemû derê welat belav bû. "Kararname"ya wan, tu fêde nekir. TC, ji bo ku emrê xwe dirêj bike, mecbûr bû ku vê gava serbesthiştina zimên bavêje. Niha TC li welatê me, bi zora hêzê çekdarî li ser piya ye. Ji bilî cahş û xayinan, tu kes, bi kêfxweşî gotinên wan naynin şunê, guh nadin wan. Wek hatiye gotin, "li ser sungiyê nayê rûniştin". Îro TC li ser sungiyê rûniştiye. TC, ji bo ku gelê me bikşîne ba xwe û tîna şerê azadiyê li ser gel sist bike, dibêje zimanê Kurdî serbest e.

Ma zimanê me îro serbest e? Di sala 1987'an de, li zindana Amedê, girtiyên siyasî ku ketibûn rojiya birçîbûnê, digotin emê bi zimanê xwe biştexilin. Piştî wî, di Adara 1987'an de qerar girtin ku êdî, di dadgehê de bi Kurdî bipeyivin.

Îro bi tenê zimanê me qedexe nîne, jiyana me jî, qedexe ye. Koleyê bi ziman ne tiştek e, lê belê mirov ku azad bibe, dikare zimanê xwe jî, azad bike. Dema ku mirov kole be, nikare zimanê xwe azad bike. Divê mirov pêşîn, ji bo azadiya gel, paşê ji bo azadiya ziman dengê xwe bilind bike.

Ji bo azadiya gel û ziman, divê mirov li xwîna şehîdan xwedî derkeve û ala ku şehîdan hilda bû, wê bilindtir bike. Zimanê me tevî mejiyê me, divê ji bo azadî û serxwebûna gelê me bişixule●

www.arsivakurd.org

KÜLTÜR SANAT VE EDEBİYATIMIZDA ÜRETİM KİŞİLİKLE DEĞERLENDİRİLİR

Medeni AYHAN

Topluma hakim her ideoloji, kendi yansıması olan kültür-sanat ve edebiyatı yaratır. Her dönemin yeni ideolojisiyle yaratılan sanat ve edebiyat, bir önceki dönemin sanat ve edebiyatını özümsemekle güzel yönlerini alıp diğer kısımlarını atmakla vücut buluyor.

Feodal toplumun aşk, doğa, yiğitlik, mertlik ve namus gibi kavramları sık sık işleyen sanat ve edebiyatı toplumdaki şeyh, ağa, bey, sultan gibi elite yöneliktir. Bu elite daha çok methiyeler dizen bu edebiyat ve sanatın, zaman zaman fıkra gibi çeşitli anlatımsal yollarla müstehcenliğe kaçtığı da görülmüştür. Hatta elit sınıfı azalan bir feodal toplumda müstehcenliğin türkülere şarkılara kadar yansıdığını görmek mümkün. Bunun temel nedeni de çarpık yansıtılan burjuva sömürgeci kültürü ve toplumu kişiliksizleştirmesidir.

Feodal dönemin sanatçı ve edebiyatçısı dizdiği methiyeler ve övgüler karşılığında dönem dönem bağışlarla ödüllendirilmiştir. Feodal dönemin sanatçı ve edebiyatçısında kariyerist ve popülarist yönelimler belirgin görülmekle beraber şeyh, ağa, bey, sultan gibi kesimlere yönelik sanatsal ve edebi faaliyetler, halkı kendinden soyutlamıştır.

Halk bir tepkisellikle olsa da, bu dönem sanatçısını bir tür şarlatan, maskara veya ukala kişilikler olarak algılamıştır. Halkın sanatsal ve edebi çalışmalara bu tür nedenlerle hor gördüğü bile görülmüştür.

Ulusal tarihimize baktığımız zaman sanatsal ve edebi çalışmalarla ilgilenenlerin çok az olduğunu görüyoruz. Bunun bir nedeni de hor görme olayıdır.

Yine bu olayı en güzel kanıtlayacak olan, yaşayan bir gerçek olarak Mıtırpların durumuna da kısaca bir göz atalım. Toplumumuzda genelde göçebe olarak yaşayan bu kişilikler ülkemizde en fazla sanat ve edebiyatla temas kurmuş kişiliklerdir. Gerek müstehcenliğe açık fıkralar, gerekse rübap eşliğinde söylenen yarı müstehcen cinsel vurgular, dilenmeler ve de belli bir kesime methiyeler dizmeler bu kesimin hor görülmesine neden olmuştur. Toplumun utanmaz, şarlatan, ukala ve maskara kişilikleri olarak değerlendirilmeye alınmışlar. Ama bu kesimin tarihimizde bir dönemin sanatçısı ve edebiyatçısı olduğu da bir gerçektir.

Mıtırplar toplumsal değerlerin altında görülmeleri, hatta bugün bile hor görülmeleri tarihsel bir gerçektir.

Ülkemizde feodal üretim ve ilişkilerin en yoğun biçimde yaşandığı dönemlerde Avrupa da, feodalizm alaşağı edilmiş, yeni bir sınıfın temsilcileri ve bu sınıfın ideolojisinin yansıması olan sanat ve edebiyatın üretilmesi söz konusu oluyordu. Tabi ki, bu yeni ideolojinin yansıması olan sanatçı ve edebiyatçı kişiliğini de beraberinde getiriyordu. Burjuva çağına giren Avrupa'yı değerlendirmeye aldığımızda, kent soylu edebiyatçı ve sanatçının yoğunlaşmaya başladığını göreceğiz. Yoğun bir şekilde sanat ve edebiyatın, boğazı şişmiş bir sınıfa hizmet etmeye başladığını göreceğiz.

Güzel romantik geceler, içkili partiler, yemekler, muhteşem saraylar, psikolojik durumlar ve saray çevresinde olup bitenler sanatsal ve edebi çalışmaların ana temaları haline gelmiştir.

Yoğun bir şekilde de, "sanat sanat içindir" anlayışına kaçmaya başlayan bu sanat ve edebiyatta romantizm, sembolizm, sürrealizm, natüralizm ve bu dönemin en gelişmiş uzantısı olan fütürizm gibi bir çok akımın geliştiğini görüyoruz.

Sembolizm adına şiirde bulmacalar yazılıp çizilmeye başlanmış. Resimde iki parmağın ucuna iki göz çizilerek resim diye sunulmuştur.

Yine romantik ele alışlarla iyi kötü, güzle çirkin, zengin fakir ayrımı yapılmaya başlanmıştır. Feodal sanat ve edebiyata karşı burjuva sanat ve edebiyatının ilerici yanını oluşturan bu ayırımlarda, çözüm yolları verilmemiştir. Sadece yüzeysel bazı değinmeler söz konusu olmuştur. Toplumsal çelişkileri derinlemesine ortaya koyma, bu çelişkilerin çözümü için halkı değiştirme ve dönüştürrne işlevi gören sanat ve edebiyattan gittikçe uzaklaşmışlardır.

Zaman zaman içe dönüklük veya kaba bir dışa vuruculuğa yönelmelerde olmuştur. Sanayinin gelişmesinin bir yansıması olan, hatta burjuvazinin en uç tırmanma döneminde vücut bulmaya başlayan fütürizm çelişkilerini bulan sosyalist dev-

rim teorisiyle yoğrulmadığı zaman karton kutu, çöp ve makine gürültüsünden öteye gidememiştir. Bu akımı benimseyen aydınla, sosyalist ideolojiden etkilendikleri yerlerde olumlu denilebilecek ürünler vermişlerdir. Örneğin Sovyetler Birliği'nde Mayakovski gibi bir çok yetenek söz konusudur. Faşist İtalya'da ise fütüristler daha çok faşizme bel bağlamışlardır. Fütürizmi bir geçim akımı olarak görmek mümkündür.

Bu dönemin sanatçı ve edebiyatçı kişilikleri de sermayenin etkisiyle ücretli işçi durumuna gelmişlerdir. Feodal topluma göre, bu dönemde sanatçı ve edebiyatçılara belirgin bir ilgi söz konusudur. Burjuva çağında sanatçı ve edebiyatçılar düzenle birleştikçe ve düzenin ideolojisine aykırı düşmedikçe maddi yönü sermaye olan, manevi yönü ise popülarizm ve kariyerizm olan kazanımlar elde etmeye başlamışlardır. Bu nedenle sermaye düşkünü, populârist, kariyerist ve bireysel anarşist kişiliklerin gelişmesinin önü açılmıştır. Burjuva ideolojisinin belirlediği aydın, belli bir yerden sonra toplumdaki konumunu ve toplumsal çelişkileri görmekle beraber buna uygun düşecek sanatsal ve edebi çalışmasından uzaklaşmaya başlamıştır.

Bireysel küçük burjuva, anarşist, populârist, kariyerist tutumlar olsun, düzenin cezalandırıcı etkisi olsun bu dönemin aydın kişiliğini dalkavuk haline sokmuştur. Burjuva ideolojisinin ilerici konumunu yitirmesiyle yansıması olan sanat ve edebiyatta gereksinimlere cevap vermekten uzak düşmüştür. Dolayısıyla burjuva kültürünün bilinçli veya bilinçsiz (bugünkü anlamda kendini tarafsız ilan eden ama burjuva kültürüne katkı yapanlar) mimarların kişilikleri kültürel çalışmalarından daha ileri olmadığından halkla bütünleşememiştir.

Tarihsel bir gerçeklik olarak burjuva ideolojisi, yerini en ilerici sınıfın ideolojisi olan sosyalizme ve kültürüne bırakmakla yüz yüze kaldı. Diyalektiksel bir sonuç olarak devrimci sanat ve edebiyat anlayışı, devrimci aydın kişiliği de beraberinde getirmiştir.

Burjuva edebiyatı ve sanatının aksine toplumsal çelişkileri alabildikçe işleyen, bu yolla da halkı değiştirme ve dönüştürme amaçlı eserler verilmeye başlanılmıştır. Halkın çıkarını burjuvaziye ve sömürgecilere karşı savunan taraflı anlayışın gelişmesiyle bilinçli üretime yönelip baskıları göğüsleyen gerçekçi, fedakar, yiğit, kolektif ve kendi duvarlarını yıkmış kişilikler ortaya çıkarmaya başlamıştır. Burada aydın, tüm çaba ve amacını devrime ve insanlığa tahsis ederken sanat ve edebiyatı devrimci mücadelenin bir dişlisi haline getirmiştir.

Bu tarihsel gerçeği toplumsal gerçekliğimizle bağ kurarak açıklamaya çalışırsak daha aydınlatıcı olacaktır.

Dili yasaklanan, kültürü asimile edilmeye maruz bırakılan bir halkın edebiyatı ve sanatı kendi diliyle üretime dökmedikçe, gelişmesi söz konusu olamaz. Özgürlükçü, bağımsızlıkçı devrimci aydın kişiliğin ortaya çıkması da çok zor olur, Devrimci sanatçı ve edebiyatçı kişiliklerin ortaya çıkmasının ön koşulu; toplumsal çelişkileri işleyen, halkın çıkarını savunan, toplumsal geliştirme ve dönüştürme işlevine sahip eserler yaratmaktır. Bu başarıldığı zaman burjuvazinin nasırına aydınlar aracılığıyla basılmış olacaktır. Sanat ve edebiyat devrimci mücadelenin bir unsuru olunca, etkin, çok yönlü, korkusuz, kolektif, fedakar aydın kişilik tiplemesi de daha belirgin bir biçimde gelişecektir.

Sanatsal ve edebi çalışmalar kadar aydının devrimciliği de önemlidir. Ülkemiz gibi devrimsel süreçlerden geçen yerlerde sanat ve edebiyat sorunu devrimci savaşım sorunudur. Bu sorunun biricik ilacı da militan özellikler taşıyan devrimci aydın kişiliktir. Sanatsal ve edebi çalışmalar kişilikten soyutlanarak değerlendirilemez●

ELÎ

Turan ÇABUK

Elî rabe wiha nabe
Bi hîl û pîle çê nabe
Emir borî mirin wiha be
Çima tedbîrekî nakî

Êdî emrê te çil sal e
Te ne milk û ne pertal e
Xwelî li serê te qebir mal e
Çika kengê tê xwe xelaskî

Ev e tedbîrek ji tobê
Bi nevsara bike herbê
Ji destê te heta hew bê
Çika kengê tê xwe xelaskî

Tu ka rabe tu bes razê
Xupik bîne gelek tasê
Li pişt te kaş e hevraz e
Tu ranabî lezê nakî

Mirada me ji xewê ey can
Çawa gotî Feqiyê Teyran
"Ew e her xefletên qelban
Ne got zahir tu menakî"

Tu zanî ku tu rê durî
Gelo ma qey tu wê korî
Herçî hatin ji te borîn
Tu ranabî lezê nakî

Ew e tedbîrekî ji tobê
Bi nefsa ra bike herbê
Ji destê te heta hew bê
Çika kengê tu xwe xelaskî

Eger dinya bi timî be
bibit milkê te bê hîle
Ji xeyrê caw eger şîle
Ji wî milkê xelas nakî

Bike mîsal di eqlê da
Wekî xana devê rê da
Tu rêbarî biçî tê da

Sibê rabe tu jê barke
Meke xane, ewî xanê
Binhêre li çerxa dewranê
Mihemmed Mistefa kanê

www.arsivekurdi.org

BANG!

XAMEVAN

Diçim Beyazîd
Ser gora Xanî

Ez dikim hawar
Ez dikim qêrîn

Ehmedo rabe
Mamostayê min

Destana nûjen
Êdî binivsîn

Carek binêre
Serhed û Dêrsim

Carek binêre
Mûş û Şerefdîn

Leşkerên dijmin
Nema diçin pêş

Şoreşgerên me
Rê li wana birrîn

Balafirên wan
Nema diçin jor

Va me yek bi yek
Êdî hilweşin

Diçim Cizîrê
Cizîra jêrîn

Ser gora Şêxmûs
Kalê dilbirîn

Şêxmûso rabe
Mamostayê min

"Sewra azadî"
Car din binivsîn

Can polatî me
Hatime ba te

Hêrzan dixwazim
Seyda Cegerxwîn!

Carek binêre
Botan û xerzan

Carek binêre
Amed û mêrdîn

Nifşên me Kurdan
bûne qehreman

Çiqas serhildan
Li wir afirîn

Nema ditirsin
Ji kurên Tirko

Kurdno aferîn
Kurdno aferîn

DU QEHREMAN

Du lewend hebûn
Dilê wan bi vîn

Hîma HUNERKOM
Ji bo me danîn

Hên tê guhê me
Banga Sefqanî

Hên tê guhê me
Awaza Mizgîn

Mêvanên me bûn
Çend salên berê

Her dem li kar bûn
Ji bo raperîn

Rojek li Parîs
Rojek li Berlîn

Pirr roj û pirr dem
Wisa diborîn

-I-

Piştî pirr xebat
Sefqan çû welat

Li serê çiyan
Dikir têkoşîn

Rojek li zozan
Deh li germiyan

Êriş û halan
Ji xwe vebirîn

Rojek wisa hat
Bûbû bobelat

Çi tê serê wan
Wan pê nizanîn

Heyşt heval gernas
Şervan û mêrxas

Ji serê çiyan
Ber jêr diweşîn

Ji hêla bakur
Ew diçûn başur

Silavê bidim
Axa Hindirîn

www.arsivakurdi.org

Rastî hîn bûn
Digotin Kurd'in

Lê ew derketin
Kurdên derewîn

Peyayên Zehak
Dijmimên Kawa

Kurdên ne durist
Dilê wan bi kîn

Xortên me Kurdan
Pala xwe dan wan

Berdane xortan
Berikên xayîn

Heyşt Kurdên leheng
Bi nav û bi deng

Ji bo zehakan
Kirin firavîn

Heyşt xortên ciwan
Şehîdên welat

Ji bo Kurdîstan
Ew dibûn mizgîn

-II-

Keça dilşewat
Daket nav civat

Destpêkir xebat
Xebeta zêrîn

Di vê biharê
Daket kenarê

Yanzdê gulanê
Rojek pirr bi tîn

Şêra me Kurdan
Silav da Tetwan

Tevî hevalan
Dikir têkoşîn

Şerekî giran
Derket li meydan

Kozikên neyar
Li hev xurcilîn

Mizgîna leheng
Mizgîna çeleng

Xwedî nav û deng
Gurbeta Aydîn

Gule davêtin
Pêsîra dijmin

Kumên faşîstan
Ber jor difirîn

Tetwana bedew
Tetwan'a ciwan

Goşe û kolan
Sor dibûn xwîn

Saet dibû çar
Heval man neçar

Ji ber bêgavî
Şûnde vekişîn

Şêra me Kurdan
Maye li meydan

Dora wê girtin
Şêra bi birîn

Destê lehengê
Li ser tivingê

Ji bo xwe hiştî
Berika dawîn

Bi dengê çiyan
Avêt silogan

Bijî serhildan

Bijî raperîn

Bijî ARGK
Bijî PKK

Bijî Kurdistan
Bijî têkoşîn

Bi vi awayî
Xatir ji me xwest

Bala hilkişî
Giyanê şêrîn

Dijminê xwînxwar
Noker û gemar

Bi vê bûyerê
Kirin şêt û dîlan

Tirkê har û hov
Ma tu nizanî

Keça Mediyan
Horî ye, perwîn

Ew serfiraz û
Ronakrewan

Nakeve pença
Gurê dev bi xwîn

Pêre hezar însan
Li wê bûn xwedan

Kulîlk û sorgul
Li ser wê danîn

Tu diya min bî
Hevala Mizgîn

Ez bi qurbana
Porê te'y şevîn

Şêra me Kurdan
Maye li meydan

Dora wê girtin
Şêra bi birîn ●

www.arsivakurdi.org



Dizdê Sewlo

Yew dizd hergû roc sewlonê cematî comî ra tiraweno.

Rocê cemat vono:

–Inhewa nêbeno, ma xwi ri yew mêrdimî veynî, wa sewlondê ma heti newbeti bigêro û ma têmîyon di heqê yê bidÎ.

Bi inhewa cematî ra yew newbetey sewlo gêno.

Pawitoxê sewlo şono keye, cenêrdey xwi ra vono:

–Mi xwi rî yew gure diyo. Ez eyrû ra pey comî di sewlonê cematî paweno.

Wexto ki azonê sibhey woneno, cenekî dekwena mêrdedê xwi û vona:

–Wardi, wardi mêrdek, mela veyndono, şo comî!

Mêrdek ra veng nêvecêno. Cenêki hewna dekwena bide. Mêrdek vono:

–Cenêkî, mi bigeyri, ez xwi rî rawkeno. Dizdê sewlo ez o û ezî ha keye di yo. Kom şono sewlo tiraweno?

Ho To Rî Terez!

Xal Zibeydê Bekirî[1] dikonçî bî. Dikê dikondê vê veng û varit bî. Xal Zibeydî, çend qalibî sabun, yew telîsey şekerî, di qutiyandê piskîvtî var di hetonî yerey veneki kardinî.

Dikonçey Xal Bekirî weşbê cenêrdey yê nêşona rocê vona:

–Inkey in çi heway to wo! Şar serrî-di serrî di dikonçey keno, beno lort. Ti indeyî serrî yo wayirê dikonî yî, lablê halê ma hezey boçdey herî yo; ne darg beno û ne zî kirr.

Qalê cenêrdey yê zaf bide gunenî û hêrs beno, vono:

–Qey ti vona in gure rehet o? Hema bê herundey mi di roj! Ho to rî terezi û ho to rî tenkey helba. Kiloy helba ponc poxnotî yo û ez muşterî yo. De bisenci ma veynî 150 gr. helba û vaci ma veynî heqê mi çend keno?!

(1) Zibeydê Bekirî: Yew Pîranij o. Key ureyan ra bi û mehla Yareliyon di roniştinî.

Şo

Rocê Mela Welî [1] nimacdê yerî ra vecêno yeno teber; teber a dijni varena. Ay aşmon di Pîron di yew nêmardo, ay semed ra Mela Welî biney bê keyf o. Şowo ki ser o meyîto(n) şuwenî teber a dijni var di beno. Cematî ra yew vono:

–Mela, Mela, qey şima inê şoy dijni ver a hewe nênonî, inhewa ku şo dijni var di biheremiyo!

Mela Welî serey xwi beno û ono, ningey xwi dekweno şo û vono:

–Warza, warza ez şoyê onasarên pey se ko? Haca ki wezîfey xwi nêka xwi ra haci niya! În şo zî wezîfey xwi nêkeno. Ez bero zere tira vaco se! Hema se beno wa bibo!

(1): Mela Welî, tira vanî Welî Hesdê Îbîşî. Hetanî nê serandê peyenan Pîran di melayey kerdin. Çend serrî ra ver şîyo rehmet.

Awdayişê Dewaro

Xal Ehmedê Çepoy [1] eylondê xwi ra vono:

–Lila hele wardê inê dewaro berê, awdê!

Lablê gedondê vê ra veng nêvecêno. Yewna, diyna hewî vono, qet yew nêvono ti kê rî vonî.

Xal Ehmed vono:

–Ez şima rîyew qali vaco, ma ra kom verê vengê xwi biko, gonî ay dewaro bero awdo.

Gedey yê vonî:

–Wa bû.

Ay beyntar di çend deqey şonî-nêşonî, Xal Ehmed ewnêno, yew berî var di veynda:

–Xal Ehme, lila Xal Ehme!...

Xal Ehmed mecbur moneno wardeno şono berîn ra ewnêno, ki Zilf Eyib Axay [2] o.

Xal Ehmed vono:

–Ha, ha Zilfî axa, çî yo ti vonî se? Çi Xal Ehmedey to boya vaci. Xal Ehme dewaro bigiri ber awdi!

(1): Ehmedê Çepoy, yew Pîranij o û rewna dînay xwi bedelnaya.

(2): Zilfî Eyib Axay, Pîran ra key Îsmaîl Axay ra bi û rewna dînay xwi bedelnaya.

Lac û Pî

Lac hêşdê pî nêkuweno û pî timi lacdê xwi ra vono: –Lacêm ti çirray mêrdim nêbenî?..

Wexto ki lacek hinî tikê pîl beno serey xwi gêno, rageyreno.

Lacek şono yew şariston di wûneno. Wûneno beno walî. Walî rocê

www.arsivakurdi.org

veyndey di cendirmo dono, vono:

–Şêrê filon ca di yew mêrdimo onasarên esto, kelemçey kê û mi rî biyarê!

Cendirmey şonî pêrê walî kelemçey kenî, xwi var şonenî û onî huzirdê walî.

Walî pêrdê xwi parseno vono:

–To vir yeno, to timi mi ra vatinî, "ti mêrdim nêbenî". Bew, ez şiyo mi wend û ez bîyo walî.

Pî vano:

–E, lacê'm, raşt a, ti bî walî, lablê ti hema ra zî nêbî mêrdim. Eki ti mêrdim bibînî, to ez cendirme reyra indeyî ca bi kelemço nêardinî huzirdê xwi.

Ma Şonî Ça?

Vatişo gore, wextê pêxemberon di, milletê dîna pêrû yanî pêser û şonî Hz. Mihemedî heti. Hz. Mihemed cay yînî beylu keno û yînî erşaweno welatondê yînî. (1)

Inhew çaxo ki pîylê milleton şonî huzirdê Pêxemberî, derî qomet onî, lew destê yê ra donî, riyê xwi fistondê yê sawen û peypekî şonî cadê xwi û parsenî, vonî:

–Qirbon cay ma kora wo, ma se ra şonî?

Pêxember zî der cay yînî vono û yê şonî. Yew bi yew cay xwi bonder benî şoni. Dori yena pîldê ma. Pîlê ma şono zere û durî ra veyndono û vono:

–Ap Meheme merheba, ma şonî ça?

Pêxember şaş moneno ewnêno pîldê ma ra vono:

–Şima şonî "çîya çîya (2)"!...

(1): Mi na mesela 1974 di Pasûr (Kulp) eşnawitibî û hewawo ki mi virî menda mi nuşta.

(2): Çîya: Ko

Mi nê materyalê folklorîk dormaredê Pîran ra arê kerdî. Pîran yew qezaya Diyarbekir a û Dewleta Tirkan namey ca kerdo Dîcle●

Nanê Pepuke

Şafak DERSÎMÎ

Di wexta birçîtiyê de, ku zaroyên xelkê ji bo xwarinê nan peyda nedikirin, bab û bira tev di şerê cihanê û di bin zordestiya Tirkan de hatibûn qirkirin, enbar talan bûbûn, zaro bê dê û bê bav mabûn û li yewanê (deştê) giya berhev dikirin, du zarowên sêwî hebûn.

Yek ji wan qîz, yek jî, lawik bû. Ev her du zaro, tûrîkê xwe girtin û çûne yaziyê (zozan), ku ji xwe re hinek giya bicivînin û bînin. Zaroyin, çûn, çûn û çûn. Qîzik ji birayê xwe re got: Were ez bi piyekî (aliyekî) ve û tu jî, bi aliyekî ve herin, paşê jî, li vira em bigihêjin hev.

Lawik, dengê xwe nekir. Her yek ji wan, bi piyekî ve çûn. Qîzik gellek giya berhev kir, pirr dûr çûbû, lê dîsa vegeriya cihê xwe.

Lawik jî, gellek dûr ketibû, çûbû nêv sincan (dirik). Di nêv sincan de tûrîk li qîtê ket û kûn bû. Lê belê haya lawik ji tûrê wî tûnebû. Bi dilekî xweş giya top dikir û dixist nêv tûrê xwe. Ew ji aliyekî ve giya dixist tûr, ji aliyê din ve jî, ji tûr giya diket. Pişti şiwake (demeke) dirêj, lawik vegeriya hat cem xanga xwe.

Xanga wî dît ku tûrik tal (vala) e. Ji birayê xwe pirs kir:

-Kanê giyayê te?

Lawik qeydê (mêze) tûrê xwe kir ku tê de tawa (çi tişt) tune.Lawik dest bi girînê kir. Xanga wî lê zivirî û got:

-Nexwe gihayên ku min top kir, te ew xwarin. Lawik got:

-Ne welle min ew nexwar.

Qîzik jê bawer nekir û got:

- Na, te ew xwariye.

Lawik kêrê girte destê xwe.

-Madem ku tu ji min bawer nakî, were ûrê min biqelişîne û lê mêze bike. Qîzik ûrê wî qelaşt û lê mêze kir ku tê de tu tişt tune. Ax û wax kir û li xwe xist, lê êdî bê fêde bû. Lawik mir, Qîzik jî, bû çûk derkete serê darê û dest bi xwendina pepo û keko kir. Ji wê rojê ve, navê wî gihayê bû "nanê pepukê."

Padişah û Wezîr

Berhevkar: Turan ÇABUK

Wextek du paşe hebûne. Paşeyek jê, yên mirovan bûye, yê din jî, paşeyê teyran bûye. Paşayê mirovan dike ku tabendekê (dek û dolab) li serê paşeyê teyran bigerîne.

Paşeyê teyran jî, du heb wezîrên wî hebûne. Navê yekî Bazî, navê yê din jî, Terlan bûye. Paşayê teyran her dawiya hefteyê her du wezîrên xwe hildide diçe ser kaniyê. Li ser kaniyê jî, darek hebûye, xwe didine serê darê û temaşe dikin.

Padîşahê din jî, diçe ser kaniyê, beranekî kol dibe û şerjê dike, jehrê lê dike, di şîşê re dike û dide ser agirê sor ku paşayê teyran were evî goştî bixwe û bikeve destê wî.

Dîsa dawiya hefteyek, paşayê teyran bi her du wezîrên xwe ve tên ser kaniyê. Dinhêre ku beranek di şîşê re kirine û li ser êgir sor dikin. Ji wezîrên xwe re dibêje: –Ezê evî goştê hanê bixwim, wezîr jî dibêjin: –Paşayê me nexwe. Paşa bi gotina wezîrên xwe dike, naxwe û lê dixin diçin. Diçin malê, lê ew goşt tê bîra paşe û dibêje:

–Wana nehişt ez wî goştê rind bixwim. Li wana tê xezebê û ji wezîrtiya xwe davêje. Di dewsa wana de kundê kor û qijika belek dike wezîr.

Dawiya heftê tê û diçine ser wê kaniyê û li serê darê datînin. Dinhêrin dîsa bi wê tehrê beran li wir petiye, paşe ji wezîrên xwe re dibêje: –Ez vî goştê hanê bixwim ? Dibêjin: –Paşe xweş be, tu çi sekinî yî, de bixwe. Paşe jî, bi ya wan dike ewî goştê dixwe, paşê gêj dibe û dikeve. Leşkerên paşayê mirovan tên derhal paşayê teyran digirin û dibin hizûra paşayê xwe. Paşe, jê re dibêje: –Ya paşa, te digot ez paşekî zehf zana me, ez heft tebeqeyên binê erdê dibînim. Paşayê teyran dibêje:

Dema wezîrên min Bazî û Tarlan bûn
Wê çaxê ez mor û terman bûm lê niha
Wezîrên min kunda kor û qijika belek
Dinya li serê min bû çerx û felek.

Zimanê Dilê Me Kilamên Me

Neviyê KALO

Feylesof û nivîskarê Ingilîz SHAKESPEARE dibêje: "...ewên ku mûzîka xweqekî çêdikin, ji zagonçêkerên wan (kanun koyucu) bi hêztir in..."

Ev gotin zef bi cih e. Ji ber ku, mûzîk serdê gel, daxwaziya gel, jiyana gel û hwd. tîne zimên. Di şiyarbûn û pêşveçûna gelan de mûzîk, rolekî girîng dilîze. Çend stran, merş û kilam, di tevgerên rizgarbûna gelên bindest de bûne wek sembol.

Mînak: Venseremos (serfirazkin), Çav Bella, Strana Lîlî Marleen û hwd. Ji berê ve heya niha, di têkoşîna gelê Kurd de jî çend stran, merş û kilam bûne sembol.

Mînak: Ey Reqîb, Herne Pêş, Muxtaro, Çiyayê Bagokê, Berîvanê, Xezal Xezal û hwd. Dema ku mûzîka Kurdî bi behs, îro ev nimûneyên jorê têne bîra me.

Lê muzîka Kurdî, teybetiyekî wî heye ji mûzîkên dinê. Bingeha mûzîka Kurdî li ser kilaman e. Du cure meqam hene. Yek kilam, yek jî stran in. Lê kilam ji stranan girîngtir in. Ji ber ku, bi salane gelê me bindest e, ji derd û kulên xelas nebûye, derd û kulên xwe bi kilaman aniye ziman. Di şînan de, wek têkçûna serhildana Agiriyê, qirkirina Geliyê Zîlan, kuştina 33'an li Geliyê Sefo, qirkirina Dêrsimê, qirkirina Helepçê û hwd.

Li ser kuştina qehremanên xwe jî, ku dewleta Tirk ji wan re dibêje eşqiya; mîna Babê Lalo, Mihemedo, Bişarê Çeto, Elîcan û Seyîtxan, Egît, Hogir û hwd. stran çêdike. Hinekî stran jî li ser evînê, li ser têkiliyên feodalî ne.

Ewên ku van kilaman anîne zimên jî, dengbêjên gelek hêja ne.

Mînak: Nasirê Rezzazî, Kirapêtê Xaço, Siyapuş, M. Şerîf, Îsa Berwarî, Tehsin Teha, Kawis Axa, Meyrem Xan, Şeroyê Biro, Mehmed Arifê Cizîrî, Hesen Cizêrî, Mihemed Şêxo, Seît Gebarî, Aram Tîgran, Şivan Perwer, Seyîtxan, Erdewan Zaxolî, Eyaz Yusif, Evdila Zerîn, Gulbahar, Zozan, Xelîl Xemgîn, Dilgeş, Sevkan, Mizgîn û hwd.

Li Kurdistana Bakur, di dimana 1938'an heya 1970'an de, ku tevgerên serhildanan rawestiya bûn, di wê demê de wekî her tiştê me, mûzîka me jî, derbe xwar. Ku em binêrine kilam û dengbêjên wê demê, emê bibînin ku çawa dabaşên kilaman guheriye, di şuna qehremanî û qewimandinên şoreşgerî, dabaşên evînî, fesadî û têkiliyê feodalî girtinr. Dengbêjên wê demê ku têne bîra min ev in: Evdilkerîmê Kutiyan, Zahiro, Şakiro, Sidîqê Bozo, Hiseyno, Eyşe Şan û hwd. Di kilamên wan de jî ev dabaş hebûn: (Ez qurbana bejna te, çavreşa min, xezala min. dilê min ketiye te, min birevîne, memkê sipî, filanê lê da bêvanê kuşt, nizanim kî keça kî revand, eskerê M. Kemal Paşa, Qumandan M, Kemal, pesnê hikûmeta Enqerê û hwd.

Lê bi destpêka têkoşîna rizgariya netewî, ev doman berevajî bû. Bi domanê re jî, dabaşên van kilaman berevajî bûn. Îro dabaşa kilaman li ser şehîdan, li ser serhildanan, li ser qirkirinan e.

Mînak: Babê Ferxiya, Helepçe, Mihemedo, Çiyayê Sasonê, Hogir, Egît, Berîvan, Serok, Serîhildana Amedê û hwd.

Îro bêjeyên nûjen ketine nav kilaman, bi enstrûmanên nûjen kêne lêxistin. Di beravajîbûna vî domanê de rola têkoşîna netewî, rola Hunerkom û hunermendên me yên dinê jî, nayê înkarkirin. Lê rola herî girîng ya 15'e Tebaxê ye.

Em dixwazin ji van kilamên nûjen yekî wek nimune bidin.

ŞÎNA KURDISTANA BAŞUR

Aha hayê, de hayê, de hayê, de hayê. de hayê,
De bila wez nemînim piştê xerakirina Kurdistanê
li vî dinyayê
De bila wez nemînim piştî qirkirina me Kurdan
De bila li min bê jana zirav berfa giran
Bayê teyrukê emrê min nemîne, şev û rokê
nemîne, şev û rokê,
Cendekê min bimîne li çolan
Piştê şabûna qiranê Enqerê, faşîstê Bexdayê
Çawa dixwazin çira me Kurdan vemirînin
li vî dinyayê
De hayê, de hayê, ax birano babo hey babo,
dayê hey dayê.

Hey lê dayê, dîsa hawar û gaziya me tê
Ji Zaxoyê, ji Hewlêrê, ji Dehokê
Wekê Helepçe, Qeladiza, wekê Zaxoyê
Gund û bajarên me wêran kirin, weyla bi kul û
bê belayê

www.arsivekurd.org

Her kes halê me dibîne, çima deng ji kesî nayê
Dilê xelq û alemê bûye kuluka befrê
Bawer dikim bûye parçek ji qeşayê
Lo bi ser me da hatiye roja qiyametê
Dayîk zarowên xwe davêjin, ji erd û
ezmanan agir dibare
Va çi halê me ye dayê, lê va çi hal e dayê

(Li vir Ozan Seyîtxan ajîte dikêşe)

"...Dayê! Dayika min! Kurdistana min! menale!
megaze!
Ev ne qeder bû li eniya me hatibû nivîsandin
Lê çima em bûne pezên bêxwedî û çerên
riya mirinê
Ji keftaran, hevan û guran bir bi bir têne qirkirin
Lê nikê her riyekî, li berê her kendalekî
Li binê her kevirekî, goristana zarowekî
Hîn birîna me ya sê salan birîna Halepçê
derman nebû dayê
Kî bû sebebê serê me, kî bû sebebê serê te
Çima em kirine biyaniyên li ser welatê xwe
Ji welatfiroşan, canbazan, kevneperestan
Tiliyên xwe di bazara firotana me xistine dayê
Lê îro jî, bi riya xwe û yekbûna bejna te
Bakur û başurên te, rojhilat û rojavayên te
em baş dinasin
Dayila min..."

Heyla liminê dîsa ji Qamîşloxa Xopan heya
Ameda rengîn
Mahabada xemgîn heya deşta Ruhayê
Seranserê Kurdistanê dîsa qêrîn û nalîn û girîn e
Hawar e, kes bi gaziya me nayê
Derê mirovên aştiyê heya doh ji te re şêrê
rûmet bûn
Çira ji bo me Kurdan bûne mîna hirçên Sîbiryayê
Naha wer bi kînbûnê keftarê mîna nav dehlên
Efrîqayê
Wezê nakevim ber kuştina xweşmêran,
girtina şoreşgeran
Dere mêrên çê ji axa welatê xwe re
Wey şabaş û şeriya milletê wî gîhayê
Dere dilê min evdalê Xwedê bûye pêt û arînek
Li ser derguş û pêçekê zarowên şehîdan
Weke berxekê nîvdurak ber bidin ber sermayê
De heyf û mixabina qîz û zeriyan wan çav xezalan
Çawa hatine halên nemayê
Dere kar û pêr û xetiya rê nemabûn
Hewar e ev jî, ber piyan çûne
Bila xerabibî, agir bikevî mala van pîsxeraban
Wan welatfiroşan, çawa gelê me anîne
halên nemayê
Ax heylê dayê, hey lê lê dayê●

ROJ DERENG E

Fevzî Özmen

Me ne hes e me ne deng e
Mekin rabin roj dereng e
Emê razên heya kengê

Roj dereng e
ji xew rabin
li daw û dozên
xwe xuya bin.

Destên me xistinin zencîr
Hemî kirinin binê nîr
Em gişt îro bûnin hêsîr

Roj dereng e
ji xew rabin
li daw û dozên
xwe xuya bin.

Xewa evqas gelek suj e
Dijmin me bi me dikuje
Bi xwîn û mêjyê me dimije

Roj dereng e
ji xew rabin
li daw û dozên
xwe xuya bin.

Ji xew rabin ji bona jîn
Dest bavên şer û têkoşîn
Welat tev girtiye birîn

Roj dereng e
ji xew rabin
li daw û dozên
xwe xuya bin.

Rêza Çirokên Zarokan
HEBÛ TUNEBÛ
"Xatûn Meymûn û Elî Newêrek"
(Berhevkar: Prof. Celîlê CELÎL)
di nav weşanên NÇMê de
di nêzî de wê derkeve

www.arsivakurdi.org

Li NÇMê Folklor... MKM'de Folklör... Folklora SERÎHILDANê... Li NÇMê

Folklor! Jiyana gelan, Çanda gelan û vejîna gelan e. Gel, keder û êşên xwe, kêf û şahiyên xwe, tore û dîtinên xwe, bi folklorê dixemilîne. Ev xemilandinên jiyana gelan, di folklorê de, geh dibe dîrok û geh dibe serîhildan. Di nava serîhildanan de, dibe navê Egît'an, Zozan'an, Sultan'an û...hwd. Folklor, Çanda berxwedanê ye, Çanda gelê ku naxwaze di nava dîrokê de winda bibe. Folklor, xwedî derketina bav û kalan e. Folklor welat e. Folklor, jiyan e, di kela şerê germ de. Û folklor...



Nizanim, kesê ku NÇM'ê nebihîstiye heye? Yan jî, yê ku Enstîtuya Kurdî ya ku di nav hinanê dagîrkriyê de hat sazkirin bê haydar be heye? Wek ku tê zanîn dewleta Tirk tehemula peyva Kurd Kurdî nedikir, lê niha li du hev avhiyê neteweyî tên sazkirin. NÇM, ENSTÎTU, REWŞEN ...û folklor. Folklora NÇM'ê, folklorek bi bingeh û dirust e. Ev dirustî û heskirina gel di her şev û şahiyên NÇM'ê û şevên din de tê xuya kirin.

Em dixwazin ku bi kurtî, dîtinên koma SERÎHILDAN, pêşkêşî we bikin.

" Têkoşîna azadiya gelê Kurd, em Kurdên ku li metrepolan dijiyan, ji binî ve hejand. Têkoşîn hate rewşeke wilo ku weke her mirovî, her Kurd jî, li xwe vegeriya û pirsa xwe kir. Em jî, bi fikra welatparêziyê li çand û dîroka xwe vegeriyan. Bi vê armancê di sala 1989'an de deh heval em li hev civiyan û me dest bi folklora xwe kir. Piştî ku NÇM hate damezirandin, em tevli NÇM'ê bûn."

Koma SERÎHILDAN , ji bo Kurdên ku li dervayî welêt dijîn jî, weha dibêjin:

" Mirovên ku li metrepolan dijîn, bandora têkoşînê hîn behtir girînge ku bibîhîze, ji ber ku di nava Çanda biyanî de ye û ji jiyana gelê xwe dûr e. Ji bona em ji nasîna xwe dûr nekevin têkoşîna li Kurdistanê heta ji me bê pêwist e ku em bînin zimên. Gelek hevalên me hene ku hîn Kurdistan nedîtine, lê belê, di bin siya dengê têkoşînê de weke ku li kurdistanê bin dijîn û his dikin. Mirovên me yên li metrepolan dijin, bela ku nikarin bi pirranî tevlî Şerê germ bibin, bi hêsanî tevlî xebata çandê dibin."

Çand û têkoşîn, folklor û konevanî, jiyan û mirin, ji bo gelê Kurd îro di her warî d., xwe dispêre mirovan û mirovan digihîjini hev.

Ji bo Çand û têkoşîna me bibe navendî, bi baweriya ku avahiyek me hebe û tiştên rastî datanî ber me, me, NÇM û têkoşîna netewî pejirand.

Em dixwazin, beranberî pêvajoyê, xwe nû bikin û bi têkoşîna gelê xwe re bimeşin. Ji ber ve yekê navê koma me jî, SERÎHİLDAN e. Koma me di dema serîhildanên ku li Kurdistanê dihate holê hate avakirin. Ev serîhildanan, her tim ji bo me şewqekek û xurtiniyek e●


REWŞEN



www.arsivakurd.org

GULGULÎ
HA BI GULGULÎ

Berhevkar: Cemîla CELÎL



Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî,
K'esk û sorda xemilî, gulgulî,
Dinya kin û k'emilî, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.

Xortê K'urda xalisin, gulgulî,
Ji e'lbeta fêrisin, gulgulî,
Xwe e'gîtin, natirsin, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.

Keç'kê K'urda dengbêjin, gulgulî,
Ji ser dila dibêjin, gulgulî,
T'emam kezî dirêjin, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.

Keç'kê K'urdadelalin, gulgulî,
DEngbêjin, deng zelalin, gulgulî,
T'ev yekin, t'ev hevalin, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.

www.arsivakurdi.org

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Merhaba, tarihimizi su yüzüne çıkaran tüm emekçiler. Bilime, kültüre ihtiyacı olan tüm ezilen uluslara, yardımını esirgemeyen tüm aydınlarımıza, bilim adamlarımıza... Ve merhaba, sevginin tarihini okuyan, tüm halklar. "Ve biz tüm sevgilerin tarihini okuyoruz isyanı bitmeyen bir ulusun LİSANIYLA!..."

ASYADA VURAN AFRİKA KALBİ

Afrika göğüslü kurdalem
Bereket yüzlü akşamların
Tipileriyle savruldun
Okyanusların Amerikasına
Zenci yüzün kukuletalı infazlarda
Îsa utanmıştır çağından
Afrika göğsü çarmıhdayken

Ey asyamın kalbinde
Vuran Afrikam!
Senin kalbinde de
Asyam vuruyor mu?

A.Adsız

●●●●●

Ji Rewşenê re,

Rewşen, valahiyekî gelek mezin dagirt û peywireke (wezîfek)gelek giran jî, hildaye ser milên xwe. Heta îro gelê me li çanda xwe, li zimanê xwe û li dîroka xwe baş xwedî dernediket. Pêwîste ku em rê nedine vî halî. Îro bi zehfayî mirovên me nikarin bi zimanê xwe bipeyivin, bixwînin û binivisînin. Çima? Heta îro me ji van qedexekirinan re deng dernexistibû, me ji bo pêşveçûna ziman û çanda xwe tu karek nekiribû. Em hetanî îro ne şiyar bûn. Em li tu tiştên xwe xwedî dernediketin.Lê îro dem guheriye. Gelê me şiyar bûye, ji bo ziman û çanda me REWŞEN heye. Mirovên me ji bo welatê xwe xwîna xwe dirijîne. Bila dijmin bizane ku em êdî ji qedexekirinan natirsin. Em êdî li xwe, li çanda xwe û li welatê xwe xwedî derdikevin.

Ev çiya çiya yê me ye
Ev welat welatê me ye
Ev war warê me ye
Heyyy dijmino!..
Dem hatiye
Dema reva te
Tuyê reve rev
Bireve ji welatê min
Di gel silavên şoreşgerî,

Welatparêzekî Kurd

●●●●●

Xebatkarên birêz,

Di elfabeya Kurdî ya ku ji hêla malbata Bedirxaniyan ve hatiye amadekirin de, çar dengên (ç,k,p,t) veşartî nînin. Ev kêmasiyeke mezin e. Girîngiya gotûbêjan ên li ser vê pirsgirêkê û pêşniyarên çareserkirina wê, ji wate guhertina van çar dengan dihê. Ji hêla karvaniyê ve jî, elfaba me, bi nivîsandina tîpên "î,û,ê" kêmasiyek din tîne berçavan. Pirr mirov, van herdu tîpan, çawa bi wan xweş tê wer dinivîsînin. Divê em van çar dengan bi tîpên kh,çh,th û ph binivîsin.Mînak:

Khulîlk Phez Tharî Çhem Khurmancî Phêr Thûj Çhiya

Eger tîpa "ê" bi vê formê, tîpa "î" jî, bi vê formê bê nivîsandin çêtir e.Nivîsandina tîpa "û" hatiye pejirandin. Lê dîsa jî, em tîpa "û" wek "ou" binivîsînin baştir dibe.

Girîngiya pêwistiya elfabeke standart, bi kilawiya Kurdî roj bi roj zêdetir dibe. Divê elfaba Kurdî, ji kêmasiyên xwe bifilite (xelas bibe) û bi klawiya Kurdî ya standart bê nivîsandin ku êdî nebe dabaşa gotûbêjan.

Di xweşiyê de bimînin.

Rojhat Azadî

●●●●●

Roja we xweş be. Ez bawerim ku kovara Rewşenê wê bibe yekem li Kurdistanê. Ez hêvîdarim ku kovara rewşen ji bo gelê Kurd wê hertim bijî û pêşve biçe.

Ez xortekî pêşmerge me. Ji bo Rewşenê her tim ezê alîkar bim. Min ji were çend helbestên xwe û çend çîrok hinartin. Ez hêvîdarim eger xeletiyên min hebin hûn dê biborin û sererast bikin. Ev cara yekemîn e ku ez çîrok dinivîsim. Ez ji her alî ve amade me ku bi we re alîkarî bikim. Di destên min de nivîsarên kevneper, gotinên pêşiyan,pêkenok, heyranok û hwd. henin. Di gel silavên germîn.

Zeveng M.Ûnis Abdullah
Kurdistana Başur

●●●●●

Değerli Rewşen emekçileri,

Rewşen dergisinin bir sayısı elime geçti ve severek okudum. Böyle bir dergiyi Türkiye'de yayınlamak, tüm Kürt halkı açısından büyük bir kazanımdır diye düşünüyorum. Ben, yüzyıllar öncesi, İçanadolu'ya mecburi iskanlarla sürgün edilmiş bir Kürdüm ve Danimarka'da pedagoji alanında öğrenim gördüm. Derginin muhtevası oldukça doyurucu bir içeriğe sahiptir. Sizden isteğim, İskandinavya'da yoğun olarak yaşamlarını sürdüren İçanadolu Kürtleri üzerine mevcutsa bu konuda bilgi sahibi aydınların birşeyler yazmalarıdır. Çalısmalarınızda başarılar diler, tüm dergi çalışanlarına saygı ve selamlarımı sunarım.

Yusuf Ziya Gordow
DENMARK

●●●●●

Hevalên Hêja,

Ez hêvîdar im ku hûn dê vê nameya min, dı kovara Rewşenê de bıweşînin.

Bi rêz F. Huseyin Sağnıç, di kovara Rewşenê ya hejmara çaran

NAMEYÊN XWENDEVANAN

de, li ser zimên wilo dibejê: "Seyda û xwediyê zman gel bixweye, ne ku ferd, dewlet û aqademine." Belê ev rast e, lê peyvên ku Seyda F. Huseyin dinivîse, gel van peyvan weka wî bilêv nake.

Mînak:

çewt	rast
şxwe	jixwe
pçûk	piçûk-biçûk
mjoker	mijoker
dbistan	dibistan
wsa	wisa
dvê	divê
pxwe	bixwe
wlo	wilo û hwd.

Dema ku mirovekî weka Seyda F. Huseyin ev xeletî û çewtiyan bike, mirovên ku nû hînê Kurdî dibin dê çawa bikin. Em nizanin gelo çi qest û xereza F. Huseyin bi tîpa "i" re heye ku nanivîse. Gelo ev tîp gunehkar e?

Di nivîsara xwe de bi rêz . Huseyin dibêje ku zimanê tekûs ê jinên koçeran e. Belê rastiya vê gotinê heye. Lê belê mirov nikare bibêje peyvên ku jinên koçeran bi lêv dikin tev rast in.

Ez hêvîdar im ku F. Huseyin guhên xwe pariyek bide mirovên din jî.

Di xweşiyê de bimînin.

Aslan / Erxenî

———— ●●●●● ————

Hevalên Delal,

Ez silavên xwe yên germîn ji we re birê dikim. Ez di xebetên we de ji we re serketin dixwazim.

Ji kerema xwe re ji hejmara pêncan pê ve, min bikin aboneyê kovara Rewşenê. Ez ji we re çend helbestên xwe dişînim. Ez hêvîdar im ku hûn dê di kovarê de cih bidin helbestên min jî.

Ez spasî û silavên xwe pêşkêşî we dikim.

ŞABAŞ E ŞABAŞ E

Pêşî kaş e paşî xaş e
Li destpêkê xwîn û êş e
Wa hilhatî berbanga geş e
De lîlî kin hat şoreş e

Şabaş e şabaş e

Yê ne pê re, ewa şaş e
Lêmişt hat ser pêrê êş e
Ev ne xewn e ne endêş e
De lîlî kin hat şoreş e

Şabaş e şabaş e

Dijmin tim jî wa rûreş e
Pîlangerî cil zirkiş e
Bi yekbûnê dê hilweşe
De lîlî kin hat şoreş e

Şabaş e şabaş e

Mihemed XELÎL
DUBAÎ

———— ●●●●● ————

Değerli Rewşen ve Mezopotamya Kültür Merkezi Çalışanları,

Evvela Kürt Kültürünü geliştirme yönünde göstermiş olduğunuz çabalarınızın devamını diliyorum.

Kürt dili ve kültürünün geliştirilmesi yönündeki çabalarınız ürünlerini vermeye başladı. Bunu kendi çevremdeki insanlarda görüyor, kendimde hissediyorum.

Çalışmalarınızın bende yaratmış olduğu bilinçle Kürtçe öğrenmeye karar verdim ve yaklaşık bir aydır da büyük bir şevkle çalışıyorum. Ancak içinde bulunduğum koşulların elverişsizliğinden dolayı, kendi anadilimi bilimsel bir temelde öğrenebileceğim materyallerden yoksunum, yoksunuz. Eğer elinizde dilimizi öğretebilecek materyaller varsa yollarsanız seviniriz. En azından yollayacağınız bir sözlük, bizim büyük bir ihtiyacımızı karşılayacaktır.

Başarılarınızın devamını dilerken selam ve sevgilerimizi yolluyorum.

İ. Halil AKAN
E Tipi Cezaevi 13. Koğuş
AYDIN

———— ●●●●● ————

Xebatkarên hêja yên Rewşenê,

Ez dizanim, ev demeke dirêj e ku kovara Rewşenê derdikeve. Lê ev kovara xweşik nû kete destê min. Min gellek jê hez dikir. Min bi dilekî germ rûpelên wê vekir û xwend.

Kovara Rewşenê li gelê me pîroz be, pêşveçûn û xurtbûn bila para wê be. Tu bi ser seran û bi ser çavan hatî kovara delal Rewşen.

Ez ji we re çend helbestên xwe dişînim. Eger hûn biweşînin, ez dê gellek kêfxweş bibim.

Di nav xweşiyê de bimînin.

Roja reş,
roja reş,
agir dibare
agir,
peyra şewat,
paşê serîhildan.

Roja reş,
roja reş,
çem dikişiyan
dîtin
çiya har
xemla wî kesk û sor û zer
erd qelişî
qelişî dîroka derewîn
pîna ser çav ket.
Dest rabûn,
dev vebûn.
tarî direve,
bê ling
bê dest
û birîndar.

Tacîn Memanî


www.arsivakurdi.org

FERHENGOK

alahilgir : bayraktar
argûşk : altçenenin arka kenarı
bacik : acılı sivri biber
belifandin : bılöf yapmak
ber hev kirin : toplamak
bê esas : temelsiz
bêping : derece
bi lêv kirin : telafuz etmek
bizivandin : cesaret etmek
buhêrandin : geçirmek
cehwar : dağarcık
cênîk : şakak
cûtin : çiğnemek
dargerînek : sarmaşık
derizandin : yarmak
derizîn : yarılmak, çatlamak
destmal : mendil
ferş : düz kaya
gan : çiftleşmek
geztin : ısırmak
gihandin : ulaştırmak, vardırmak
gihaştin : değmek, olgunlaşmak, ulaşmak
giregir : önemli, büyük kişi
girs : iri
guvaştin : sıkmak
gûz : ceviz
hilperiştin : tırmanmak, tünemek
hingivandin : deymek, dokunmak
jiyandin : yaşatmak
kesanî : şahsiyet, kişilik
li hev hatin : anlaşmak
nivistin : uyumak
pan (payîn) : beklemek, gözetmek
parxan : serbest kaburga
paşîv : gece yemeği, sahur yemeği
pelandî : süzülmüş*
pêketin : yanmak, arkasına düşmek
pêxistin : (ışık) yakmak
puyîn : serpilmek
qelişandin : yarmak
qelişîn : yarılmak
qinyat : barınma
qûz : sansar
rawir : canavar
rewtîn : yaprak dökmek
ristin : eğirmek
simtin : delmek
stû : boyun
sûtin : bilemek
taw : kabul
terikîn : çatlamak
tezgah : aygıt, tezgah
tê derxistin : keşfetmek, tahmin etmek
tiraştin : yontmak
veniştin : konmak
viritîn : yıkıma doğru gitmek
xelmeşe : yarı uykulu, sersem

*** Di hejmara pêşînde tu peya bi çewt derbas bûbû.**

www.arsivakurdi.org



Kaseta

KOMA ÇIYA "Rozerîn"

derdikeve...

Berhema Navenda Çanda Mezopotamyayê



©Tabloyeke Wênevan Kawa BABAN

Buha (KDV) : 12 Hezar